



Ferhenga Zaravên Teknîkî  
Teknik Terimler Sözlüğü  
Dictionary of Technical Terms

Ferhenga Zaravên Teknîkî  
Teknik Terimler Sözlüğü  
Dictionary of Technical Terms

TMMOB (Türkiye Mühendis ve Mimar Odaları Birlięi)

Selânik Caddesi No:19/1 06650 Yenisehir/ANKARA

Tel : 0 312 418 12 75

Faks : 0 312 417 48 24

[www.tmmob.org.tr](http://www.tmmob.org.tr)

Malpera Ferhengê:[www.endezyar.org](http://www.endezyar.org)

ISBN No: 978-605-01-0621-3

Teknik Hazırlık  
Naturel Reklam Basın  
[www.naturelbasin.com](http://www.naturelbasin.com)  
0212 426 63 30

Baskı  
Gün Matbaacılık  
Beşyol Mah.Akasya Sok.23  
Küçükçekmece/İstanbul  
0212 580 63 81

## { Pêşek }

Di 42. Kongreya TMMOB'ê de pêywira amadekirina “Ferhenga Zaravên Teknîkî ya bi Kurdî” ji bo pêşvekirina bikaranîna zimanê dayikê di qadên pişeyî de habibû dayîn.

Di vê çarçoveyê de, em şad û pextewarin ku bi xebatên Desteya Kordînasyona Bajarê Amedê me “Ferhenga Zaravên Teknîkî ya bi Kurdî” ji nava weşanên TMMOB'ê derxist.

Ji bo amadekirina vê ferhengê ji desteya kordînasyona bajarê Amedê re, ji endamên “Lijneya Xebatên Teknîkî yên bi Kurdî” ku vê xebatê kirine Hesên Gu-

neylî (EMO), Herdem Doğrul (MO), Nihat Noyan (İMO), Selahattin Elçi (HKMO), Enise Güneylî (EMO), Doğan Hatun (MadenMO), Fatma Sümer (MadenMO), Şerefhan Aydın(MO), M. Nedim Tüzün (EMO), M. Emin Tümmür (MMO), Abdulsamet Ucaman (ZMO), Kenan Çiftçi (MadenMO), Suat Yavuz (MMO), Abdulkadir Yılmaz (MMO), Erol Bacalan (EMO), Harun Yalçınkaya (JMO), Mehmet Orak (EMO), Yıldız Tahtacı (ŞPO), Kadri Dolu (HKMO), Enis İpek (MadenMO), Cihan Taşkiran (MMO), Yaser Fırat (MadenMO) re spasiyên xwe pêşkêş dikin.

*Mehmet SOĞANCI*

Serokê Desteya Rêveberiya TMMOB'ê

## { Sunuş }

TMMOB 42. Genel Kurulu'nda Yönetim Kurulumuza meslek alanlarımızda ana-dilin kullanılması için ön açacak bir çalıřma olarak “Kürtçe Teknik Terimler Sözlüğü”nün hazırlanmasına destek ol-ması görevi verilmiřti.

Bu çerçevede, Diyarbakır İl Koordinas-yon Kurulumuzun çalıřmalarıyla hazırlanan “Kürtçe Teknik Terimler Sözlüğü”nü TMMOB yayınları arasın-dan çıkarmanın gururunu taşıyoruz.

Sözlüğün hazırlanmasını sađlayan Di-yarbakır İl Koordinasyon Kurulumuza, yayına hazırlayan komisyon üyeleri

Hasan Güneyli (EMO), Herdem Doğrul (MO), Nihat Noyan (İMO), Selahattin Elçi (HKMO), Enise Güneyli (EMO), Dođan Hatun (MadenMO), Fatma Sümer (MadenMO), Şerefhan Aydın (MO), M. Nedim Tüzün (EMO), M. Emin Tümür (MMO), Abdulsamet Uca-man (ZMO), Kenan Çiftçi (MadenMO), Suat Yavuz (MMO), Abdulkadir Yılmaz (MMO), Erol Bacalan (EMO), Harun Yalçinkaya (JMO), Mehmet Orak (EMO), Yıldız Tahtacı (ŞPO), Kadri Dolu (HKMO), Enis İpek (MadenMO), Cihan Tařkıran (MMO), Yaser Fırat (MadenMO)'a teřekkür ederiz.

*Mehmet SOĐANCI*

TMMOB Yönetim Kurulu Bařkanı

## { Pêşgotin }

Ev xebata ku di destê we de ye xebateke ku komeke endezyar, avahîsaz, plansazên bajêr, mamosteyê Kurdî û zanyarê ziman bi hev re û ji dil bi 3,5 sal kirine derketiye holê. Pêwîstiya vê xebatê rûyekî din ê hebûn û rastiya gelê Kurd e. Lewma jî tunebûna çavkarniyeke weha di vê sed salê de kêmasiyeke mezin e. Hemû xebatên akademîk ên Kurdî dereng mayî ne. Vê xebata me jî her çîqa ku xebateke kêr û dereng mayî be di qada xwe de xwedî wateyeke dîrokî ye. Dereng be jî sûdgirtina gelê me ya ji vê xebata ku bi awayekî neteweyî hatiye çêkirin girîng e.

Ji gelekî ku çil milyon e rewşa tenê 6-7 milyonê ku di Rêvebertiya Herêmî ya Iraqê de dijî mafê esasî yê mirovî wek perwerdehiya bi zimanê dayikê dikare bikar bîne trajîk e. Her çîqa ku rewşa gelê Kurd li gora dewletên ku tê de dijîn biguhere jî dema mirov cîhana hemdem tîne ber çav mercên heyî gelek nebaşin. Herî girîng jî, ji mafên esasî wek ziman, dîrok, nasname û rêveberiya xweser bêpar e. Di Tirkiyeyê de 25 milyon Kurd dijîn lê yek Kurdekî ku bi zimanê xwe perwerde bibine jî nîn e. Her çîqa ku Zimanê Kurdî parçeyekî esas ê vî welatî, zimanê bi milyonan Kurdan

be jî, nêrîna dewleta desthilatdar heta salên dawîn jî digot ev ziman nîn e. Li gora dewletê zimanekî bi Kurdî nîn bû lê li gelek saziyên perwerdehiyê bi Îngilîzî, Fîransîzî, Almanî û Erebî perwerde dihat dayîn. Ji ber ku gelê Kurd bi 10 salan e têdikoşe hinek guherînên wek naskirina zimanê Kurdî ya bi devkî, perwerdeya zimanê Kurdî û vebûna beşa Wêje û Zimanê Kurdî ya li hinek zanîngehan li gora rewşa pêwîst gelek li paş e.

Mafê her Kurdî heye ku perwerdehiyê ji asta destpêkê heta zanîngehê, ku pêwîst be asta master û doktorayê jî bi Kurdî bigire û divê derfet ji aliyê dewletê ve werin amadekirin.

Bi awayekî ciddî pêdiviya gelê Kurd bi çavkaniyên ji beşa ziman û çandê heye. Her çîqa ku gelê me bixwaze bi hêza xwe pirsgrîka perwerdehî û ziman ji holê rake jî mixabin ev çareserî negiheştîye asta ku tê xwestin. ÎKK(Lijneya Kordinasyonê ya Bajêr)ya Amedê di 2012 de li kongreya TMMOBê pêşniyaznameyekî da û li gora vê divê xwedî li vê xebatê were derketin û lijneyeke navendî vê xebatê bi rê ve bibe. Heta wê demê ji xwe li Amedê vê xebatê dest pê

kiribû û heta astekî hatibû. Berhema yekem a vê xebatê Fasîkul-1 hatibû weşandin. Piştî kongreya TMMOBê ku ev xebat kete fermiyetê li hemû odeyan lijneya bi navê “Lijneya Xebatên Teknîk ên bi Kurdî” hat avakirin û piştî ev lijne hatin cem hev lijneya navendî ya TMMOBê çê bû. Navenda vê lijneyê li Amedê ye û hemû civîn jî liv ir têne çêkirin.

Di Tirmeha 2011an de civînên yekemîn ê xebatê li Amedê hatin çêkirin. Hemû hekeyên ku bi ÎKKya Amedê ve girêdayî ne ragihandin ku dê ewê nava vê xebatê de cih bigrin û piştgirî bidinê. Xebat bi awayê xebata hevpar a TZP-Kurdî (Tevgera Ziman û Perwerdehiya Kurdî) û TMMOBê hat destpêkirin. Ya rast bi pêşniyaza TZP-Kurdî û xwedilêderketina TMMOBê ev xebat çê bû û giheşt encamê. Ji destpêka komxebatê heta dawiya komxebatê ji 100î zêdetir kese tevli xebatê bûn û piştgirî dan. Navê endamên TMMOBê yên ku bi domdarî xebat meşandine di listeya endamên lijneyê de hene. Navê kesên ku piştgirî dane û şewirmendiyê kirine jî di listeya lijneya şewirmendiyê de hene.

Ji Bakûr, Başûr, Rojhelat, Rojava, Ewropa û Tirkiyeyê tevlibûn çêbû, lewma jî ji hemû zaravayên Kurdî piştgirî hat girtin. Dema ji van aliyan ve tê tê nêrîn

ev berhem encama xebateke neteweyî ye. Ji zaravayên Kurdî yê mezintirîn Kurmancî, Dimilî û Soranî gelek peyv ne bi hesabê ku ji kîjan zaravayî ye bi Kurdî hatiye pejirandin hatiye bikaranîn.

Di amadekirina xebatê de heta ku pêkan be li gora çarçoveya derfetan reseniya peyvan hatiye derxistin, ku reseniya peyvê nehatibe dîtin an jî ku di Kurdî de li hember wê peyvek tunebe peyv ji zimanê ku cara yekem hatiye bikaranîn hatiye girtin. Wek mînak di Kurdî de peyva Beton nîn e, lewma jî ev peyv rasterast bi awayekî orjînal ji Firansîzî “Beton” hatiye girtin. Hinek peyv jî hem peyva zimanê jêder hatiye bikaranîn hem jî hemberê wê peyvê bi Kurdî hatiye çêkirin. Wek mînak peyva “Betonarme” di Firansîzî de betona şiyandarkirî ye. Di ferhenga xwe ya Kurdî de me peyva “Betonarme” rasterast bikaranî. Pêre jî me di wateya betona hesinkirî de “Betona Şîşbendkirî” bikaranî. Dema me van xebatan kirine teqez me hin şaşiyên kirine. Em hêvî dikin ku di dema bê de dê van şaşiyên werin rastkirin.

Li ser navê hemû endamên lijneyê bi ramana ku vê xebatê dê îlhamê bide gelek kesan em vê berhemê diyarê gelên bi pişaftina çandî rû bi rû ne dikin.

Li Ser Navê Lijneya Xebatên Teknîkî ên bi Kurdî

*Hesen Guneylî*

## { Önsöz }

Elinizde bulunan bu çalışma bir grup mühendis, mimar, şehir planlamacısı, Kürtçe eğitmeni ve dil bilimcisinin yüreğinden esen ve ciddi bir özveriyle 3.5 yıllık uğraşı ve çabası neticesinde ortaya çıkmıştır. Bu çalışmanın gerekliliği Kürt halkının varlığı ve gerçekliğinin bir başka yüzüdür. Zira böyle bir kaynağın bu yüzyılda olmaması büyük bir eksiklik olarak gün yüzüne çıkmaktadır. Kürtçe yapılan tüm akademik çalışmalar gecikmiş çalışmalardır. Bu çalışmamız da gecikmiş ve yetersiz bir çalışma olmakla birlikte kendi alanında tarihi bir öneme sahiptir. Geç de olsa halkımızın ulusal çapta yapılan bu çalışmanın meyvesinden faydalanması önemlidir.

Kırk milyonu aşkın bir halkın sadece Irak Kürdistan Bölgesel Yönetimi'nde yaşayan 6-7 milyonluk kısmının anadilde eğitim gibi temel insani bir hakkını kullanabiliyor olması trajik bir durumdur. Kürt halkının içinde bulunduğu şartlar, vatandaşı oldukları devletin durumuna göre değişiklik gösterse de, çağdaş dünya göz önüne alındığında bu şartlar ciddi ihlallerle doludur. En önemlisi de dil, kültür, tarih, kimlik, kendi yer altı kaynaklarını kullanma ve öz yönetim gibi temel haklardan yoksundur. Türkiye'de 25 milyon civarında Kürt yaşamaktadır ancak ana dilinde eğitim gören tek bir Kürt yoktur. Kürtçe dili bu ülkenin asli unsuru olan milyonlarca Kürdün ana

dili olmasına rağmen egemen devlet anlayışı, son yıllara kadar da Kürt halkı ile beraber dilini de inkar ediyordu. Devlet açısından Kürtçe diye bir dil yoktu ama birçok eğitim kurumunda yabancı dil olan İngilizce, Fransızca, Almanca ve Arapça gibi dillere yatırım yapılıyordu. Kürt halkının 10 yıllardır süren mücadelesi neticesinde Kürt kimliğinin sözlü olarak tanınması, kısmen Kürtçe dil eğitiminin verilmesi ve bazı üniversitelerde farklı isimlerde olsa bile Kürt Dili Edebiyatı bölümlerinin açılması gibi gelişmeler olması gerekenlerin çok gerisindedir.

Her Kürdün ilköğretimden üniversiteye kadar, hatta gerekirse lisans üstü düzeyindeki eğitimlerini de Kürtçe alma hakları vardır ve bu olanakların devlet tarafından sağlanması gerekmektedir.

Kürt halkının dil ve kültür alanında ciddi anlamda kaynaklara ihtiyacı vardır. Son yıllarda kendi öz gücüne dayanarak eğitim ve dil sorununu ortadan kaldırmaya çalışan halkımız maalesef bunu olması gereken seviyeye taşıyamamıştır. Diyarbakır İKK(İl Koordinasyon Kurulu)'nın, TMMOB'nin 2012'deki genel kurulunda sunduğu ve kabul edilen önergede bu çalışmanın sahiplenilmesi ve merkezi düzeyde kurulacak bir komisyon tarafından yürütülmesi kararı çıktı. O zamana kadar zaten Diyarbakır'da bu çalışma başlamış ve

belli bir seviyeye gelmişti. Bu çalışmanın ilk meyvesi olan Fasikül-1 de yayınlanmıştı. Genel kurulda bu çalışmanın resmileşmesiyle tüm odalarda “Kürtçe Teknik Çalışmalar Komisyonu” kuruldu ve bunların bir araya gelmesiyle, TMMOB'nin merkezi düzeyde komisyonu oluştu. Bu komisyonun merkezi Diyarbakır'da olup tüm toplantılarda burada yapılmaktadır.

2011 yılının Temmuz ayında çalışmanın ilk toplantıları Diyarbakır'da gerçekleştirilmiştir. Diyarbakır İKK'ya bağlı tüm birimler bu çalışmanın içerisinde bulunacaklarını ve destek vereceklerini deklare etmişlerdir. Çalışma TZP-Kurdi(Tevgera Ziman û Perwerdehiya Kurdi) ve TMMOB'nin ortak bir çalışması olarak başlatılmıştır. Daha doğrusu TZP-Kurdi'nin önerisi ve TMMOB'nin sahiplenmesiyle bu çalışma bir vücut bulmuş ve sonuca varmıştır. Çalıştayı başından sonuna kadar geçen sürede çalışmaya 100'ü aşkın kişi katılmış ve destek olmuştur. Bu çalışmayı yürüten grupta kalıcı olarak çalışan TMMOB üyelerinin adları komisyon üyeleri listesinde bulunmaktadır. Bu çalışma boyunca destek alınan ve bilgilerine başvuru yapılan kişilerin adları da Danışma Komisyonu listesinde bulunmaktadır.

Çalışmamıza bütün Kürdistan coğrafyasından ve Avrupa' da yaşayan Kürtlerden katılım sağlanmıştır. Dolayısıyla çalışmamız Kürtçenin tüm lehçelerinden destek almıştır. Bu yönleriyle bakıldığında bu eser ulu-

sal çapta yapılan bir çalışmanın sonucudur. Kürtçenin en çok kullanılan Kurmancî, Dimilî ve Soranî lehçelerinden kelimeler hangi lehçeye ait olduğuna bakılmaksızın Kürtçe olarak kabul edilip kullanılmıştır.

Çalışma hazırlanırken mümkün olduğunca kelimelerin orijinaleri ortaya çıkarılmaya çalışılmıştır. Buna karşılık eğer kelimenin orijinali bulunamamışsa ya da Kürtçede kelimenin bir karşılığı yok ise kelimenin ilk olarak ortaya çıktığı dilde ifade edilmiştir. Örneğin Beton kelimesinin Kürtçe'de bir karşılığı bulunamadığından dolayı direkt olarak Fıransızcada kullanıldığı şekilde “Beton” olarak alınmıştır. Ayrıca bazı kelimeler hem kaynak dilinde kullanıldığı şekilde alınmış hem de Kürtçe karşılığı türetilmeye çalışılmıştır. Örneğin “Betonarme” kelimesinin Fıransız dilinde kelime anlamı güçlendirilmiş beton demektir. Kürtçe sözlüğümüzde “Betonarme” kelimesini olduğu gibi kullandık. Ayrıca bu kelimeye Kürtçe karşılık olarak demirli beton anlamına gelen “Betona Şişbendkirî” kelimesini türettik. Bu çalışmaları yaparken muhakkak ki hatalarımız olmuştur. Sizlerden gelecek değerli eleştiri ve katkılarımızla bu çalışmanın daha da zenginleşerek büyüyeceğini ümit ediyoruz.

Bu çalışmanın birçok kişiye ilham vereceği düşüncesiyle tüm komisyon üyeleri adına bu eseri kültürel asimilasyona uğrayan tüm halklara adıyoruz.

Kürtçe Teknik Çalışmalar Komisyonu Adına

*Hasan Güneyli*



## { Preface }

The current study is a big effort of a bunch of engineers, architects, city planners, instructors of Kurdish language and linguists. This work comes together with their serious effort and more than three years of studies. The necessity of this work is another face of the existence and reality of Kurdish people. Absence of such a study in the current century comes out as a big privation. All the academic studies in Kurdish are behindhand studies. The current study is also a behindhand and incompetent study. However, it has a historical significance in its area. Thus being so late, it is important that our people benefit from the outcome of this national study.

It is a tragic situation that only 6-7 million Kurds who live in Irak Kurdistan Regional Government can have access to education in their mother tongue which is a basic human right whereas Kurdish population is over 40 million. However the circumstances of the Kurdish people change according to the situation of the state they are affiliated, such conditions are full of serious violations taking into consideration the contemporary world. Most importantly, Kurds are deprived of basic rights such as linguistic, cultural, historical, identical and self-administration rights. Around 25 million Kurds live

in Turkey, however no one gets education in their mother tongue. Even if Kurdish is the mother tongue of millions of Kurds who are an essential element of this country, the sovereign state policy has been to deny the existence of such a language until recent years. While Kurdish did not exist as a language for the Turkish state, this same state used to invest foreign languages such as English, German, French and Arabic in many educational institutions. As a result of struggle of the Kurdish people for decades, there have been some developments such as verbal recognition of Kurdish identity, education of Kurdish language and opening of some Kurdish Language and Literature departments. However, these changes are far behind what it should be.

Every Kurd has the right of getting an education in Kurdish language, from elementary school to master's degree, even PhD and these facilities must be provided by the Government.

Kurdish people seriously need adequate sources in language and culture areas. Our people recently made an effort to eliminate educational and linguistic problems. Unfortunately, these efforts could not reach a satisfactory result. Following the proposal of Diyarbakir PCC (Provincial Coordination Committee), this cur-

rent project is accepted at the TMMOB's general assembly in 2012. Furthermore, another decision is that the project will be carried out by a commission which will be established at the central level. In fact, the project has already been started and the first outcome Fascicule-1 has been published in Diyarbakir. As this work got the formal position at the general assembly, each chamber formed a commission called "Kurdish Technical Work Committee" and by gathering all these committees, a central committee of TMMOB was formed. The centre of this committee is in Diyarbakir and all the meetings take place in Diyarbakir.

The first meetings for the project took place in Diyarbakir in July 2011. All units connected to Diyarbakir PCC have declared that they would participate in and support this study. This work started as a collaboration of TZP-Kurdi (Kurdish Language and Education Institution) and the TMMOB. In fact this work was proposed by TZP-Kurdi and appropriated by TMMOB. During the current workshop over 100 people participated in and supported the project. The names of group members who worked permanently in this project are listed as committee members. The names of supporters and advisors are provided in the list of advisory commission.

The Kurds that live in different countries such as Iran, Iraq, Syrian, Europe and

Turkey participated to this project and hence all of the dialects of the Kurdish language contributed to our work. This dictionary is therefore a joint work at the national level. Words from most widely used Kurdish dialects such as Kurmançî, Dimili and Sorani, irrespective of their origin, were accepted and used as Kurdish words.

We tried to bring out the origin of the words. If we could not find the original use of the word or if there is no provision in Kurdish, word used as in their original language. For example we could not found a Kurdish word for "concrete", so we directly used "concrete" as in French. In addition, some word both taken as in their original language and a Kurdish word also was derived. For example word meaning of "betonarme" is reinforced concrete in French. In our Kurdish dictionary we used the word "betonarme" as it is. In addition, the word "Betona Şîş-bendkirî" was derived for the word "betonarme". Certainly we have faults during carrying out this study. Thanks to your valuable criticism and contributions you would make, we hope that this work would develop more and get richer.

By thinking that this work will inspire many people, we, on behalf of all the committee members, would like to dedicate this work to all nations that suffered from cultural assimilation.

On behalf of the Kurdish Technical Work Committee

*Hasan Guneyli*

## { Lîsteya Endamên Lijneya TMMOB }

Nav	Paşnav	Agahî
1	Hasan Güneyli	Serokê Lijneya Xebatên Teknîkî yên bi Kurdî ye. Nivîskarê pirtûka matematîkê ye û mamoteyê Kurdî-Der'ê yê Kurmancî ye. Ji Amedê ye. Endezyarê bilind ê Elektrîk û Elektronîkê ye.
2	Herdem Doğrul	Avahîsaz e. Çîgirê serokê Lijneyê ye. Sekreterê Odeya Avahîsazan a Şaxa Amedê ye.
3	Nihat Noyan	Endezyarê Avahiyê ye. Ji Amdê ye. Di rêveberiya odeya endezyarên avahiyê şaxa Amedê de ye. Alîgirê sekreterê İKK'ya Amedê ye.
4	Selahattîn Elçî	Endezyarê Nexşe û Kadastryê ye. Ji Dihê ye.
5	Enise Güneyli	Endezyara Elektrîk û Elektronîkê ye. Ji Nisêbînê ye. Mamosteyê Kurdî-Der'ê ye.
6	Doğan Hatun	Endezyarê Kanzayê ye. Ji Amedê ye.
7	Fatma Sümer	Endezyarê Kanzayê ye. Ji Amedê ye.
8	Şerefxan Aydın	Avahîsaz e. Ji navçeya Licê ya Amedê ye.
9	M.Nedim Tüzün	Endezyarê Elektrîk û Elektronîkê ye. Çîgirê serokê Lijneyê ye. Serokê berê yê odeya endezyarên Elektrîkê ya şaxa Amdê ye. Ji Êlihê ye.
10	M. Emin Tümür	Endezyarê Makîneyê ye. Ji Mêrdînê ye. Mamosteyê zimanê Kurdî ye.
11	Abdulsamet Ucaman	Endezyarê Çandiniyê ye. Ji Licê ye.
12	Kenan Çiftçi	Endezyarê Kanzayê ye. Ji Colemêrgê ye. Mamosteyê Kurdî-Der'ê ye.
13	Suat Yavuz	Endezyarê Makîneyê ye. Ji Rihayê ye.
14	Abdulkadir Yılmaz	Endezyarê Makîneyê ye. Ji Amedê ye.
15	Erol Bacalan	Endezyarê Elektrîk û Elektronîkê ye. Ji Licê ye.
16	Harun Yalçınkaya	Endezyarê Erdnasîyê ye. Serokê Odeya Erdnasîyê ya şaxa Amedê ye. Ji Çermûgê ye.
17	Mehmet Orak	Endezyarê Elektrîk û Elektronîkê ye. Di rêveberiya Odeya Endezyarên Elektrîkê(EMO) şaxa Amedê de afîkarê Serokê odeya Amedê ye. Ji Amedê ye.
18	Yıldız Tahtacı	Plansaza Bajêr û Herêmê ye. Ji Çihanbeylî ya Konyayê ye.
19	Kadri Dolu	Endezyarê Nexşe û Kadastryê ye. Ji Amedê ye.
20	Enis İpek	Endezyarê Kanzayê ye. Ji Amedê ye.
21	Çihan Taşkıran	Endezyarê Makîneyê ye.
22	Yaser Fırat	Endezyarê Kanzayê ye. Ji Tekmanê ye.

## { Lîsteya Endamên Lijneya Şêwirmendan }

Nav	Paşnav	Herêm	Agahî
1	Mehmûd Nêşite	Amed	Ji koma Vate ye. Bi salan e xebatan li ser Dimîfî dimeşîne. Mamosteyê Kurdî ye.
2	Serwed Deniz	Amed	Ji Pasûra Amedê ye. Mamosteyê Kurmançî ye.
3	Zana Farqînî	Stembol	Li bajarê Stembolê dijî. Endamê Enstîtuya Kurdî ya Stembolê ye. Nivîskarê ferhengeke mezin ya Kurdî-Tirkî ye.
4	Amed Çeko Jîyan	Amed	Nivîskar û Teknîker e.
5	Deniz Gunduz	Stembol	Ji koma Vate ye. Bi salan e xebatan li ser Dimîfî dimeşîne.
6	Dilêr Hesên	Duhok	Li bajarê Duhokê dijî. Avahîsaz (Telarsaz) e.
7	Ebdulsettar Asim	Hewlêr	Li bajarê Hewlêrê dijî. Ji Hewlêrê tevî xebata me bû. Teknîkerê Elektronîkê ye.
8	Edalet Milan	Îran	Li bajarê Qezwîn a Îranê dijî. Endezyarê Kîmyayê ye.
9	Mohammed Milan	Îran	Li bajarê Qezwîn a Îranê dijî. Endezyarê Makîneyê ye.
10	Ramazan Hemze	Duhok	Li bajarê Duhokê dijî. Ji Duhokê tevî xebata me bû. Endezyarê Erdnasyê ye.
11	Sebrî Hesên Sebrî	Duhok	Li bajarê Duhokê dijî. Ji Duhokê tevî xebata me bû. Mamosteyê Fîzîkê ye.
12	Zagros Haco	Ewropa	Ji Ewropayê dijî. Ji Kurdên rojava ye. Endezyarê Telekomunîkasyonê ye.
13	Can Êzîdxelo	Silêmanî	Ji bajarê Silêmaniyê tevî komxebatê bû. Xebatên ziman dimeşîne. Bi Îngîlîzî û gelek zaravayên Kurdî zane.
14	Dr. EbuBekir Umer Qadir	Silêmanî	Ji bajarê Silêmaniyê tevî komxebatê bû. Mamosteyê Beşa Kurdî li Zanîngeha Silêmaniyê ye.
15	Dr. Hoger Mahmoud Faraj	Silêmanî	Ji bajarê Silêmaniyê tevî komxebatê bû. Mamosteyê Beşa Kurdî li Zanîngeha Silêmaniyê ye.
16	Dr. Mihemmed Ehmed Seyfîd	Silêmanî	Ji bajarê Silêmaniyê tevî komxebatê bû. Mamosteyê Beşa Kurdî li Zanîngeha Silêmaniyê ye.
17	Dr. Osman Ebdûl Berzençî	Silêmanî	Ji bajarê Silêmaniyê tevî komxebatê bû. Mamosteyê Beşa Kurdî li Zanîngeha Silêmaniyê ye.

## { Spasî }

Ji bo piştgirî û alikariya wan em spasîyên xwe ji lijneya şewirmendiyê re dikin. Van hevalan bi sebreke mezin, kedeke mezin û hevaltiyeke mezin her dem bi me re bûne.

Ji bo piştgirî û alikariya wan em spasîyên xwe ji serokên odeyên endezyar û avahîsaz(Telarsaz) ên Amedê; Serokê Odeya Avahîsazan, Serokê Odeya Endezyarên Çandiniyê, Serokê Odeya Endezyarên Elektrîkê, Serokê Odeya Endezyarên Avahiyê, Serokê Odeya Endezyarên Madenê, Serokê Odeya Endezyarên Makîneyê, Serokê Odeya Endezyarên Erdnasiyê, Serokê Odeya Endezyarên Nexşe û Kadastroyê re pêşkêş dikin. Wan herdem bi awayekî berpirsyar û hêvîdar piştevaniya me kirine.

Her çiqas ku di hemû xebata 3 sal û niv de bi me re nîn bûbin jî ew hevalên ku li gora

derfetên xwe alikariya me kirine, hin caran tevî civînên me bûne, hin caran ji dûtir ve alîkarî kirine an jî bi awayekî din piştgirî dane me; wek Haknas Sadak, Serhat Biçen, Abdulgafur Yilmaz, Mustafa Çelebî û Fehtî Ata... Em ji dil û can spasîyên xwe ji wan re ji dişinin.

Gelek caran me civînên xwe li eywanên civînê yê odeyên şaxê Amedê dikir û di rojên civînan de xebatkarên odeyan bi me re gelek eleqedar dibûn û gelek xizmeta me dikirin. Bi taybetî Xebatkarê Odeya Endezyarên Avahiyê, Xebatkarê Odeya Avahîsazan, Xebatkarê Odeya Endezyarên Elektrîkê, Xebatkarê Odeya Endezyarên Makîneyê, Xebatkarê Odeya Endezyarên Nexşe û Kadastroyê û ji hemû xebatkarên odeyan re spasîyên xwe pêşkêş dikin.



# { A }

**Abiyotîk/Abiyotik/Abiotic**  
*Bêcan, bêrih, bêgiyan.*

**Acûr::Xişt/Tuğla/Brick**  
*Kereseyekî ku di lêkirina avahiyên de tê bikaranîn. Axa sor a gil di nav qalibên taybet de tê bicîhkirin û piştî ku ziwa dibe di hetûnê de tê sorkirin.*

**Adan::Kêrhatî::Çust::Kargîn/Verim/Efficient**  
*Randiman*

**Adapte::Guncandin/Adepte::Uyarlama/ Adopt::Adapt**  
*Hînbûna şert û mercên jiyaneke din.*

**Adaptor::Guncêner/Bağdaştırıcı/Adaptor**

*Parçeyek ji pêveka makîneyekî ku du parçeyên cûda bi hev girêdide. Amûrê ku sînyala elektrîkê li gora cîhazê diguherîne.*

**Adiyabatîk/İsı almaz/Adiabatic**  
*Kereseyê ku tînê nagire.*

**Adiyon::lyona serrû/Yüzey iyonu/Adion**  
*Elektrona durtirîn ji navenda atomê.*

**Adjoînt::Hevpar::Pêkbend/Adjoint/Adjoint**

*Di mijara matrîsê de tê bikaranîn. Cureyekî matrîsê ye. Dema nîşaneyê hêmanên matrîsê yên di rêza fer de tê guhertin û tîranspoz matrîsê tê girtin Adjoint Matrîsê dertê.*

**Agahî/Bilgi/Information**  
*Daneyên ku bûyer, heyber an jî ramanekî didin nasîn.*

**Agahiyên bin::Agahiyên jêr/Alt bilgi/Footer**  
*Di rûpela nivîsê de agahiyên ku li jêra rûpelin û di derbarê naveroka rûpel de agahî didin.*

**Agahiyên jor/Üst bilgi/Header**  
*Di rûpela nivîsê de agahiyên ku li jora rûpelin û di derbarê naveroka rûpel de agahî didin.*

**Agir/Ateş/Fire**  
*Agir oksîdasyona barîstê ye di proseseke kîmyayî de, ya ku pir bi lez diqewime. Encama şewatê wizeya germî û ronahiyê ye.*

**Agir kirin/Ateşlemek/Ignite**  
*Dadan, vêxistin. Teqandina tîfing, top û hwd.*

**Agirê şevê/Gönül hardalı/Meyagrum perforatum l.**  
*Nebateke ji malbata xerdelê ku tovê wê tehle.*

**Agirgir/Yanıcı/Flammable**  
*Madeyên şewatok. Madeyên ku agir bi hêsanî pê dikeve. Mînak; Rejû (Komir), Êzing, Berhemên Petrolê.*

**Agirnak::Sojer/Yakıcı/Burner/Caustic**  
*Madeya ku taybetiya wî şewitandin e. Dibe bi germahiya xwe bişewitîne, dibe ku bi taybetiya xwe ya kîmyayî jî bişewitîne.*

**Aheng/Uyum/Harmony**  
*Di nav tevahiyek de li hev hatin an jî hevraziya perçeyan. Lihevhatin.*

**Ajal::Ajel / Hayvan / Animal**  
*Ji bilî mirov û nebatan hemû zindiyên din. Mînak; Çêlek, Masî, Teyr, Kêzik, Kurmik.*

**Ajaldarî** / Hayvancılık / Livestock  
Xwedikirina ajalên kedî û sûd girtina hemû hilberînên vî karî. Bi gelemperî beşekî ji çandiniyê ye.

**Ajalê bibask::Terîd** / Kanatlı hayvan / Poultry  
Dî malbata ajalan de beşek e. Bi gelemperî bi basken xwe karin bifirin.

**Ajalê kûvî** / Yabani hayvan / Wild animals  
Tevayî bi navkirina lawirên dirinde.

**Ajalên kedî** / Evcil hayvan / Pet  
Tevayî bi navkirina ajalên ku hînfî mirovan bûne û bi mirovan re dijîn, ji aliyê mirovan ve têne xwedî kirin. Mirov ji berên van ajalan sûdê digrin.

**Ajotin** / Sürmek / Driving  
Riyên ji bo gehîştina gewherê ku tên vekirin û çêkirin.

**Akreditîv::Nameya baweriyê** / Akreditif / Letter of credit  
Nameya krediyê. Nivîsa bawerê.

**Aktînit** / Aktinit / Actinide  
Di rasteka vedorê de beşên ji vedora 7. hatiye cudakirin. Ji elementa 89 (Ac) 'an heya 103 (Lr) 'an didome.

**Aktivasyon::Çalak kirin** / Etkinleştirme / Activation  
Destpêkirina kirariyê.

**Akû::Komker/Akû::Akümülatör/Accumulator**  
Amûra ku enerjîya elektrîkî bi awayê enerjîya kîmyayî di nava xwe de kom dike, dema pêwîst be enerjîya kîmyayî bi awayê enerjîya elektrîkî dide derve.

**Alandin::Pêçan** / Ambalajlamak / Package  
Xemilandin, nixumandin an jî parastina heyberan.

**Alav** / Lav / Lava  
Agirê ku ji kûrahiya binê erdê bi pijiqîna ji çiyayê agirîn derdikeve ser rûyê erdê.

**Alav::Amraz** / Alet / Tool  
Parçeyên ku makîneyekê pêk tînin û wê dixebitînin. Heyberên ku kar bi wan tê kirin.

**Alav::Pêt** / Alev / Flame  
Ronahî û germahiya ku ji nava agir bilind dibe.

**Aldehît** / Aldehit / Aldehyde  
Di nav pêkhatiyên organîk de cih digire. Tê de koma karbonîl hebe û yek Hîdrojen (H) pê ve giradayî be ji wan re Aldehît tê gotin.

**Alfa::Elfa** / Alfa / Alpha  
Tîpa pêşîn a alfabeya yewnanî ye

**Algorîtm** / Algoritma / Algorithm  
Dî Serdema Navîn de ji bo hesabên jimarên dehî hatiye bikaranîn

**Alî::Araste** / Yön / Direction  
Bakûr, başûr, rojhelat û rojava çar arasteyên bingehîn in. Hêla li gor xalekî. Ji xalekî ber bi xalekî din.

**Aliyê saetê ve::Hêla saetê ve** / Saat yönünde / Clockwise  
Zivirîna wek ku saet dizivire.

**Alkalîpîv** / Alkaliölçer / Alkalimeter  
Rêbazê ku pê alkalî tê pîvan.

**Alkan** / Alkan / Alkane  
Navê giştî yê pêkhatiyên organîk a girêkên fer e. Ev girêkên fer tenê di navbera elementên karbon (C) û Hîdrojen (H) de çê dibin.

**Alkîl** / Alkil / Alkyl  
Pêkhatiya ku ji alkanan girêkek hîdrojen jê veqetandî be.

**Alkîn** / Alkin / Alkyne  
Pêkhatiyên organîk in. Di nav zincîra hîdrokarbonan de ku herî kêmkarboneke sêlibî di nava xwe de dihevwîne.

**Alkol** / Alkol / Alcohol  
Şilemaniya ku ji tîştên wek kartol, silk an jî şerab û bîrayê tê derxistin, fûrek û bibêhn e.

**Alkola etîfî** / Etil alkol / Ethyl alcohol  
Bi fermantasyona karbonhîdratên ku di fêkî, regên riwekan û di hinek zadan de heye çêdibe. Di araqê de tê bikaranîn, bê reng e û agirgir e.

**Alozî** / Karışıklık / Confusion  
1. Tevlihev 2. Teqoze.

**Alterasyon::Guherîn** / Alterasyon:Bozulma / Alteration  
Guherîna kanzayan (maden) a bi bandora fizîkî û kîmyayî.

**Alternatîf::Guhrik** / Alternatif / Alternative  
Ji bo çêkirina karekî hebûna rê û rêbazên cûda. Hevberekî ku cihê yekî din digire.

**Alûc** / Erik / Plum  
Dareke çandiniyê ye. Gulên vê darê spî ne, fekiyê



vê darê tirş an jî meyxoşin, yek dendikekî tê de heyê.

**Amadekirin** / Hazırlama / Preparation  
*Xebatên beriya destpêka hilberîna gewheran.*

**Amalgam** / Cıvalı alaşım / Amalgam  
*mêjeya ku zîbeq (cıva) tê de heyê.*

**Amêje::Darişte** / Alaşım / Alloy  
*Herî kê mî ji du metalan çêdibe. Du yan jî zêdetir metal di nava hev de dikelîjin û piştire madeyeke cuda li gora taybetmendiyên fîzîkî çêdibe. Mînak; Tûnc, Qela.*

**Ametal** / Ametal / Nonmetal  
*Di rasteka peryodîk de yên ku metal nîn in. Di nav germahiya normal de hem avî, hem hewayî, hem jî hişk (req) in. Germahî û ceriyanê hîlnagire.*

**Amîd** / Amit / Amide  
*Anyona azotekî ye.*

**Amîno Asîd** / Amino asit / Amino acid  
*Mokekuleke ku proteîn jê çêdibin.*

**Amper** / Amper / Ampere  
*Nîşana wê A ye. Amper yekeya SI (Système international d'unités) bo rewta elektrîkê ye. Li gor pênasîyê: 1 amper ew rewte, ya ko dema di nav di du bistên rast û paralel re, yên bê dawî dirêj in û metreyekê ji hev dûr in, derbas dibe, ew hêzeke bi qasî  $2 \cdot 10^{-7}$  newton li ser metrê (N/m) di nav her du bistan de diafirîne.*

**Amper-pêç** / Amper sarım (akım miktatıslık birimi) / Amper- turn  
*Yeksaniya bandora 1 amperê ya di 1 pêçê de derbas dibe.*

**Amperpîv::Empêrpêw::Ampermetre** / Ampermetre / Ammeter::Ampermeter  
*Amûra ku amperê dipîve.*

**Amplîdîn** / Amplidin / Amplidyne  
*Amûra ku elektrîka guherbar digre û diguherîne elektrîka rast.*

**Amûrên pîvanê** / Ölçü aletleri / Measuring instruments  
*Di nexşegeriyê de alavên pîvanê. Bi van alavan hem dirêjahî hem jî hoke (goşe) tê pîvan. Di cureyên elektrîk de koordînat (x y) û bilindahiya ji deryayê (z) rasterast tê hesapkirin.*

**Amûret** / Tesisat / Installment  
*Kereseyên ku di avahiyan de bi kêr tê, wekî bori-*

*yên (Lûleyên) kalorîferê, boriyê avê, boriyê karêba û hwd.*

**Amûretkar::Amûrsaz** / Tesisatçı / Plumber  
*Di avahiyan de kesê ku karê sazîkirina borî, kablo û wekî din dike.*

**An::Yan** / Yada / Or  
*Di mantiqê de deriyê ku ji têketinê yek jî erê be yan jî hebe, encam erê ye.*

**Anafîtkî::Sikarî** / Çözümsele::Analitik / Analytical  
*anîstiya dahûrandinê.*

**Anafîza gaza kanê** / Ocak gazı analizi / Mine air analysis  
*Makîneya ku rewşa gazê di kanê de dişopîne û rapor dike.*

**Analog** / Analog / Analog  
*Daneyên ku bi domdarî di guherîna de ne.*

**Anhîdrîd** / Anhidrit / Anhydride  
*Di pêkhateya kalsiyum sulfad (CaSO4) a bêavî de girêkek taybet a kevîr çêker.*

**Anod** / Artı uç::Anot / Anode  
*Di elektrîkê de cemsara pozîtif. Elektroda pozîtif.*

**Antên** / Anten / Antenna  
*Amûra ku pêlên elektromagnetîk digre an jî dide.*

**Antîfrîz::Dijqerîsîn** / Antifriz / Antifreeze  
*Madeyek şilek û zivistanê tevî radyatora makîneyan dibe da ku ava hundirê radyatorê cemed negire. Piştî ku antîfrîz dikeve nava ava radyatorê xala cemidîna ya ava radyatorê jî sifir (0) ê kêmtir dibe.*

**Antîmade** / Antimadde / Antimatter  
*Cêwiya made ya dijber.*

**Antîmon** / Antimon / Antimony  
*Elementa di tabloya peryodîk de a li stûna 5A. Elementeke hişkî, şikestok û rengê wê zîvsiyê.*

**Anyon** / Anyon / Anion  
*lyonên ku barê elektrîkî yên negatîf in.*

**Aplikasyon::Bicîhkirin** / Aplikasyon / Application  
*Li gor proje, nexşê an jî koordînatê cîbicîkirina cihê wê. Nîşandana cihê wê. Ev cih dibe ku li erdê be, dibe ku li hewayê be jî.*

**Aqil** / Akıl / Mental  
*Hêza têgihîştinê, fêmkirinê û hizirîna ye.*

**Aqûstîk::Dengî**/Yankî bilimi::Akustik / Acoustic  
*Zanîstiya deng.*

**Araste::Berek** / Doğrultu / Direction  
1. Riya ku tê şopandin. Riya diyar. 2. Riya tîrê.  
*Mînak; di pergala kordînat de 'x', 'y' û 'z'*

**Ardû::Sotemenî** / Yakacak / Firewood  
*Ew tiştê ku ji şewitandina wî sûd tê girtin.*

**Argûda bej**/Ak taş yoncası/Mellilotus alba desf  
*Cureyek nefelê ye. Ev giya du sal dijî ji bo êm ê sewalên giyaxwar çandiniya vê giyayê tê kirin.*

**Argûn** / Ocak / Cooker  
*Cihê ku agir tê de tê dadan û xwarin li ser tê pi-jandin.*

**Arik::Asreq::Sepîtk::Serke::Mîç::Qatî** / Tavan / Ceiling  
*Asta herî bilind a avahiyeke ku ser wê girtî be.*

**Arîze::Girift** / Anza / Defect  
*Pirsgirêkên mekanîk. Xerabûna amûrên mekanîk*

**Arkeolojî::Sûnwarnasî** / Arkeoloji / Archeology  
*Zanîsta kolanê ya ku mîratên dîrokî yê di bin erdê de lêdikole û derdixe holê.*

**Armatûr** / Armatür / Armature  
*Amûra ku lambe tê de bi cî dibin da ku bi hêsanî ronahiyê belav bikin.*

**Arşîv** / Arşiv / Archive  
*Di ciheke ewle de, ji bo rojên pêş komkirina û depokirina agahiyên. Ev arşîv fîzîkî jî dibe, elektroni-kî jî dibe.*

**Asbest** / Asbest / Asbestos  
*Kereseyeke li ber germahiya zêde taybetmendiyê xwe wenda nake. Di balatayên amrazan de, di lûleyên avê de tê bikaranîn.*

**Asêgeh::Birc** / Hisar / Citadel  
*Keleheke biçûk a ku ji kevir bi dîwarê bilind hatiye çêkirin û li derdora wê hendek û nêrîngê hene. Ji bo parastina bajarekî an jî ciheke girîng e.*

**Asenkron::Nehevdem** / Eşzamansız / Asynchronous  
*Ne hemdemî. Makîneyên ku di heman demê de bersiva daxwazên cûda dikare bide.*

**Asfalt kirin::Qîrkin** / Asfaltlamak / Asphalting  
*Rûxarên ku bi qîr û kevirên hêrayî ve bê hefidandin.*

**Asîd** / Asit / Acid  
*Madeyê şilek ku rengê kaxîzê tûrnûsolê ji kesk dizivîrîne sor. Madeyê ku pH' a wî ji 7, 5 biçûktir e.*

**Asîda Hêzdar** / Kuvvetli asit / Strong acid  
*Asîda ku di nava avê bi tavahî iyonîze dibe.*

**Asîda Karboksîfîkê** / Karboksilik asit / Carboxylic acid  
*Asîdên organîk ku koma wan a karbonsîlê heye.*

**Asîda lawaz** / Zayıf asit / Weak acid  
*Asîda ku di nava avê bi tavahî iyonîze nabe. Hindik iyonîze dibe.*

**Asîka bajar::Sûliyeta bajêr** / Şehir silüeti / City silhouette  
*Teşeyê bergeha bajêr.*

**Aso** / Ufuk / Horizon  
*Xeta ku erd û ezman lê digîje hev.*

**Asoker::Terazû** / Düzec / Spirit level  
*Ji bo alav ji pivanê re amade be pêwîst e bi şeweya terazû an jî asoyê de be (berwar be).*

**Asokera giloverî::Asokera kûreyî** / Küresel düzec / Spherical bubble  
*Du cureyên asokeran hene, gilover û silîndîrîk. Asokera gilover wek navê xwe di şeweya gilover de ye. Alava pîvanê aso dike.*

**Aspîrator::Bakêş::Hewakêş** / Aspiratör / Aspirator  
*Amûr an jî makîneya ku hewayê davêje derve. Bi alîkariya perwaneya xwe ya ku dizivire bayê dikêşe (dimije) û davêje derve.*

**Asteng::Berbest** / Engel / Barrier  
*Ji bo ku rê li ber qezayan bê girtin li qeraxê rê ji hesin wek caxan tê çêkirin, ji bo trafîka nava bajêr bi awayekî hêsan biherike ji betonê tê çêkirin û danîn.*

**Asteng::Berbest** / Engel / Barrier  
*Bend. Heybera ku rê digire. Heybera ku rawêşa asayî bibire. Derbasbûyîne dide sekinandin. Mînak; dîwarê bendavê, sêncax baxçe, hesinê dora rê*

**Astenga Coulomb::Berbeste Coulomb** / Coulomb engeli / Coulomb barrier  
*Bendava enerjîyê ya li pêşiya du dendikan ku ji bo du dendik (nuclei) bigihîjin hev (fusion). Ji aliyê enerjiya potansiyel a elektrostatîk ve tê çêkirin.*

**Astengîn::Rêgir** / Önleyici / Preventive  
*Ji bo tiştên şaş û nebaş çênebin berlêgirtin an jî asteng kirina tiştên ku hatiye çêkirin.*

**Asteplan** / Plankote / Level plan  
*nexşeya herêmên biçuk lê pivaneka wan mezin. Pîlana waziyetê nişandide lê bilindahi ji li ser hati nişandan. Pîlana waziyetê ya ku daneyên wê xyz bin.*

**Asûna dawî::Çîgeha dawî::Duwacih** / Nihai pozisyon / End position  
*Merhela berhemên kanzayî ya piştî kiriyariya dawî.*

**Asûna nêtar::Asûna bêlayan** / Nötr konum / Neutral position  
*Asûna (pozisyon, rewş) bidawîbûna bandora meqletîzê.*

**Aş** / Değirmen / Mill  
*Avahiya ku genim lê tê hêrandin û dibe arvan, mînak, Aşê avê, aşê agir (aşê elektrîkê)*

**Aşê keviran::Berhêr** / Çakıl değirmeni / Pebble mill  
*Aşê ku keviran hûr dike.*

**Aşî::Şape** / Çığ / Avalanche  
*Ji bo koma berfê ya ku ji çiyê ber bi jêr ve digin-dire.*

**Aşkera::Diyar::Kifş** / Görünen / Apparent  
*Tiştê ku xuya dike yan jî li ber çavan e.*

**Atmosfer** / Atmosfer / Atmosphere  
*Gaza li dora dinyayê.*

**Atom** / Atom / Atom  
*Li gorî fîlozofên yewnanî, hêmanen bingehîn ên rastiyê yên ku parçe nabin û xera nabin.*

**Atomên wergir::Gerdfîleya wergir** / Alıcı atomlar / Acceptor atoms  
*Atomên ku hejmara elektronên wan ji hejmara protonên wan kêmtir in. Atom her dem hewl didin ku hejmara proton û hejmara elektronên wan yeksan bin.*

**Av** / Su / Water  
*Madeya şilek a bê reng, bê bêhn, bê tam e. Ji du hîdrojen û oksîjenekê pêk tê. Formûla wê H<sub>2</sub>O ye.*

**Ava bîr (Sîb) ê** / Kuyu suyu / Well water  
*Ava ku bi bîrkolê (sondaj) ji bin zemînê tê derxistin.*

**Ava çaviyê** / Gözenek suyu / Pore water  
*Çaviya ku av jê dertê.*

**Ava deryayê** / Deniz suyu / Sea water  
*Ava derya û zeryayê ya ku rêjeya xwê di lîtrayê de di navbera %3-5 e.*

**Ava golê** / Göl suyu / Lake water  
*Ava ku di cihê kûr de berhevbûyî û sekan e.*

**Ava jêrerd::Ava jêrzmîn** / Yeraltı suyu / Ground-water  
*Ava berf û baranê ya ku bi riya qelîstekên zemînê di bin erdê de digihîje hev û kom dibe.*

**Ava jêrzmîn::Ava binerd** / Serbest yer altı suyu / Free phreatic water  
*Ava li bin erdê sekan e. Dema ku kanza tê kolan ev av di nav qelş û derzan de dizê yan diherike.*

**Ava kaniyê::Kanîav** / Kaynak suyu / Spring water  
*Ava jêrerdê ya ku bi awayekî xwezayî derdikeve rûyê erdê.*

**Ava navxweyî::Ava navwelêt** / İç sular / Inland water  
*Ji bilî av derya û zeryayê hemû çavkaniyên avê yên li ser bejahiyê. Wek gol, golê çêkirî, avzê û çeman.*

**Ava Xwerû** / Saf su / Distilled water  
*Ava ku ji madeyên organîk û înorganîk hatî safî-kirin.*

**Avadanî::Îmar** / İmar / Reconstruction  
*Avadani, avadanikirin. Nukirin, Çêkirin, başkirin.*

**Avahî** / İnşaat / Building  
*Ew avahiya ku ji bo çêkirina wê xebat bê kirin.*

**Avahî** / Yapı / Building  
*Hemû berhemên avahîsazî û endezyariyê yên mîna xanî, pir û hwd. ên ku ji aliyê mirovan tên çêkirin. Bi mebesta hêwirandin û hêsankirina jiyana ye.*

**Avahîkar** / İnşaatçı / Builder  
*Kesê/a ku di lêkirina avahiyên de cih digire.*

**Avahîkarî** / İnşaatçılık / Construction business  
*Xebata çêkirina avahiyên.*

**Avahîsaz::Telarsaz** / Mimar / Architect  
*Kesê/a ku planên avahiyên çêdike.*

**Avahîsazî::Telarsazî** / Mimarlık / Architecture  
*Pîşeya avahîsazan.*

**Avahiya bêdestûr** / Kaçak inşaat / Unlicensed building

*Avahiya derzagon (îlegal) an ji a ku ne li gor projeya xwe hatiye çêkirin.*

**Avahiya dersînor** / Taşkin inşaat / Construction of flood

*Ew beşa avahiyê ku di dema çêkirinê de ji sinorê parsela xwe derketî ye.*

**Avahiya kargir (kagir)** / Kagir yapi / Masonry

*Avahiya ku dîwarên wê barhilgir e (giraniya barê xênfî li ser dîwarayê) û ev dîwar ji kevir, acûr hatiye çêkirin.*

**Avahiyên dîrokî** / Tarihi yapı / Historical structure

*Avahiyên kevnare ku xwedî nîrx û taybetmendiyên baş in.*

**Avakado:Hirmiya emeriqan** / Avakado / Persea americana miller

*Dareke li meksîqâ dijî. Çandiniya wê tê kirin. Ji malbata hirmiyê ye.*

**Avakirin** / İnşaa etmek / Build

*Lêkirina avahiyên.*

**Avakirin** / İnşaa etmek / Build (to-)

*Avahiyeke ku nû tê çêkirin.*

**Avakirin** / Kurmak / Build up

*Sazkirina parçeyên avahiyê.*

**Tesîsa Parzinandinê** / Aritma tesisi / Treatment plant

*Avahiya ku bermahiyên req û şilemenî yê bajêr tê de tîn parzinandin*

**Avakirina sazî û avêtî** / Atik ve aritma tesisleri /

Waste and water treatment plants

*Avahiya ku bermahiyên req û şilemenî yê bajêr tê de tîn parzinandin*

**Avdan** / Sulama / Irrigation

*Di erdê bejî de ji karê avdaniya rehekan re te gotin.*

**Avdank** / Suluk (su kabı) / Water bowl (water container)

*Amûreke ji bo ajal pêdiviyên xwe yê avê bi cih bînin.*

**Avdêr:Cenan** / Sulamacı / Waterer

*Mirovê ku avdaniya zevî an jî beşçeyan dike.*

**Avêtî** / Atik (madencilik) / Waste (mining)

*Bermahiyên kanerî, avêjên kû pey derxistina cewhera dimînin*

**Avêtin** / Atış / Toss

*Bi alîkariya hêzekî ku heyber tê pekandin.*

**Avêtina kevaneyî::Avêtina xwar::Avêtina lar** /

Eğik atış / Oblique shot

*Hevedudaniya tevgera stûnî û tevgera araste ya rast e. Tevgera kevirê ku dema mirov ber bi pêş ve diavêje ye.*

**Avêtîyên pîşesaziyê** / Sanayi atıkları / Industrial waste

*Avêjên (atik) kû li pey bikaranîna kargehê pîşesaziyê dimînin.*

**Avgerm** / Sıcak kaynak suyu:kaplıca / Hot spring

*Ava germ a ku bi rêya qelîştêkên di zemîn de ji kûrahiya binzemînê der tê.*

**Avî** / Su içeren / Water-carrying

*Tiştê ku bi avê re eleqedar e.*

**Avî** / Sulu / Aqueous (aq)

*Yê ku ji avê pêk hatiye, avdar.*

**Avkêşî::Avtêbihurî::Dellandin** / Su geçirgenliği /

Water permeability

*Pîleya avtêbihurîna (avkêşiya) hişkiyên serzemîn û binzemînê*

**Avnasî** / Su bilimi:hidroloji / Hydrology

*Zanista ku li ser avê xebatê dimeşîne.*

**Avnekêş::Avgir::Avnemij::Avragir::Avtênebihur** /

Su geçirmez / Watertight

*Cih an jî tiştên ku av tê de derbas nabe.*

**Avpîv::Araometre** / Araometri / Areometer

*Amûra ku avê dipîve.*

**Avrêjk** / Pisuvar / Urinal

*Ew alava ku mirov li piyan destava xwe ya biçûk tê de dike.*

**Avrêjna kanê** / Ocak drenajı / Mine drainage

*Di kanzayê de avêtina gazên xeternak. Mînak: Metan*

**Avreşandek::Avreşank** / Fiskiye / Sprinkler

*Amûra ku avê direşîne û avdanî pê tê kirin.*

**Avûstûralya başûr::Başûrê Avûstûralyayê** /

Güney avustralya / South Australia

*Eyaletêke li başûrê avûstralya kû bi mezindahiya xwe 983482 km<sup>2</sup> ye axa herî zûwa ya parzemînê di nava sînorê vê eyaletêdeye*

**Ax** / Toprak / Soil

*Ji rizîna kevir û madeyên organîk çêdibe û di*

*nava xwe de gelek ajal, nebat (riwek) û organîzmayên zindî dihewîne. Dar û riwekên din bi axê di sekinin û jê avê û pêwîstiyên xwe yên jiyanî digirin. Ruyê cîhanê wek tebeqeyekê pêçaye.*

**Axa gelêşî::Axa rizî** / Humuslu toprak / Humic soil  
*Axa ji rehek (nebat) û zindiyên riziyayî çêbûye. Rengê wê reş e, avê baş dihewîne û ji aliyê mîneralan ve zengîn e.*

**Axa sor::Gila sor** / Kırmızı kil / Laterite  
*Axa ku di pêkhateya xwe de yan jî di nava xwe de Alumînyum silîqat ( $Al_2O_3 \cdot 2SiO_2 \cdot 2H_2O$ ), hesin oqşît ( $Fe_2O_3$ ), magnezyûm (Mg), kevirê kilsê ( $CaCO_3$ ), dihewîne. Axeke zixur, biçûk, şidiyayî û avtênebihûr e.*

**Axa xam** / Ham toprak / Raw land  
*Axa xam û ji bo çandiniyê nehatiye bikaranîn.*

**Axban** / Toprak dam / Soil roof  
*Banên xaniyan ên ku bi axê hatine çêkirin.*

**Axur** / Ahır / Stable  
*Avahiya ku ji bo hêwirandina ajalên hatiyê çêkirin.*

**Aydinger** / Aydinger / Tracing  
*Kaxiza şimakirî ye, ji bo çêkirina projeyan tê bikaranîn.*

**Ayrometer** / Havaölçer / Aerometer  
*Amûra ku tîrbûniya gazê dipêve.*

# { B }

**Babelfîsk::Bablîsok::Gerdelûl** / Hortum / Whirlwind  
*Bûyera ku ba (hewa) li dora xwe dizivire û wek stûnekî bi jor ve hildikişe.*

**Bac** / Vergî / Tax  
*Ew pereyê ku dewlet ji hemwelatîyên xwe ji bo xizmetên gelemperî bike, digre.*

**Baca Maldariyê::Baca xanûberan** / Emlak vergisi / Land tax:Property tax  
*Pereyê ku xwediyê milk dide dewletê.*

**Baca Xanûberan** / Taşınmaz mal vergisi / Immovable property tax  
*Baca ji bo emlakın (zevîzaran), malûmilkan tê dayin. Baca erdê û avahiyın e, li gor qîmeta xwe salane tê dayîn (li Tirkîyê şaredarî vê bacê distînin)*

**Baca zêdebûna nîrx** / Değer artış vergisi / Increment value tax  
*Baca ku ji bo zêdebûna buhaya zevîzaran (emlak) , malûmilkan tê dayin.*

**Baca zevîzaran::Baca emlakê** / Emlak vergisi: taşınmaz mal vergisi / Property tax  
*Baca ku ji bo zevîzaran (emlakın), malûmilkan tê dayin. Baca erdê û avahiyın e li gor buhaya xwe salane tê dayin (li Tirkîyê şaredarî distînin)*

**Bacdarkirin** / Vergilendirme / Taxation  
*Lê ferzkirina bacê ya li ser kesekî yan jî saziyekê.*

**Bafûn::Fafon** / Alüminyum / Aluminium  
*Elementeke ku numreya wê ya atomê 13, giraniya wê ya atomî 26, 98 û di 660 c'yi de dihele;*

*kurteya wê "al" e*

**Bager** / Kasırga / Hurricane  
*Bayê herî bi hêz û tund, bayê barhilgir û fetlonekî.*

**Bahoz::Gerdelûl** / Fırtına / Storm  
*Bayê bilez, bayê ku toz û talazê radike.*

**Bajar::Şar** / Şehir:kent / City  
*Warê ku mirov lê dijîn û bi piranî karê bazirganiyê yan jî karê pîşesaziyê dikin.*

**Bajarê Mezin::Metropol/Metropol/Metropol**  
*Bajarên ku bi şênîyên xwe mezintirîn in. Bajarê mezin û kozmopolîtan.*

**Bajarên alîgirê berastengan** / Engelli dostu kentler / Disabled-friendly city  
*Bajarên ku dema tê damezrandin astengdaran li ber çav digire û jiyana wan hêsantir dike.*

**Bajarên çalexwarkî** / Çarpık kentleşme / Urban sprawl  
*Bajarên ku bê plan, derplan, bê destûr û bê rist in*

**Bajaren hewş (Bexçebajar)** / Bahçe kent / Garden city  
*Avakirina bajarê dorgirtî yê ji bo jiyaneke bi konfor û bi tenduristî. Bi ser de ji hawirdorê bajêr jî ji bo karê çandiniyê cî tê veqetandin.*

**Bajarên Kompakt** / Kompakt kent / Compact city  
*Bajarên ku li dora navendekî bi awayekî sîstematîk mezin bûne. Taxên bajêr bi hev ve ne.*

**Bajaren pêgirtî (rexbajar:yan kent, peykbajar)** / Uydu kent / Satellite city

*Cihwarbûna bi bajarê bingêhîn re tekildar û ji bo sivikkirina barê bajarê bingêhîn hatine avakirin.*

**Bajarnasî** / Kentbilim / Urban science  
*Beşa zanistiyê ya dermafê bajêrde.*

**Bakalît** / Bakalit / Bakelite  
*Cureyeka reçîneya çêkirî ye.*

**Bakterî::Dirmî** / Bakteri / Bacteria  
*Mikroorganîzmaya weşane.*

**Bakteriyolojî** / Bakterioloji / Bacteriology  
*Bi gelemperî zanistekê li ser teşe û çawanîya bakterîyan lêkolînê dike.*

**Bakûr** / Kuzey / North  
*Li gor pejirandina gelemperî de beşa jor. Aliyê cemsera jor.*

**Bakûra erdnîgarî** / Coğrafî kuzey / Geographic north  
*Bakûra ku koordînatên grîdê yê stûnî nîşan dide.*

**Bakûra magnetîk** / Magnetik kuzey / Magnetic north  
*Bakûra ku erdkêşa magnetîk nîşan dide. Li gor magnetîka gerdûnê cihê wê neseke e, li gor demên salê cihê xwe diguhore. Nêzî bakûra erdnîgarîyê ye lê ne heman cih e.*

**Balafir::Firoke** / Uçak / Airplane  
*Barbireke (seyare) ku bilind dibe û difire.*

**Balafirgeh::Firokexane** / Havalimani::Hava alani / Airport  
*Cihên taybet ên ji bo balafir lê deynin û rabin. Rawestgeha balafiran e.*

**Balîcan::Balcanreş** / Patlıcan / Melongena  
*Sebzeyek di navda nîkotîn heye. Rengê fêkiya wê reş an jî xerî ye.*

**Balisk::Akasya zer** / Sansalkim::sarı akasya ağacı / Laburnum vulgare griseb  
*Famîlyeyeke darên pelfireh e. Kulîlkên xwe biharê vedike.*

**Balîstîk** / Balistik / Ballistic  
*Zansteke li ser tevgera gule û moşekan lêkolînê dike.*

**Bamye** / Bamya / Gumbo  
*Fekiye wê şîn an jî hişk tê xwarin.*

**Ban** / Çatı / Roof::Rack  
*Tebeqeya ku ser xanî digire.*

**Ban** / Dam / Roof  
*Serê xanî, diyarê xanî*

**Banbûnye** / Barbunya / Mullus barbatus  
*Ji malbata fesuliyeyê ye. Ji fekiye wê sûd tê girtin.*

**Band** / Band / Band  
*Di spektrûma elektromagnetîk de beşeke ku di navbera frekansên diyar dihevine. Mînak; Banda P (navbera 200 MHz û 400 MHz)*

**Banda îzolasyonê::Têp::Banda şiyareker** / Yalıtıcı bant / Insulation tape  
*Cureyekê bandê ya ku ji bo parastina ji germahî, serma, elektrîk, av an jî hwd. tê bikaranîn.*

**Bandora compton** / Compton etkisi / Compton effect  
*Rewşa zêdebûna qama pêlên foton ku li elektronek dikeve ye. Dema foton li elektronek dikeve qama pêlên fotonê zêde dibe.*

**Bandora doppler** / Doppler etkisi / Doppler effect  
*Darekî temenê wî pir dirijê. Qurmên vî dare ji ber kû gelek qewîme di necariyêde tê bikar anîn. Alav û gelek amûr berê ji vî darê dihat çêkirin. Disa sirûd ji kankilê vi darê zi tê sitandin.*

**Dara Kizwanê::Dara şengêlê::Dareben::Dara benîştê** / Bittim ağacı / Pistacia eurycarpa yalt  
*Dareke ku orjîna wê ji Kurdistanê ye. Ji fêkiya wê qehwe, sabûn, tizbî tîn çêkirin. Famîlyeyeke darên pelfireh e. Makedara fistiqê ye.*

**Dardaroka elektrîkê** / Elektrik sarkacı / Electric pendulum  
*Kûreyekî ku bi madeyekî ne gihêner daleqandiyê û li gora barê elektrîkê yê dora xwe pêş de an jî paş de diçe.*

**Dardaroka hêsan** /Basit sarkaç /Simple pendulum  
*Benekî hilawistî girêdayî û bi seriyê serbest ve heyberekî bi giraniya G heye û bi awayekî serbest tevdiğere.*

**Darêj** / Döküm / Casting:Dump  
*Ji bo teşedayîna metalan helandin û rijandina nava kalib.*

**Darika amrazan** / Araç çubuğu / Toolbar  
*Di kompî terê de parçeyek ji bernameyê mîna geroka înternetê anjî autocadê ye ku alîkariya bi-karhêner dike.*

**Darika pêşdeçûnê** /İlerleme çubuğu /Progress bar  
*Di kompî turê de nîşandêra barbûyîna agahiyane.*

**Darika rewşê** / Durum çubuğu / Statusbar  
*Di kompî terê de li jêra rûpel e û agahî di derbarê rûpel de dide.*

**Darîn::textîn::Depîn** / Ahşap / Wooden  
*Tiştên ku ji daran çêdibin.*

**Daristan** / Orman / Forest  
*Qada daran.*

**Darîştaya kanzaya req::Amêjeya metala req** / Sert metal alaşımı / Hard-metal alloy  
*Amêjeya metal a ku dijwar e. Mînak; Pola, Tûnc*

**Das::Şalok** / Orak / Reaping-hook  
*Amûreke ku ji bo birîna hejik, qirşik, giya û hwd. tê bikaranîn.*

**Dawerivîn** / Süzme / Filtration  
*Ji hev veqetandina madeyên hişk û şilek bi alîkariya heyberekî ku madeyên şilek tê de derbas dibe.*

**Dawerkêr** / Damıtıcı / Alembic  
*Amana laboratuwar ku madeyên şilek tê de tê dowerandin.*

**Dawîleanîna hevpariyê** / Paydaşlığın giderilmesi / Elimination of fellowship  
*Di mulkiyeta hevparde, qedandina hevpariyê.*

**Dawîn::Paşîn** / Son / Last:End  
*Tiştê ku li herî paş maye, li dawiyê ye.*

**Daxistger** / İndirgen / Reductant  
*Di reaksiyonên kîmyayî de madeyê ku bergira elektrîkî ya metalekî dadixîne.*

**Daxistgerî** / İndirgenme / Reduction  
*Di reaksiyonên kîmyayî de karê daxistina bergira elektrîkê ya metalan.*

**Daxuran** / Erozyon / Erosion  
*Xwe ranegirtina axê li hemberî herikandina av, ba û baranê.*

**Dazelandin::Parzînanandin::Dawerivandin::Sefandin** / Süzme / Filter  
*Heke çend tiştên cuda (dibe ku ev tişt madeyên şilek an jî agahiyên cuda bin) di nav hev de bin û mirov bixwaze wan ji hev veqetîne mirov karê "dazelandin"ê dike. Mirov wan tiştan dadizelîne.*

**Dazelîn** / Damıtma / Distillation  
*Ji hev veqetandina madeyên şilek. Mînak:Dîzel, Benzîn û rûn ji petrola xav têne veqetandin.*

**Def::Dahol** / Davul / Drum  
*Def amûreke muzîkê ye. Def ji text û eyarê (çerm) ajalan çêdibe. Textikê tenik tê tewandin û dikeve şeweyê rûloyekê piştê jî aliyekî rûloyê (sîlîndîr) bi eyar tê gir tin. Dema tiştêk li eyar dikeve deng jê dertê.*

**Deh** / On / Ten  
*Navê hejmarekê ye. Ji jîmara 9ê girtir, ji jîmara 11ê jî biçûktir e. Bi awayê 10 tê nivîsîn. Di jîmarê Romayî de X.*

**Deh hezar** / On bin / Ten thousand  
*Navê hejmarekê ye. Bi awayê 10000 tê nivîsîn.*

**Dehkenar::Dehgoşe** / Ongen / Decagon  
*Şeweya ku deh la (kêlek) û deh goşeyên wê*

*hene, dirêjahiya hemû layên wê yeksanin û goşeyên ji navda yên wê jî 144 pile (degree) ne.*

**Dehlîz::navrê** / Çevredaliz:dehliz / Ambulatory  
*Derbastgehên teng û sergirtî yên di nav avahiyên dîrokî de.*

**Dehşîk::Cehş** / Sipa / Colt  
*Têjîkên keran.*

**Dekagram** / Dekagram / Decagram  
*Yekeya giraniyê ya ku 10 car li gramê ye.*

**Dekalître** / Dekalitre / Decaliter  
*Yekeya qebareyê ya ku 10 car li lître yê ye.*

**Dekametre** / Dekametre / Decameter  
*Yekeya dirêjahiyê ya ku 10 car li metreyê ye.*

**Dekar** / Dekar / Decare  
*Deh çaran Ar (100 m kare) 'ê ye û 1000 metre kare. Ar jî wekhevê 100 metre kare ye.*

**Dêlegur** / Dişikurt / Female wolf  
*Gura mê.*

**Dêlîf::Mêw** / Asma (üzüm bağı) / Vine (vineyard)  
*Dara tîrî.*

**Dêlik** / Kancîk:Köpeğin dişisi / Female dog  
*Kûçîka mê.*

**Dêlîn** / Kamaşma / Glare  
*Bi bandora şewqa zêde nedîtina çavan.*

**Defînbar::Derbasbar** / Geçirgen / Permeable  
*Rûyê ku madeyê şilek û gaz dibihurîne.*

**Dema betal** / Boş zaman / Idle time  
*Di kompîterê de dema ku bername naxebite.*

**Dema gerê** / Devir sûresi / Cycle time  
*Di sînyalekî de dema ku yek dewr digire. Dema 1 frekasê.  $T=1/f$*

**Dema ghiştinê** / Varîş sûresi / Arrival time  
*Di çûyîna ji cihek heta cihek din de dema ku derbas dibe.*

**Dema ragihîştinê** / Erişim sûresi / Access time  
*Di kompîterê de dema ku ji bo yek yekê dane were xwendin.*

**Deman::Kirê** / Kiralamak / Rent  
*Tiştê ku ji aliyê xwediye wî ve ji bo demekê û bi buhayekî tê dayîn.*

**Demjimêr** / Saat / Watch  
*Çîhaza ku demê nîşan dide.*

**Demsalî::Werzî** / Sezonluk:Mevsimlik / Seasonal  
*Tiştê ku li gorî hewayê tê bikaranîn.*

**Dendika atomê::Nukleûs** / Atom çekirdeği / Atomic nucleus  
*Navenda atomê ku ji proton û neutronan (ji bilî Hîdrojenê) pêk tê.*

**Deng** / Ses / Sound  
*Bi guh tê bihîstin (sekirin). Axaftin bi alîkariya dengê ku ji gewriya mirov dertê çêdibe. Dema made dilerizin deng dertê holê.*

**Dengpîv** / Ses ölçer / Phonometer  
*Amûra ku pê hêza deng tê pîvandin.*

**Dengzanî** / Sesbilim / Acoustics  
*Beşa zanistêye ya lêkolina dengên diyarkirî dike.*

**Dep** / Kalas / Timber:Wood:Plank  
*Darên çargoşe yên kêm zêde ku firehiya wan 30-50 cm, bilindahî 10 cm û dirêjahî jî bi qasî 3-4 metreyan e. Ev dar di karên mobîlya, avahî û çêkirina avahiyên de tên bikaranîn.*

**Depokirina avê::Embarkirina avê** / Su depolama / Water storage  
*Komkirina avê di lîçekê de.*

**Dêr** / Kilise / Church  
*Perestgeha xirîstîyanan e. Avahiya ku xirîstîyan tê de îbadetên xwe dikin.*

**Derbas bibe** / Geç / Skip  
*Di kompîterê de ji bo derbasbûyîna gava piştê.*

**Derbasbûn** / Geçme / Pass  
*Karê derbasbûyîne.*

**Derbasdar** / Geçerli / Valid  
*Tiştê ku tê pejirandin. Tişt an jî rewşa ku erênî ye.*

**Derbasdarî** / Geçerlilik / Validation  
*Rewşa pejirandina tiştan.*

**Derdan** / Kap / Container  
*Ji bo tiştên şil an jî hişk tê de bîna hilanîn an jî bîna parastin.*

**Derdanên ezmûnî::Amanên ezmûnî::Amanêt** / Deney kapları / Experimental cups  
*Alavên ku di ezmûngehê de tên bikaranîn.*

**Derengketin::Derengmayîn** / Gecikme / Delay  
*Derengmayîna tiştêkî.*



**Derhoke::Dergoşe::Teberhoke** / Dış aç / Exterior angle  
*Ji bo du rastexêz û xêza çeprast ku van her du rastexêzan dibire re, her yek goşeyên ku ji derveye di navbera vê xêza çeprast û rastexêzê de dimîne. "Di sêgoşeyan de nirxa goşeyek derve yeksan e bi danheva her du goşeyê navîn ê din e."*

**Derî** / Kapı / Door  
*Ji bo têtetina avahiyekê yan jî beşeke avahiyê, valahiya ku di dîwar de tê hiştin.*

**Derîçe** / Küçük kapı / Wicket  
*Deriyê li gor ê standart biçûktir.*

**Deriyê û** / Ve geçidi / And gate  
*Di mantiqê de bi alîkariya "1" û "0" ferman têne çêkirin. Heke du daneyên pêş ne "1" bin di encamê de "0" dertê.*

**Deriyê zivorek** / Döner kapı / Revolving door  
*Deriyên ku bi sê baskin û li dora mîlekê dizivirin*

**Derizîn** / Çatlamak / Crack  
*Terk, derz lêketin*

**Derketin** / Çıkış / Sign out  
*Dema mirov bixwaze ji malper an jî sîstemên ku mirov bi navê bikarhêner û şîfre dikevê derkeve mirov fermanekê dide. Ev fermana derketina malper an jî sîstemê ye. Ji bo vêya mirov bi piranî bişkokekê ditikîne.*

**Dermale** / Besi:semiz hayvan / Fatling  
*Sewala ku ji goştê wan baş sûd were girtin, di hundir de tê xwedîkirin.*

**Derve** / Dış / Outside  
*Dijberî "hundir" e. Cihê ku dora wî vekirî ye.*

**Deroxûn::Serpoş** / Kapak / Cover  
*Dîz an jî ew tiştê ku devê qûşxaneyê digire.*

**Derxwarde** / Giriş / Input  
*Di kompîterê de ji bo derxistina encamekî yê ku tê bikaranîn.*

**Derya::behr** / Deniz / Sea  
*Ava gewre ya ku bejahiyê dorpêç dike.*

**Deryaya Aralê::behra aralê** / Aral denizi / Aral sea  
*Goleke gewre yan jî deryayekê di bejahiyê de asêmayî ku di navbera welatê Ozbekîstan û Kazakîstanê de ye.*

**Deryaya Egeyê::behra egeyê** / Ege denizi / Aegean sea

*Deryaya ku bejahiya rajavayê welatê Tirkiyeyê û bejahiya başûrê welatê Yewnanistanê dorpêç kiriye.*

**Deryaya Reş::behra reş** / Karadeniz / Black sea  
*Deryayekê navxweyî ku bejahiya bakûrê welatê Tirkiyeyê û bejahiya başûrê welatê Rûsyayê dorpêç kiriye.*

**Derz** / Çatlak / Crack  
*Qelîştaka biçûk. Derz di madeya hişk de çêdibe. Made berî ku bişikê diderize.*

**Derza nepenî** / Gizli çatlak / Blindjoint  
*Derza ku bi çav nayê dîtin.*

**Desberdan** / Feragat / Waiver  
*Dev jê berdana ji mafekî. Bi zanebûn teqîp nekirina, berdana mafekî.*

**Desîbel** / Desibel / Decibel  
*Ji dehan yekê yekeya diwariya deng.*

**Desîgram** / Desigram / Decigramme  
*Yekeya pivaneyê ku ji dehan yekê gramê ye.*

**Desîkator** / Desikatör / Dessicator  
*Derdan (Aman) a ziwakirinê.*

**Desîlître** / Desilitre / Decliliter  
*Ji dehan yekê litreyê ye.*

**Desîmetre** / Desimetre / Decimeter  
*Ji dehan yekê metreyê ye. 10 cm.*

**Destar** / El değirmeni / Hand mill  
*Aşê ku bi destan tê xebitandin. Du kevirên gilover li ser hev in û kevirê jor bi destan tê zivirandin. Bi vî awayî genim tê hêrandin. Genim, gilgil, nîsk û gelek tişt bi destarê tînan hêrandin.*

**Deste::Tîm** / Takım / Team  
*Bitûniya hemû alav û tîkberên ku di karekî de an jî li cihêkî bê bikaranîn.*

**Destî::Çembil** / Sap / Handle  
*Ji bo bikaranîna alavên wek bêr, mer û çakûç ji darê tê çêkirin.*

**Destkeft::Diravêt** / Gelir / Income  
*Di encama karekî de pareyên ji mirov re dimînin.*

**Destnişan::Şanena** / İmza / Signature  
*Di belgeyan de kesên ji nivîsê berpirsiyar e li binî bi pêûsê nişana xwe ya taybet çêdike. Nişana ku kesek dinivîse di hemû cî û deman de naguhere.*

**Destpêker / Starter / Starter**

*Fermana yekemînê ku ji bo karanîna maşinan pê tê dayîn.*

**Destserdanîn / Elkoyma:müsadere / Seizure**

*Zeftkirin û destserdanîna mulk. Ev zeftkirin ji aliyê dewletê ve tê kirin.*

**Destşo / Lavabo / Wash basin**

*Çehl an jî eşyayên kart ên mirov destên xwe û firaqan tê de dişo.*

**Destûr bide / İzin ver / Allow**

*Di kompîterê de ji bo ku bername kar bike ji bi-karhêner bi vê peyvê derstûr dixwaze.*

**Destûra Ajotinê::Ehliyetname / Ehliyetname / Driving license**

*Destûrmenîya (besbûna) belgeya ajotinê. Belgeya hînbûna ajotinê. "Bê lîsans ajotina seyareyê qedexe ye."*

**Destûra bikaranîna avahiyê / Yapı kullanma izni / Structure licence license to use**

*Piştî xelasbûna avahî û hemû karên teknîkî destûrdeyîna bikaranîna avahiyê.*

**Destûrname / Ruhsatname / Licence**

*Belgeya ji bo destpêkirina kar tê dayîn.*

**Destûrnameya avakirinê::Ruhsat / İnşaat ruhsatı / Building license**

*Belgeya ku sazî ji bo destpêkirina lêkirina avahiyên didin.*

**Destûrnameya nişînê / İskan ruhsatı / Housing license**

*Belgeya destûra ku ji bo runişînê tê dayîn. Belgeya ku qedandina çêkirina avahiyê nişan dide.*

**Deşt / Ova / Lowland**

*Li ser erdnîgariyê ew cihê ku rûyê rast.*

**Dever::Meyla kêlekî / Dever / Superlevation**

*Meyla rê a ku li her du kêlekên xeta navî.*

**Devgirka teqînê / Patlatma kapsülü / Blasting cap**

*Di karên teqandinê de ji bo girêdana dînamîtan tê bi karanîn.*

**Devik / Kapak / Cover**

*Ew tiştê ku devê tiştên mîna şûşe, kodik, quşxane... digire.*

**Dewar / Sığır / Cattle**

*Ajalên mezin ên bi qiloç û dikayên.*

**Dewrkirina (Qelibandin) parê / Pay devri / Transfer of shares**

*Di mulkiyeta pîrxwediyê de, firotin an jî dewrkirina parê.*

**Dexl / Hububat / Cereals**

*Genim, ceh, gilgil, birinc... tiştên ku di nava xwe de dihewîne.*

**Dibistan / Okul / School**

*Avahiya ku ji bo perwerdehiyê tê bikaranîn.*

**Dîdarî / Görünürlük / Visibility**

*Yê/a ku xuya dike.*

**Dîelektrîk / Dielektrik / Dielectric**

*Madeya ku elektrîkê radigihîne. Mînak; sifir, zêr, hesin, zîv...*

**Difuzyon / Difüzyon / Diffusion**

*Madeyên, dorhêla herî tîr ve derbasbûyîna dorhêla kêr tîrê ye.*

**Dij / Karşı / Opposite**

*Spî û reş, bêr (xêr) û guneh, germ û sar li dijî hev in. Peyva "dij" bi gelemperî ji bo du peyvên ku hev tune dikin tê bikaranîn.*

**Dijwar / Zor / Difficult**

*Ne hêsan. Zehmetî.*

**Dik / Sahne / Stage**

*Di salonên mezin de platformên ku ji erdê bilind tîr çêkirin, ji bo dema ku civîn an konferans, gotûbêj û hwd. çêdibin temaşevan û axaftvan hevdu bibînin.*

**Dikan::Firoşgeh / Dükkan / Shop**

*Cihê ku danustandina rojane lê tê kirin.*

**Dilbêr / Çınar ağacı / Platane:Platanus**

*Darekî qurmê wî gelek mezin dibe. Zu mezin dibe u temenê wî gelek dirije. Cîhên avîde dijî.*

**Dilop / Damla / Drops**

*Parçeyekî ji şilekiyekî ku giraniya xwe ranagire ji parçeyê mezin diqete û dikeve.*

**Dilopdank / Damlalık / Dropper**

*Amûra ku ji bo şilek dilop dilok biherike. Di laboratuwaran de tê bikaranîn.*

**Dims / Pekmez / Molasses**

*Bi kelandina şîreyê çêdibe.*

**Dînamîk / Dinamik / Dynamic**

*1. Rewşa bi tevger. 2. Di fizîkê de beşa ku têki-*

liya navbera hêza mekanîkî, tevger û enerjîyê vedikole.

**Dînemo** / Dinamo / Dynamo

Ji peyva "dynamic" ya Îngilîzî tê. Dînemo tiştêkî mîna motorê ye lê bi elektrîkê dixebite. Dema ku elektrîk diçe ji dînemoyê hêza elektromagnetîk çêdibe û bi alîkariya vê hêzê milê dînemoyê dizivire.

**Diranok (Diranoka çerxê) :Danik** / Çark dişî / Gear tooth (mechanical gear)  
Niqir an jî diranên li dora çerxê.

**Dirb** / Tema / Theme  
Rû an jî şablona bernameyê.

**Dirdirkî::Kirtkirkî** / Tirtillanmîş / Knurled  
Şêweyê li ser zêzikên ku bi çerixandinê hatine çêkirin.

**Dirêj** / Uzun / Long  
Dûrbûna navbera her du seriyên alavekî.

**Dirêjahiya berdanê** / Çekme mesafesi / Setback distance  
Mesafeya ku ji binyata avahiyê heta sînorê parselê. Li gor pîlana îmarê û mevzûata îmarê, ev mesafe diyare. Ev mesafe lazime vala bimîne.

**Dirêjahiya xwar::Dirêjahiya lar** / Eğik mesafe / Angular distance  
Dirêjahiya ne asoyî, ne berwar, ber bi jor an jî ber bi jêr e. Navbera du xalên ku di navbera wan de ferqa bilindahiyê heye.

**Dirêjek** / Uzatma / Extension  
Parçeyek dirêjahî.

**Dirêjîya Pêlê::Dirêjî şepol** / Dalgaboyu / Wavelength  
Di pêla ku firekansa wê tê zanîn de dirêjahiya navbera dubarebûna pêlan. Dijberî frekansê ye, dema frekans zêde dibe dirêjahiya pêlê kêm dibe.

**Dîreka elektrîkê** / Elektrik direği / Electricity pole  
Hişkedarê (dibe ku ji beton an jî hesin jî be) ku têlên karebayê li ser derbas dibin.

**Dîrok** / Tarih / History  
Dema çêkirin, guhertin, nûjenkirina dosya, bername yan jî sîstemê.

**Dîsketgêr** / Disket sürücü: disket okuyucu / Floppy disk drive  
Parçeyê kompîterê ku dîsket dikêvê û dîsket dixwîne.

**Dîtane::Hîpotez** / Varsayım / Hypothesis  
Ramanekî di derbarê mijarekî de.

**Dîwar::Dês::Hêt** / Duvar / Wall  
Derdora avahiyê ji derve û di hundirê avahiyê de jî beşa hundir ji hev vediqetîne. Ji acur, kevir û betonê bi awayekî tîkane tê çêkirin.

**Diyagrama Fazê** / Faz diyagramı / Phase diagram  
Di grafîka pest û germahiyê de guherîna made ku di dema rewşa xwe diguhere nîşan dide. Ew guherînên ku di dema cemed dibe av de çêdibin.

**Dol::Gelfî** / Vadi / Valley  
Derbasek an jî qada di navbera du çiyayan de ku di wextê xwe de bi herikîna çemekî yan jî rûbarêkî pêk hatiye.

**Dolgirtin::Bergirtin** / Döleme / Insemination  
Nivşekî zayînê ye.

**Domdar** / Sürekli / Continuous  
Guherîna bê navber.

**Donê belotê::Rûnê berûyê** / Palamut yağı / Oleum fagi:Frictibus  
Donê ku ji tovê belotê derdikeve.

**Donim::Berecot** / Dönüm (1000 m<sup>2</sup>) / Land measure of 1000 square meters  
Pîvana qadê ya beranberî 1000 metre çarçik e.

**Dor bi dor::Rêzbandî::Bi dorê** / Sırayla / Sequential  
Rêz bi rêz.

**Dor::Rêz** / Sıra / Order  
Tiştên li dû hev in.

**Dore::Ne gengaz/Olanaksız::imkansız/Impossible**  
Ne mumkun.

**Dorpêç** / Sarma:kuşatma / Wrapping  
Pêçandina derdora alavekê.

**Dosyaya mebestê** / Hedef dosya / Target file  
Cihê ku lê tê kopî kirin an jî agahî tê şandin.

**Dosyeya veşartî::Fayila veşartî** / Gizli dosya / Hidden file  
Di kompîterê de daneya ku hatiye veşartin.

**Drenaj** / Drenaj / Drainage  
Bi dîrxistina avê ji cihekî. Bi pîranî ji bo dîrxistina ava piştî avdaniyê tê bikaranîn.

**Dîrûnxane** / Dikim evi / Planting house  
Avahî an jî cihê ku lê karê dirûnê tê kirin

**Du** / İki / Two  
*Hejmara piştî yekê.*

**Dû::Dûkel** / Duman / Fume  
*Dema şewatek çêdibe ji nava agir gazeke ku xuya dike, derdikeve.*

**Dû::Dûkel** / Duman / Smoke  
*Dî şewitandina ardûyan de, di dema şewatê de dertê.*

**Dubare** / Tekrar / Repeat  
*Ducar kirin.*

**Dubare bike** / Tekrar yap / Redo  
*Fermana ku carek din jî heman kar pê tê kirin.*

**Dûbleks::Du ta** / Dupleks::iki katlı ev / Dupleks apartment  
*Xaniyê de ta. Avahiya du ta û ku ji yek xaniyek pêk tê.*

**Dûderê parselê** / Parsel cephesi / Front parcel  
*Bergehê parselê yê ji aliyê rê ve. Heke du aliyê rê hebin, aliyê riya fireh an jî mezin.*

**Dûkel** / Buhar / Vapour  
*Gaza ku ji avê çêdibe.*

**Dûkêş::Dûkelkêş** / Duman bacası / Chimney smoke  
*Kuleka ji bo kêşana dûyî.*

**Dûkêş::Kulek** / Baca / Chimney  
*Riya ku dû ji hundir dide derve.*

**Dûkirî::Seyandî** / Kaplanmış::Sivanmış / Coated  
*Rûyê ku bi madeyek cuda, wek boyaxê hatiye dûtin.*

**Dûr** / Uzak / Distant::Remote  
*Ciyê ku ne nêz e.*

**Dûrahî** / Uzaklık::Mesafe / Distance  
*Dirêjahiya ji cihekî heta cihekî din. Navbera du tiştan.*

**Dûrahiya avêtinê::Heter::Mesafe** / Fırlatma mesafesi / Length of throw  
*Navbera ji cihê avêtinê heta cihê ketinê ya parçeyekî ku bi hêzekê tê avêtin.*

**Dûrahiya zenît** / Başucu uzaklığı / Zenith distance  
*Dûrahiya goşeyî ya ji zenîti û navbera xaleke li fezayê.*

**Dûrakî** / Iraksak / Divergent  
*Awayê neynik û mercêkên ku heyberan dûrtir nîşan dîdîn.*

**Dûrebîn::Dûrbîn** / Dürbün / Periscope  
*Amûra ku tiştan nêz dide xuyakirin. Dema mirov dûrebîna dide ber çavên xwe ciyê dûr nêz xuya dîkin.*

**Dureh::Dureg** / Melez / Hybrid  
*Çêbûna ji rêgezên cuda yê gihandar.*

**Duta::Duqat** / İki katlı (evler için) / Dupleks  
*Avahiya ku du tebeqe ye.*

**Dûtin** / Sivamak / Roll up  
*Seyandina rûxarê dîwar. Bi taybetî bi cils, herî an jî xerca çimentoyê tê çêkirin.*

**Duyem::duyemîn** / Sekonder::İkinci / Secondary  
*Hejmara ku piştî yekê tê.*



**Ebir** / Dara / Tare

*Graniya derdana (aman) ku dagirtî tê pîvan.*

**Ekosîstem::Pergala xwezayî::Pergala jîngehî** /  
Ekosistem / Ecosystem

*Pergala li nav xwezayê.*

**Elektrîk::Kareba** / Elektrik / Electricity:Electrical  
*Elektrîk bi herikandina elektronan li ser metalan çêdibe. Elektron ji ciyê ku zêde ne ber bi ciyê ku kêman in ve diçin.*

**Elektrod** / Elektrot / Electrode

*Mekanîzmaya navbera herî kêman du periyodan de pîvana ferqa vêjena potansiyel.*

**Elektrokîmya** / Elektrokimya / Electrochemistry  
*Beşa kîmyayê ku reaksiyonên di navbera gihênerêk elektronîk û gihênerêk iyonîk de vedikole.*

**Elektrolîz** / Elektroliz / Electrolysis

*Bi alîkariya tezûya elektrîkê jihev qetandina pêk-hateyên kîmyewî yên ku di nava şilekek de ti-wawe ye.*

**Elektron** / Elektron / Electron

*Hêmanek ji yên atomê ye û li dora dendikê (nukleus) atomê bi lezgîniyê dizivire. Elektrîk bi herikîna elektronê ya li ser metalan çêdibe.*

**Elektrona compton** / Compton elektronu / Compton electron

*Dema elektromagnetîzma bandorê li madeyê dike elektron dijfire, navê wê elektronê compton e.*

**Elektronegativîte** / Elektronegativite / Electronegativity

*Xwestina elementên ku elektronan dixwazin.*

**Elektronên cotbûyî** / Eşleşmiş elektronlar / Paired electron  
*Çotek elektron.*

**Elîpsoyd** / Elipsoid / Ellipsoid

*Şêweyê gilover lê dişibe hêkê.*

**Embar::Depo** / Ambar:Depo / Warehouse

*Cihê dorgirtî yê ku alav û tişt tê de tîn bicihkirin. Cihê ku ji bo alav tê de werin danîn û parastin hatiye çêkirin.*

**Emlak::Maldarî** / Emlak / Property

*Navê giştî yê mal û milk.*

**Enasona kevir** / Taş anasonu / Pimpinella saxifraga  
*Cûreyek ji anasonê ye kullîlkên wê spî ne ji kokên wê û tovên wê sûd tê girtin. Giyayekî pîrsal e.*

**Encam** / Sonuç / Result

*Tişt an jî rewşa dawiyê.*

**Encame::Rizde::Nêrûmê::Menteşe**/Menteşe/Knuckle

*Amûrek metal e, derî (an jî şîbak) bi çadira derî ve girê dide. Di vekirin û girtina derî de Rizde dilive. Parçeyek jê bi çadira derî ve ye parçeyê din jî bi derî ve ye.*

**Endamê/a kadastryê** / Kadastro üyesi / A member of the cadastral

*Endamê komîsyona qedestroyê. Komîsyon, xebatên kadastryê de daxwaza dinixine û digihine encamekê.*

**Endezyarê** /a Kîmyayê / Kimya mühendisi

*Chemical engineer / Kesê/a ku perwerdehiya Endezyariya Kîmyayê girtiye.*

**Endezyarê çandiniyê** / Ziraat mühendisi / Agricultural engineer

*Mirovên li ser endezyariya çandiniyê dixebite.*

Endezyarî / Mühendislik / Engineering  
*Karê ku endezyar dikin.*

**Endezyariya avahiyê** / İnşaat mühendisliği / Civil engineering

*Beşa endezyariyê ya ku karê hilberîn û bikaranîna alav û amûrên avadaniyê jî tê de her cure karê avahî avahîkarî û avadaniyê bi rê ve dibe.*

**Endezyariya Jîngehê** / Çevre mühendisliği / Engineering of environment

*Beşa endezyariyê ya ku ji bo bikaranîna çavkaniyên xwezayî û mercên baş ji bo tenduristiya mirovan amade dike ye.*

**Endezyariya Xorakê** / Gıda mühendisliği / Food engineering

*Beşa endezyariyê ya ku bi tevahî li ser xwarin û vexwerinê bi awayekî zanistî dixebite. Xwarinên amade ku li marketan tîn firotin ji bo ku zîrarê nedin mirovan ji destpêka çêkirinê heta pêçan û firotina wan di bin şopandina endezyarên xurakê de dimînin.*

**Enerjiya aktîvasiyonê** / Aktivasyon enerjisi / Activation energy

*Wîzeyê derbasbûyî nê ye, ji bo çêbûna reaksiyonên kîmyeyî ye*

**Enerjiya girêkê: Wîzeyê girêkê** / Bağ enerjisi / Bond energy

*Enerjiya ku ji bo qetandin girêkên kîmyewî pêwîst e.*

**Enerjiya Kînetîk** / Kinetik enerji / Kinetic energy  
*Enerji (Wîze) ya ku ji ber tevgerê çêbûye.*

**Enerjiya rojê: Wîzeyê rojê** / Güneş enerjisi / Solar energy

*Enerjiya ku ji rojê tê. Bikaranîna tîrêjên rojê ku ji bo germkirina avê an jî çêkirina elektrîkê sêde-war e.*

**Enerjiya xwenûker** / Yenilenebilir enerji / Renewable energy

*Cureya enerjiyê ku zewalê nadin jîngehê. Mînak: Roj, Ba, Pêlên deryayê.*

**Enesûn** / Anason bitkisi / Pimpinella anisum L.

*Ji malbata bexdenûsê ye. Giyayek yeksal e. Kulîk ji yek şaxul derdikeve û wek sîwanokê kulîk ê wê heye. Giyayek di tenduristiya mirov de tê bikaranîn.*

**Eniya dawî** / Arka cephe / Back side

*Eniya avahiyê ya ku li gor rê li paş dimîne.*

**Enstîtu** / Enstitü / Institute

*Saziyekê ku yan gîredayî zanîngehê yan jî serbixwe ye û bi gelemperî li ser tiştan lekolîn dike û carinan jî di nav xwe de perwerdehiyê dide.*

**Enstrûman** / Enstrüman / Instrument

*Amurek muzîkêye*

**Entalpî** / Entalpi / Enthalpy

*Di nava maddeyekê de komînkaya vêjenên her rengî (her babetî) ye.*

**Entropî** / Entropi / Entropy

*Kirariyên germavê de cihê hêl nîşandanê digire û pîvana bînîzamiyê ye.*

**Erd::Zevî::Qad::Arazî** / Arazi / Field

*Parçeyek ji ruyê cîhanê.*

**Erdê bejî: Zeviya dêm** / Kurak arazi / Arid land

*Erdê ku ne avî ye û derfetên avdaniyê lê tune ne.*

**Erdê beyar** / Kırak arazi / Barren land

*Erdê ne li gor çandiniyê. Erdê bê berhem, tenê ji bo çêrî nê sûd jê tê girtin.*

**Erdê çandiniyê** / Tarım arazisi / Agricultural land

*Cihe ku ji bilî çandiniyê tu tişt li ser wî nayê kirin.*

**Erdê şaxan: Erdê terhikan** / Fidanlık / Nursery

*Ciyê ku çandiniya terhikan li ser tê kirin.*

**Erdkêşî: Kêşkirin: Kêşan: Hêza kêşkirinê** / Yer çekimi / Gravity: Force of gravity

*Bi bandora baristeyê hêza ku madeyan li ser cîhanê dihêle. Hêza ku dibe sedema ketina ji jor ber bi jêr ve. Mînak: Ji bo cîhanê,  $g=9,81 \text{ m/s}^2$*

**Erdkirin** / Topraklama / Grounding

*Barê elektrîkî yê zêde diherikîne erdê. Li hember kurtevedorê ji bo barê elektrîkî yê ku li ser şaxsaya alavên elektrîkî heye zerarê nede mirovan dirêje erdê.*

**Erdnasiya binyadî** / Yapısal jeoloji / Structural geology

*Lê nêrîna deformasyonê kû di encama tevgerê kakila zemînê de pêk tê.*

**Erdnîgarî** / Coğrafî / Geographic

*Mîjarên ku li ser zanîna erdnîgarî tîn zanîn û lê-kolîn kirin.*

**Erêdanîna demî** / Geçici kabul / Substantial completion

*Belgeya ku ji aliyê saziya berpirsyar ve di dawîya kar de ji lixwegir re tê dayîn.*

**Erêkirin** / Onaylamak / Prove

*Rêyidana dirûstiya tiştêkî an tevgerêkî ye. Ev kar ji aliê kesêkî an lijneyêkî tê kirin.*

**Erênî** / Pozitif:Olumlu / Positive

*Dijberî "neyînî"yê. Rewşa baş.*

**Erozyona axê::Mehîna axê** / Toprak erozyonu / Soil erosion

*Di encama ji holê hîlanîna dar û ber û nebatê çandîniî têkçûna qateka axê a bi ber*

**Erse::Pag** / Arsa / Plot

*Parsêla kadastryê ya ku li gor plana îmarê hatîye parselasyon kirin. Parsêla ji bo çêkirina avahîyan amade.*

**Erx::Çih::Çihok** /Kanal:Su kanalı /Canal:Water way

*Li ruyê erdê xeta ku bi kolandinê tê çêkirin û av tê de diherike.*

**Esman** / Gökyüzü / Sky

*Jora erdê. Li ruyê erdê dema mirov serê xwe bilind dike û li jorê dinêre ewr an jî valahiyeke şîn xuya dike. ew esman e.*

**Ester** / Ester / Ester

*Bendekê (girêkekê) organîk e. Maddeyên ku ji têkiliya alkol û asîdên bî oqşîjen ve malkulekî avê jê qetiyabe.*

**Estetîk::Çiwankarî** / Estetik / Aesthetic

*Dîmena ku bi xweşikiya (bedewî) xwe bi mirov re hestên baş çêdike.*

**Eşêf::Aşêf** / Bahçe bağ bostandan yapani ot toplama / Remove finger-grass

*Paqijkirina nav terhikan. Giya û tiştên nav çandîniyê yên zêdebar.*

**Eşkêl::Tîre** / Çap / Diameter

*Nirxa rastexêza ku di navenda bazîne (xelek) de derbas dibe û serê wî li ser dora tiqalîk dimîne. Nîşana wê "R" an jî "2r"*

**Eşkêla Kadastryê** / Kadastro çapı / Diameter of the cadastral

*Belgeya ku li gor plana qedestroyê tê dayîn. Sînor û cîranên parselê nîşan dide.*

**Eter** / Eter / Ether

*Şilaviyên ku bi têkiliya alkol û asîdên bî oqşîjen pêkhatine.*

**Êvar** / Akşam / Evening

*Danekî rojê ye. Dema roj diçe ava û her der dibe tarî êvar e.*

**Ewlehî::Ewlekarî** / Güvenlik / Safety

*Parastina tiştêkî.*

**Ewr** / Bulut / Cloud

*Ew dûkelên ku li asîman dişekînin û dibin baran û berf.*

**Ewrbir::Hewrbir** / Gökdelen / Skyscraper

*Avahiyên 20-30 tebeqe (qat) û bilindtir.*

**Exlamûr** / İhlamur / Linden

*Kulîlka bi bîna dara exlamûrê ye. Çaya wê jî heye û bi mebesta derman tê vexwarin.*

**Eyar** / Ayar / Adjustment

*Guhertin û sererastkirina taybetiya amûr an jî makîneyan.*

**Eyar** / Kalibre / Caliber

*Guhertin û sererastkirina taybetiya amûr an jî makîneyan.*

**Eyarkirin** / Ayarlama / Calibration

*Karê eyarê.*

**Eywan** / Eyvan / Iwan

*Beşeke xanî ye. Odeya navendî ku deriyê gelek odeyan lê dinêrin.*

**Êzing** / Odun / Timber:Wood

*Amûrê ku bi birîna daran bi dest dikeve û ji bo şewatê tê bikaranîn.*

**Êzingdank** / Odunluk / Woodshed

*Ciyê ku êzing lê tên danîn.*

**Ezmûn::Taqîkirdin** / Sınav / Exam

*Pîştî perwerdehiyê ji bo asta fêrbûnê bê famkirin tê bikaranîn.*

**Ezmûngeh::Taqîgeh::Laboratûar** / Laboratuvar / Laboratory

*Ciyê ku agahiyên teorîk tîn ceribandin.*

**Ezmûnî** / Denek / Experimental

*Ew heyber, kes an jî ajalên ku ji bo agahîgirtinê li ser lêkolînê tê kirin.*

**Faks** / Faks / Fax

*Amûreke ku li ser sîstema telefonê dixebite.  
Şûna deng li ser qaxiz nivîs an jî wêneyan dişîne.*

**Faq::Feq::Dafik** / Kapan:tuzak (hayvanlar için) / Snare

*Kemînen ku bo ajalan tên danîn.*

**Faraday** / Faraday / Faraday

*Yek faraday 96485, 3365 coulombs.*

**Faûna** / Fauna / Fauna

*Di jîngehekê de koma ajalan. Ji koma ajalan re faûna tê gotin. Koma ji her cureyên ajalan pêkhatî.*

**Fayans** / Fayans / Faience

*Tetikên ku ji axa gêl têne çêkirin û pijandin, rûyekî wan vernîkkirî û nexşandî ye.*

**Faz** / Faz / Phase

*1. Gihînerên ku elektrîkê radigihînin. 2. Rewşa pêlekî li gora firekansê.*

**Faz::Fêz::Rewge** / Faz / Phase

*Rewşa fizîkî ya madeyê. Rewşa pêlê li gora çavkaniyê. (referans)*

**Fêrbûna dîtbarî** / Görsel öğrenim / Visual (optical) learning

*Cureyekî perwerdehiyê ye. Mirov bi dîtîne fam dikin.*

**Ferfûr** / Porselen:seramik / Porcelain

*Hîşkiyeke biriqok ji axa bikîl bi saya germbûneke pîleberz tê duristkirin.*

**Fêrgeh::Pol** / Sınıf / Class::classroom

*Ciyê ku xwendekar lê perwerdehiyê dibînin.*

**Feheng** / Sözlük / Dictionary

*Pirtûk an jî bernameya ku wateya peyvên a di zimanên din an jî heman zimanî de nîşan dide.*

**Fehenga kompîturê** / Bilgisayar sözlüğü / Computer word

*Pirtûka ku wateya peyvên kompîturê vedibêje.*

**Fêrist** / Fihrist / Index

*Di dosye an jî raporekê de lîsteya naverokê. Di vê lîsteyê de mijar û hêjmara rûpelan he ne.*

**Ferman** / Komut / Command

*1. Ew peyva ku daxwaz dike lê divê bê cî. 2. Di kompîtur an jî di makîneyan de daxwazên tund ji bo kirina karekî.*

**Fermî** / Resmi / Official

*Karên dewletê. Kar û xebatên ji aliye karmendên dewletê ve tînin kirin.*

**Ferqa bilindahiyê** / Kot farki / Level difference

*Ferqa bilindahiya di navbera du xalan de (cihan de).*

**Fetlanek** / Viraj / Road bend

*Di çêkirina rê da ji ber astengên erdnîgariyê ku berî rê li çep ya jî li rast tê zivirandin*

**Fînanmana xaniyan** / Konut finansmanı / Housing finance

*Ji bo kirîna xanî yan jî avahiyê peyda kirina pere ye.*



**Firaqxane** / Bulaşıkxane / Scullery  
*Beşa ku firaq tê de tîn şuştin.*

**Fireh** / Geniş / Large  
*Ya ku qada wê zêde ye.*

**Firehhoqe::Firehgoşe::Goşeya vekirî::Goşeyî ki-rawe** / Geniş aç / Obtuse angle  
*Goşeya nirxa wê 90 pileyî mezintir.*

**Firehkirin** / Genişletmek / Enlarge:widen  
*Qada ku tê mezinkirin.*

**Firêz** / Ayrik otu / Couch grass  
*Giyayekî ji malbata genim.*

**Firêze::Pirêze** / Anız / Stubble  
*Bermayiya giyayî.*

**Firin** / Fırın / Furnace  
*Têkbera ku germahiya tiştan zêde dike.*

**Firingî::Bacana sor::Bacansorik** / Domates / Tomato  
*Sewzeyek (zerzewat) rengê wê sor, tehma wê kêmtirş e. riwekeke salane ye.*

**Firk** / Seyrek / Sparse  
*Tiştên ku bêpergal û di nav hev de ne.*

**Firk** / Seyrek / Rare  
*Dijberî "gur"ê ye. Dema di daristanê de dar kêmbûbin, dar ji hev dûr bin an jî porê mirov weşiyabe û valahî ketibe nava mûyên serî ev rewş bi peyva "firk" tê tarîfkirin. Mînak, porê min firk e. Daristana Amedê firk e.*

**Firma::Şirket::Karciv** / Firma / Firm  
*Sazî û dezgeya hevbeş di bazirganiyê de.*

**Firne::Kûre** / Fırın / Oven  
*Cihêkî dora wê girtî û gelek germ e. Tişt (xwarin, herf...) bi alîkariya germê tê de dipijin.*

**Fîsyon** / Fisyon / Fission  
*Dabeşkirina atoman e. Dema fîsyon çêdibe enerjîyeke mezin dertê holê.*

**Fîsyona Nukleerî** /Nükleer fisyon /Nuclear fission  
*Reaksiyona ku nava dendika atomê de çêdibe, atom parçe dibe û di encamê de enerjîyeke mezin dertê.*

**Fîtês** / Vites / Gear  
*Lez û berberiyê sererast dike.*

**Fiyoz::Sigorta** / Sigorta / Fuze

*Amûra ku ji bo parastinê tê bikaranîn. Ji astekî zêdetir tezu (herk) yê derbas nake û dişewite.*

**Fîz::kîrîş** / Arşitrav / Architrave  
*Di avahîsaziya Yewnanî û Romanî de kêranê ku tê ser stûnan û barê ku tê ser xwe belav dike stûnan.*

**Fizîbîlîte** / Fizibilite / Feasibility  
*Xebatên berî çêkirinê ku tîn kirin. Pêşxebat*

**Fizîka kuwantûmê** / Kuantum fiziği / Physics of quantum  
*Zanista fizîkê ya herî modern ku bingeha xwe li ser parçekirina atomê avakiriyê.*

**Flora** / Flora / Flora  
*Di jîngehekê de koma nebatan. Ji koma nebatan (riwek) re flora tê gotin. Koma ji her cureyên nebatan pêkhatî.*

**Fonksiyon::Kargîn** / Fonksiyon / Function  
*Peywir an jî taybetiya hevkeşe an jî amûran e.*

**Fonon** / Fonon / Phonon  
*Encama lerza hevpar a atomên ku di krîstalekî de ne.*

**Fonta sabît** / Sabit font / Fixed font  
*Cûreya nivîsê di kompîterê de.*

**Forklift** / Forklift / Forklifter  
*Maşîna ku tiştên giran bar dike.*

**Formasyon** / Formasyon / Formation  
*Gava ku mineral li navbera xwe kom dibin, awayekî geometrîk çê dikin û ligorê wi mezin dibin. Wî awayê ra teşadarbûnî tê gotin.*

**Formul** / Formül / Formula  
*Nîşandana agahî an jî danasîne bi sembolan e. Formul bi kurtasî gelek tiştan didin famkirin.*

**Foseptîk::Sexur** / Foseptik / Cesspool  
*Bîra ku ava aravê û bermahiyên wê têde têne komkirin.*

**Fosforbûn** / Fosfor gibi ışılda / Phosphorescence  
*Ronahîdayîna wek fosforê ku di tariyê de şewq dide.*

**Fosîl** / Fosil / Fossil  
*Bermahî û rêça zindewariyên ku demeke dirêj di bin erdê de mane. Hestiyên ajalan ên ku di bin erdê de krîstalîze bûne.*

**Fotogrametrî** / Fotogrametri / Photogrammetry

*Rêbazek ya çêkirina nexşeyan. Bi fotografên ji balafirê hatiye kişandin çêkirina nexşeyan.*

**Fotogrametriya bejahî** / Yersel fotogrametri / Terrestrial photogrammetry  
*Rêbazek ya çêkirina nexşeyên fotogrametrîk. Çêkirina nexşeyan ya bi fotografên ku li erdê ji cihê bilind hatiye kişandin.*

**Foton** / Foton::ışınak / Photon  
*Yekeya esas a ronahiyê ye. Qalibê tîrêjên elektro-magnetîkê ye.*

**Fotoplan** / Fotoplan / Photoplan  
*Di nexşegeriyê de planên ku ji fotografan hatine çêkirin.*

**Frekansa kanalê** / Kanal frekansı / Channel frequency  
*Frekansa ku weşana kanalek li ser tê kirin.*

**Fresk::Wêneyên ser dîwar** / Fresk / Fresco  
*Wêneyên ku li ser dîwarên avahiyên boyaxên lajwerdî tîrêjên.*

**Frîz** / Friz / Frieze  
*Di avahîsaziya Yewnanî û Romanî de beşa avahiyên a bi nexş û niqirandî ku di nav kêrên û banê de dimîne.*

**Fûar** / Fuar / Fair  
*Qadên ku ji bo firoştin, danasîn û nîşandana berheman tê bikaranîn.*

**Fûr** / Taşkın::taşma / Overflow  
*Minak: "Ilehîya avê her derî xerakir."*

**Fuzyona Navok (Dendik) î::Fuzyona Nukleerî** / Nükleer füzyon / Nuclear fusion  
*Ji bo çêbûna atomên mezin bi hev ve kelijandina du an zêdetir atomên biçûk.*

# { G }

**Ga** / Öküz / Ox

*Ajaleke ku ji bo goştê wî û karê cot de were bikaranîn tê xwedîkirin. Herî kêr du salî ye.*

**Galon** / Gallon (ingiliz birimlerinde oylum) / Gallon  
*Pîvana qebareyê ya îngilîzî. 1 Galon= 4, 54609 lître*

**Galvanî** / Galvanik / Galvanic  
*Rêbaza ku bi awayekî kîmyayî elektrîkê peyde dike.*

**Galvanîzkirin** / Galvanizlemek / Galvanize  
*Noqandina metalan di ava galvanîzê de ji bo metal nerize.*

**Galvanopîv** / Miniakim ölçer::Galvanometre / Galvanometer  
*Amûra ku bi prensîba elektromagnetîka bi guherîna tezûyê çêdibe dixebite. Tezûyê dipîve.*

**Gamêş** / Camîş: manda / Buffalo  
*Cureyekî dewaran.*

**Garis::Xaşik** / Dan / Millet  
*Giyayekî ji cureyê malbata genim e. Di erda bejî de ji genim û gilgil bi saxtir e.*

**Garis::xaşik** / Hint dansı / Panicum: Persicum  
*Giyayek ji malbata genim e.*

**Gauss::Gaûs::Gawis** / Gauss / Gauss  
*Yekey çirîya flaksa (herk) Mugnatîsî*

**Gav bi gav** / Adım adım / Step by step  
*Ew xebata ku li gora rêzekê li pey hev tê meşandin. Pêşiyê gawe, piştê gaweke din, gavên li dû hev.*

**Gaz** / Gaz / Gas  
*Rewşa madeyê ya ku molekul ji hev gelek dûr in.*

**Gaz** / Kerpeten / Pincers  
*Alava ku têlikan jê dike û hesinan bi hevdu ve bi têlikan girêdide.*

**Gaz::Bizmarkêş** / Kerpeten / Pliers::Pincers  
*Pê bizmar tên kişandin.*

**Gaza agirgir** / Yanıcı gaz / Combustible gas  
*Di rewşa asayî de gaza ku bi oksîjenê re bixwe bixwe dikeve reaksiyona kîmyayî.*

**Gaza Îdeal** / İdeal gaz / Ideal gas  
*Tu gaz îdeal (mengî) nîn in, ev pênas ji bo hevkeşên bingehî û formulên matematîkî hatiye çêkirin. Çêkirina gazê bi gazek pestoya jinirxketî û germahiya bilind e.*

**Gaza îner** / İner gaz / Inert gas  
*Heke gazek di nava mercên normal (pendî) de jî reaksiyonê nede ev gaz dibe gazek bêbandor*

**Gaza kanê** / Ocak gazı / Firedamp  
*Gaza ku ji nav madenê dertê.*

**Gaza komirê** / Kömür gazı / Coal gas  
*Cureyek xaza sirûştîye kû di qatekê rêjîyê de tê peyde kirin*

**Gaza Rastîn** / Gerçek gaz / Real gas  
*Di germahiyekê nixketî û/an jî pestoyek bilind de hêza kêşandina di navbera gazan û qebare de bêxemsarî be ev gaz ji gaza mengî ve daherize û dibe gaza rastî*

**Gaza resen** / Soy gaz / Noble gas  
*Komekê pîvanka periyodê ye, di vê komê de hemû element ji aliyê kîmyayê gellek çûyine hevûdu ve û elementên vê komê bêbêhn û bêreng in, bi yek atom in.*

**Gaza siruştî** / Doğal gaz / Natural gas  
*Cureyek ji sutureniya bin erdî ye kû di druvê xazê de ye û zêdetir ji xaza CH<sub>4</sub> (%70-90) ê pêk tê.*

**Gazandikirin** / Gazlaştîrmaq / Gasify  
*Ji bo ku bi hêsanî were bikaranîn guhertina rewşa madeyan, guherîna halê gazê.*

**Gêjen** / Devre / Circuit  
*Di amûrên elektronîkî de rîya ku tezûya elektrîkê tê de derbas dibe.*

**Gêjena girtî** / Kapalı döngü / Closed loop  
*Di gêjena elektrîkê de cihê ku danheviya hemû tezûyê sifir e.*

**Gêle::Gêre** / Harman / Blend  
*Karê jihevqetandina tov û kaya genim, nîsk an jî noka.*

**Gêlex** / Kurt soğanî / Ornithogalum oligophyllum  
*Giyayeke bi kulîk û rega wê jî wek pîvazê ye.*

**Gelvandî** / Galvanize / Galvanized  
*Ji bo ku madenekî metalîk ji zingarê bê parastin bi çînkoyê dervayê wî bê girtin.*

**Gen** / Gen / Gen  
*Yekîneyeke biyolojîk ku karakterîstîkeke diyar hildigire û ji dê û bavan ev karakterîstîk derbasî çêlikan dibe.*

**Genim** / Buğday / Wheat  
*Giyayekî ku ji tovê wî nan tê çêkirin.*

**Geodezî** / Geodezi / Geodesy  
*Zanistî pîvankirina erdê.*

**Geoid** / Jeoid / Geoid  
*Teşeyê gerdûnê ye. Ne tam glover e, teşeyekî xweser e.*

**Geomatîk** / Geomatik / Geomatics  
*Erd pîvan. Li welatên Firansîzî dipeyivin û li hinek zanîngehên Tirkiyê navê beşa endezyariya nexşeriyê.*

**Geometrî::Endaze::Endeze** / Geometri / Geometry  
*Beşek ji matematîkê (bîrkarî) ye. Li ser feza û şêweyên di fezayê de tîn çêkirin disekine.*

**Gerdûn** / Evren / Universe  
*Valahiya herî mezin a ku hemû tişt (stêrk, roj, cîhan...) tê de ne.*

**Gerdûnî** / Evrensel / Universal  
*Tiştê ku ji bo hemû cîhanê an jî ji bo gelek çand, ol, bawerî û mirovan derbasdar e.*

**Gerdûnî** / Evrensel / Universal  
*Koma ku hemû kom tê de cih digirin. Koma mezintirîn.*

**Gêrekirin::Gêlekirin** / Harmanlama / Blend  
*Li ser benderê hûrkirin û ji hev veqetandina kanzayê.*

**Gêrkirin** / Yuvarlama / Rounding  
*Zivirandin. Xala navîn cî naguherîne lê ew tişt li dora xwe dizivire wek tekerlekê.*

**Germ** / Sıcak / Hot  
*Dijbera "sar"ê ye. Dema made tînê digirin germ dibin.*

**Germ kirin** / Isıtmak / Heat (to)  
*Zêdekirina germahiya tiştêkî.*

**Germahî** / Sıcaklık / Temperature  
*Enerjiya kînetîk a molekulî ya sîstemekî.*

**Germahiya ava deryayê** / Deniz suyu sıcaklığı / Sea water temperature  
*Pîleya germahiya ava deryayê.*

**Germahiya helînê** / Erime sıcaklığı / Melting temperature  
*Xala germahiyê ku madeyê req tê de dihele.*

**Germahiya kurî::Germahiya curie** / Curie sıcaklığı / Curie temperature  
*Xala germahiya ku madeyên feromagnetîk tê de bibin paramagnetîk.*

**Germik** / Sıcak kaynak / Hot thermal  
*Cihê ku ji kurahiya binê erdê jê ava germ derdikeve.*

**Germkirina navendî** / Merkezi ısıtma / Central heating  
*Sîstema germkirina avahiyana ku ji cihekî.*

**Geroh::Gulhan** / Çaçla / Almond  
*Behîvên negihaştî.*

**Gerok**/Internet tarayıcı/Browser:Internet explorer  
*Bernameya ku em navnîşana malperê lê dinivîsin û dikevin malperê.*

**Gewher** / Cevher / Ore;Jewel  
*Di kanzayê de madeyê ku lê tê gerîn, ku hêja û bi nîrx e. "Di kanzaya zêr de gewher zêr e" "Di kanzaya hesin de gewher hesin e"*

**Gewr** / Gri / Grey  
*Rengek bi rêjeyên cuda ji tevlihevkirina rengên spî û reş pêk tê.*

**Gêzer::Gizêr** / Havuç / Carrots  
*Riwekeke ku kokên wê tên xwarin.*

**Gezgezok** / Isırgan otu / Nettle  
*Giyayek.*

**Gezik** / Süpürge otu / Kochia  
*Giyayek.*

**Gihanî** / Ulaşım / Convection  
*Karê gihîştina cihan.*

**Gihîner** / İletken / Conductor  
*Madeyê ku elektrîkê radigihîne. Mînak: Zêr, Zîv, Sîfir, Hesin û hwd.*

**Gihîstin** / Erişim / Access  
*Gihaniya xala mebestê.*

**Gilbert** / Mîknatis kuvveti birimi / Gilbert  
*Yekeya pîvana hêza magnetîzî*

**Gilgil** / Mısır / Corn  
*Riwekeke ji malbata genim.*

**Gilover::Bazneyî** / Yuvarlak / Round::Circular  
*Şêweyê geometrîk e. Dirêjahiya navenda şêwe û hemû aliyên dora şêweyê bi qasî hev in. Tiştê gilover li ciyê serbejêr digindirin. Mînak, tekerlek.*

**Gincir::Ustibi** / Üstüğü / Oakum  
*Ê ku ji pine û potikên peritî pêk tê.*

**Gindirandin** / Yuvarlamak / Roll  
*Tiştê ji erdê neyî rakirin û li gorî tewereyê xwe bê zivirandin.*

**Gir::Gewre** / İri / Large  
*Tiştê ku ji hevcinsê xwe mezintir e.*

**Gir::Tepe** / Tepe / Vertex  
*Ciyê herî jor.*

**Girak::Çesip::Çrîş** / Tutkal / Glue  
*Madeyê ku alav pê bi hev ve dizeliqin.*

**Giran** / Ağır / Heavy  
*Giranî ji baristeya madeyê çêdibe. Hemû bariste hev dikîşînin. Tiştên bi hêzeke mezin têne kişandin giraniya wan zêde ye û ew giran in.*

**Giranî** / Ağırlık / Weight  
*Giranî ji baristeya madeyê çêdibe. Hemû bariste hev dikîşînin. Giranî hêza kêşana erdê ye ku makedayan dikîşîne.*

**Giraniya neguhor** / Sabit ağırlık / Intertial  
*Giraniya wî heman demî wekhev be.*

**Girar** / Pilav / Rice  
*Savara birincê.*

**Girav::Dürge** / Ada / City block  
*Erdên ku hawirdora wan bi rê girtî ne (di plansaziya bajêr de)*

**Girav::Dürge** / Ada / Island  
*Beşa bejahiyê ya ku hawirdora wê bi tevahî bi ava golekê, bi ava deryayekê yan jî bi ava zeryayekê dorpêçkirî ye.*

**Girava îmarê** / İmar adası / Island development  
*Koma parsêlên ku li gorî plana îmarê çêbûyî.*

**Girava kadastroyê** / Kadastro adası / Island of cadastral  
*Koma parsêlên ku li gorî plana kadastroyê çêbûyî*

**Gîrawe** / Çözelti / Solution  
*Du yan jî zêdetir madeyên ku li nava hev ketine û taybetmendiyên xwe parastine. Bi rêbazên sefandina fîzîkî, dâkelînkirinê û çendên din ev made ji hev tên qetandin. Mînak; Dew, Çay, Şerbet, Şorik (sûravk)*

**Gîrawebûn** / Çözünmek / Dissolve  
*Bi tîna germê herikbar bûn.*

**Gîraweya Tamponê** / Tampon çözelti / Buffer solution  
*Gîraweya ku guhêrîna pH'ê di asta herî kêm de dihêle.*

**Girdok** / Büyüteç / Magnifying glass  
*Tiştên biçûk, mezin dide xuyakirin.*

**Girêbide** / Bağlan / Connect  
*Fermana ji bo pêvebûnê an jî ji bo tevlihbûnê.*

**Girêdan** / Bağlantı / Link  
*Pêwend.*

**Girêdan::Bestin** / Bağlantı / Connection  
*1. Bi hev ve danîna du yan jî zêdetir heyberan. 2. Pêwendiya navbera du xalan. 3. Eleqeya du bûyeran.*

**Girêk** / Düğüm / Knot  
*Cihê ku bi hev ve hatiye badan.*

**Girêka monikê** / Eklem düğümü / Cut vertex  
*Cihê ku girêk lê ye.*

**Girtename** / Tutanak / Report  
*Li hember bûyerekê, ji bo niviskî tomarkirina bûyerê tê nivîsîn. Belgeya sepanîdê.*

**Girtî** / Kapalı / Closed  
*Dijberê vekirî.*

**Girtîgeh::Zindan** / Hapishane / Prison  
*Avahiyên ku girtî lê dimînin.*

**Girtin** / Tutmak / Hold (to)  
*Pêgirtin. Tiştêk heye tu mînakê ji wî tiştî digirî yan jî tu wî tiştî bi xwe dikî bin destên xwe.*

**Girtina elektronê** / Elektron yakalaması / Elektron capture  
*Rewşa atoma ku elektronek zêde girtibe.*

**Girûz::Zivir** / Pürüz / Rough  
*Rûxarê ku ne hilû ye.*

**Girûzekî::Zivirî** / Pürüzlû / Rough  
*Yê ku rûyê wî ne dûz an jî hilû ye.*

**Gîsin** / Pulluk / Plow  
*Amûreke ku erdê cot dike. Parçeyek ji halet e.*

**Gîsk** / Çebîç::Tekenin küçüğü / Small goat  
*Bizina biçûk a ku ji karikê mezintir e.*

**Gîya** / Ot: Bitki / Grass: Weed  
*Cureyekî riwekan e.*

**Global::Cîhanî** / Global / Global  
*Yê/a ku li hemû cîhanê derbasdar e.*

**Gogî** / Küresel / Spherical  
*Yê ku gilover e.*

**Gol** / Göl / Lake  
*Ava sekan a ku di çalên kûr û fireh de ye û çaralîyê wê dorpêçkirî ye. Ava golê naqihîje zeryayê. Hinek gol xwezayî ne û hinek jî ji bo pêdiviyên mirovan hatine çêkirin.*

**Golik** / Buzagi: İnek yavrusu / Calf  
*Çêjîkên çêlekan.*

**Gom** / Hayvan ağılı / Sheepfold  
*Stargeha pez.*

**Gopitk::Lûtke** / Doruk / Peak  
*Xala bilindrîn a gir an jî nirxek.*

**Gor** / Mezar / Grave  
*Ciyê ku mirî lê tê veşartin.*

**Gorên komî::Komegor** / Toplu mezar / Mass grave  
*Piştî şer komkujî yan jî babelateke xwezayî, deverên ku bi girseyî cendekên mirovan lê hatine binaxkirin an jî veşartin.*

**Goristan** / Mezarlık / Cemetery  
*Ciyê binaxkirina cendekên mirovan.*

**Goşebend** / Köşebent / Bracket  
*Hesineke dirêj e û felqa wî dişibe tîpa L.*

**Goşekenar::Hêlê tîrekî** / Köşegen / Diagonal line  
*Di pirgoşeyek de parçeya rastexêzê ya ku du goşeyên ne ku bi heman la (kêlek) yê ve nînin bi hev ve dike.*

**Goşeya Bendê** / Bağ açısı / Bond angle  
*Goşekirina cotên di nava yek dendikê de derkevin.*

**Goşeya hatinê::Goşeya êrîşê** / Hücum açısı / Angle of attack  
*Goşeya tîrêja ku tê û rûyê ber bi erdê de ye.*

**Goşeya ji bakûr** / Semt açısı / District angle  
*Hokeya ji bakûr. Di kenarekê de, hokeya ji destpêka xeta bakûr, berbavê tevgera saetê ve.*

**Gotar** / Makale / Article  
*Nivîsên ku di rojname û kovaran de tên veşandin. Ev cure nivîs li ser mijarekê dişekine. Sê beşên vê nivîsê yên girîng hene, destpêk, mînak û encam.*

**Gotîk** / Gotik / Gothic  
*Şêwazek avahîsaziyê ye. Bêhîr xetên tûj tûj bikaranîn, kemerên gulover cihên xwe didin keme-rên tûj.*

**Grafîk** / Grafik / Graph  
*Ji dîzayna bixêz û rangan tê çêkirin.*

**Grafîkî** / Çizitsel / Graphical  
*Nîgar, teşe, şêwe yan jî tiştêkî din ê bi awayê grafîkî.*

**Gram (g)** / Gram (sı birimlerinde kütle birimi) / Gram (g)  
*Pîvaneke ku mêtêra barîste dîde nîşandan û ji pergala navneteweyî (SI) ye. Ji hezaran yekî kîlogramê ye.*

**Granît** / Granit / Granite  
*Cureyekî kevirê xwezayî yê volkanîk e, piştî zûl-kirin û cîlakirina wî di gelek ciyên avahiyê de tê bikaranîn.*

**Granul** / Granül / Grained  
*Hebikên made yên biçûk.*

**Gravîte** / Gravite / Gravity  
*Tiştê ku bi tîrbûniyê ji hev diqete. Dereceya qalî-teya made.*

**Grayder::qirêder** / Grayder / Grader  
*Maşîneya ku rê dûz dike.*

**Gres** / Gres yağı / Grease  
*Madeyê ku wek jelê ye û ji di makîneyê de ji bo parçeyê ku dileqin zeng negirin tê bikaranîn.*

**Gres** / Gres / Grease  
*Rûnê ji bo maşîneyê.*

**Grîzû** / Grizu / Firedamp

*Di kana rejûyê (komira kevirîn) de gazeke ku pira-niya wê metan (CH<sub>4</sub>) e. Gaza metanê û toza re-jûyê. Zû pêdikeve û diteqe.*

**Guh** / Kulak / Ear

*Avaniyeke anatomîk e. Karê bihîstinê dike û leba-tên hevkeşe di nav xwe de dinixumîne.*

**Guhan** / Meme (hayvan memesi) / Breast (for animals)  
*Libateke ajalên mê ye ku şîr jê tê dotin.*

**Guheran** / Varyasyon / Variation

*Di madenê de hemû awayê ax, kevir û madenan ji bo husûsiyetên cûr bi cûriya reng, giranî, radyoak-tîvî tê gotîn.*

**Guherbar::Goraw** / Değişken / Variable

*Tişt an jî rewşa ku diguhere.*

**Guherîn** / Değişim / Changing

*Tiştêkî rasterast bi tiştêkî din ve bê guhertin. Girtina dirûvekî din. Girtina teşeyeke nû.*

**Guherîn::Guherandin::Gorîn** / Değişme / Change

*(to-) / Wergirîna li şeweyêkî nû. Parsêla vala ya ku xanî li ser bê çekirin, cureyê wê jî divê bê guhertin, dibe parsêla bi xanî.*

**Guherîna fizîkî** / Fiziksel değişim / Physical change

*Guherîna şeweyî, demî, baristeyî an jî qewareyî.*

**Guhertina navnîşanê** / Adres değiştirim / Address modification

*Guhertina ciyê ku mirov lê ye.*

**Guhertina planê** / Plan değişikliği / Amendment plan

*Li gor pêwîstiyê bajarvanîyê guhertina li ser planên heyî têne kirin.*

**Guhertina taybetiyê** / Cins değişikliği / Type of change

*Piştî derbasbûna demên dirêj an ji destnîşankirina xeletiyên mezin ji nû ve çêkirina qadas-troyê.*

**Nutron** / Nötron / Neutron  
*Hebikên atomê ku her yek giraniya wan nezi protonê û barê wan ê elektrîkê tune ye.*



**Oksîjen** / Oksijen / Oxygen

*Elementa ku giyaneweran zindî dihê. Bi şewata wê em enerjîyê serf dikin.*

**Onîks** / Oniks / Onyx

*Mermera ku êdî qedemeya veguherîna wê nemaye.*

**Optîk::Bînayî** / Optik / Optical

*1. Tiştê ku bi dîtinê re eleqedar e. 2. Beşa fizîkê ya ku li ser mijarên roniyê hûr dibe.*

**Organîk / Organik / Organic**

*Heyberên ku parçeyek ji zindiyan e an jî ji zindiyên çêbûye.*

**Organîzma::Zîndewer** / Organizma / Organism

*Tevahiya lebatên ku giyandarekê/î pêk tînin, uz-wiyet.*

**Orkîde** / Orkide / Orchid

*Riwekeke xwezayî ye, ji toven wê salep tê çêkirin.*

**Oşîlatora bêaheng** / Uyumsuz salıncı / Anharmonic oscillator

*Amûra ku bê aheng û bi dor herikîna alternatîf çêdike.*

**Osmoz** / Osmoz / Osmosis

*Dufuziyona avê.*

**Oto** / Oto / Auto

*1. Otomobîl 2. Amûrên ku bi rêyên mekanîk tî tevgerandî û xwe bi xwe bi rê ve dibin.*

**Otomasyon::Xodkarî** / Otomasyon / Automation

*Karê ku bêyî alîkariya mirov, bi alîkariya makîneyan xwe bi xwe tê kirin.*

**Otomatîk::Xodkar** / Otomatik / Automatic

*Amûra ku bi rêyên mekanîk dilive, xwe bi xwe (xweserî) bi rê ve dibe.*

**Ozon** / Ozon / Ozone

*Elementa ji oksîjenê ya ku di molekula wê de 3 atom cî digirin*

# { P }

**Pace::Şibak::Pencere** / Pencere / Window  
*Beşa vekirî ya di avahî yan jî makîneyan de ji bo ronahî û danûstendina hewayê.*

**Pafte** / Pafta / Sheet  
*Parçeyek ji nexşeyê. Ji bo bikaranina nexşeyên qadên fîreh hêsantirbe nexşe tîn parçekirin, ji her parçeyê re pafte tê gotin. Her pafte bi pîranî qasî 60x80 cm. e.*

**Pafteya astralon** / Astralon pafta / Astralone map sheet  
*Pafteyên ku li ser astralonan hatiye xêzkirin. Di astralonan de piştî salên dirêj jî xerabûn pir kême.*

**Pafteya giravê** / Ada paftası / Blok type map  
*Pafteya ku komên parselan (girav) nîşan dide.*

**Pafteya karton** / Karton pafta / Cardboard sheet  
*Nexşeyên ku li ser kartonan (kaxizên situr) hatiye çêkirin. Pafte beşek nexşeyê ye.*

**Pafteya tije** / Dolu pafta / Frame sheet  
*Di pafteyande kêmtirîn valahî hiştin. Ji bo bi hêsani bê bikaranîn, nexşe li pafteyan wusa tê parvekirin ku heri kême pafte jê derkevin.*

**Paket::Pêçek** / Paket / Packet  
*Objeya di navê de tiştê an tiştin bi destan bîhîl girtin; bi kaxez hatiye dorpêçkirin, an jî di nava qutiyê de hatiye girêdan.*

**Paladyûm** / Paladyum / Palladium  
*Elementek e ku hejmara wê ya atomê 46 e. Di-şibe platînê.*

**Palan::kurtan / Semer / Saddle / Cilên heywanên bargir.**

**Palavk::Filtre::Parzûn** / Filtre / Filter::Strainer  
*Cureyekî safokê ye. Tiştê ku tiştên nayên xwestin jê derbas nabin.*

**Paldank::Pişte** / Dayanak / Support  
*1. Kursî, sendelî 2. Pişte, palpişt, balîf 3. Sparte, destek.*

**Pale::Êlxat::Wertzvan::Sepan::Karker::Karkerên çandiniyê** / Irgat / Laborer  
*Xebatkarên çandiniyê.*

**Palet** / Palet / Caterpillar  
*Di maşîneyan de, ji bo qada herî û bi berf an nêzikî wan tê xebitandin.*

**Palpiştiya hişk** / Esnemez destek::rijit tahkimat / Rigid support  
*Desteka ku di kolana tunelê de ji bo tunel hilne-weşe.*

**Pankirin::Rastkirin** / Düzleştirmek / Flatten  
*1. Tekûzkirin, rastkirina ruyê tiştêkî 2. Sererastkirin.*

**Pano** / Pano / Panel  
*Paceya ku amîrên kontrolê tê de tîn bicîkirin. Ji bo kontrolkirina pergala elektrîkî yan jî kontrolkirina makîneyan tê bikaranîn.*

**Paqijker** / Temizleyici / Cleaner  
*1 - Programa ku bîra (hiş) kompîturê vala dike. 2 - Kes an jî objeya ku paqijiyê dike.*



**Paqijkirin** / Temizleme / Cleaning

*Valakirina, sifirkirina daneyê di nav bîra (hiş) kompîtur an jî makîneyê de didome.*

**Par** / Geçen yıl / Last year

*Sala ku derbas bû, qediya. Sala çûyî.*

**Par::Beş::Encam** / Bölüm (bölme işleminde bölüm) / Quotient

*Hejmara ku di dawiya kirariya dabeşînê de dertê.*

**Para erseyê** / Arsa payi / Ownership share

*Di parselekê de di Xwedîtiya ji yekê zêde de para her yekî. Avahiyên li ser heman parselê li gor mezinbûnê xwediyê parek ji parselê (erse) ye.*

**Para terkîn a verastkirinê** / Düzenleme ortaklık

*payi / Development readjustment share  
Li gor zagona îmarê ji her xwediyê eraseyan parek diyar tê birîn.*

**Parabol::Birgeya hevta** / Parabol / Parabola

*Cihê xalên ku dûrahiya wan ji xala nîvend (focus) û xêza rastkirî (directrix) re yeksan e.*

**Parabolîk::Birgeya hevtayî** / Parabolik / Parabolic

*Tiştên bi parabolê ve têkildar, parabolê ve girêdayî.*

**Paraboloîf** / Paraboloit / Paraboloid

*"Paraboloîta elîptîk, paraboloîta hîperbolîk."*

**Paradoks::Hevdiji::Dijgeyî** / Paradoks / Paradox

*1. Fikir an jî rewşên lihevnehatî. 2. Fikreke nelirê, çeprast 3. Dijraber.*

**Parametre** / Parametre / Parameter

*Guhêrbare ku bandor û têkiliya li ser tiştekî nîşan dide.*

**Parastin** / Koruma / Protection

*Di elektrîkê de li hemberî arîze û di karê elektrîkê de li hemberî kirina şaşiyên xebatkarên, ji bo zîyanê kêmkirî, parastina jiyana mirov, candar û parastina xerabûna amûran. "Parastina van amûrên (cîhaz) nû tev di nav xwe de çêkirine."*

**Parastin** / Savunmak / Defend

*1. Berevanîkirin, ji xetere û bandorên neyînî dûrhiştina tiştekî yan jî kesekî. 2. Hemet kirin \*  
"Gund, bê se nayê parastin."*

**Parastina lêjî** / Şev korunması / Slope protection

*Zeximkirina lêjîyê. Pêşîlgirtina ramalînê. Mînak;*

*Di bendavê de rûyê aliyê avê bi kevirên gewre tê zeximandin. Dîwarên li kêleka rê ku ji bo pêşîgirtina hilweşîna axê têne çêkirin.*

**Parçe::Pêkhate** / Parça / Component

*Tiştê ji yekbûniyê qetiyayî, bi tenê tê jimartin an jî ji yekbûniyê zêde maye. Her yek ji tiştê hêsan ku yekbûniyê ava dikin. "Hejmara parçeyên vê komê çend in?" "Di nava cilên min de çend parçeyên xweşik hene."*

**Parçebûn** / Parçalanma / Fragmentation

*Hûrbûn û ji hev veqetîna madeyan.*

**Parçekirina zêviyê (erd)** / Arazi parçalanması / Fragmentation

*Ji parselekê derxistina du an jî duduyan zêdetir parsel. Biçûk kirina parselan.*

**Parçik::Partîkul** / Parçacık / Partial

*parçeye herî piçuk*

**Pardar** / Hissedar / Shareholder

*Kesê/a ku xwedî par e.*

**Parêz::Bostan** / Bostan tarlası / Melons field

*Baxê hêşînahiyê.*

**Park** / Park / Park

*Baxçeyên mezin ên bi dar û şînayî ku di nav bajar de ji bo gel lê bigere û behna xwe bide hatine avakirin.*

**Parka herêmî** / Bölge parkı / Regional park

*Parka mezin ku ji bo xizmeta herêmekê hatiye çêkirin.*

**Parsela avadaniyê (îmarê)** / İmar parseli / Development parcels

*Parsela ku li gor parselasyona plana avadaniyê (îmarê) hatiye çêkirin.*

**Parsela kadastroiyê** / Kadastro parseli / Cadastral parcels

*Parsela ku li gor xebata kadastryê hatiye çêkirin.*

**Parsêla zeviyê (erd)** / Arazi parseli / Land parcel

*Parsela kadastryê (zevî). Eger parsel li gor plana îmarê çêbibe, wê demê navê zeviyê dibe erse.*

**Parselasyon** / Parselasyon / Parcelling

*Li gor planê îmarê an jî li gor xwestekê ji parselek derxistina çend parselan. Parçekirina parselan.*

**Paş / Geri / Rear:**Back

1. Pişt 2. Dawî.

**Paş / Geri:**Önceki / Back

Xebitandina di programên kompîturê de xebata beriya niha. Dijberî "pêş". "Ew agahiyên ku em lê digerin di malpêrê de di rûpela paş de bûn."

**Paşdahîştî::Derenghiştî::Vehîştî /** Geciktirilmiş göçertme yöntemi / Retarded

Rêbaza ku ji bo derxistina cewherê pêşîgirtina herivandina axê.

**Paşerokên radyoaktîf::Avêtîyên radyoaktîf /**

Nükleer atık / Radioactivewaste

Ji bermahiyên ku piştî karê nuklerî dimînin.

**Paşketin / Gerileme / Recessional**

1. Karê paşveçûyîne 2. Lawaz bûn, kêmbûn.

**Paşlerze / Artçî sarsıntı / Aftershock**

Hejînen zemînê yê bê pergal ku li dû erdheja mezin pêk tên.

**Patent / Buluş belgesi / Patent**

Belgeya (dokumana) kifşê. Belgeya vedîtina tiştekî nû. Belgeya di bin parastina qanûnê de ji bo kifşa proses, amûr an jî metodeke nû, ji aliyê ofîsa patentê ve tê dayîn.

**Pazdeh / On beş / Fifteen**

Hejmara piştî çardehan. Navê hejmara 15'an, an jî di jimareya Roma'yî de xv.

**Pêçan::Lefandin::Dorzivîn /** Sarmak / Wrap

1. Paçikirin 2. Lêalandin 3. Dorlêgirtin.

**Pêgirî / Bağımlılık / Dependence**

Nirxeke ku li gora guherbarekî nixr diguherîne

**Pehnî / Topuk / Heel:Toe**

1. Paşya pêlavê 2. Dawiya solê.

**Pêjgîr / Havlu / Towel**

Paçê ziwakirinê.

**Pejnkerî::Peljenî /** Duyarlılık / Precision

Rastîbiniya daneyê ye.

**Pêkhata şespalûya girtî /** Sıkıdılmış altıgensel

yapı / Close packed hexagonal structure

Şeşgoşeya rast ku xwedî bilindahî ye û 3 rehend e. Ser û binê wê şeşgoşe ye, dora wê jî bi çargoşeyan pêçayî ye.

**Pêkhate / Bileşen / Constituent**

Gelê madeyên xamên ku di nava madeyên tevli-

evî an pêkhatî ne.

**Pêkhate:Hêman /** Yapıtışı / Constituent

Parçeyek ji parçeyên hemû.

**Pêkhateya keviri::Pêkhateya berdî /** Kayaç yapısı / Rock structure

Cure û taybetmendiyên kevîr an jî kevirîyan.

**Pêkhateya Lewisî /** Lewis yapısı / Lewis structure

Curekek formulên kîmyewî ku li dora sembola elementê elektron bi xalan têne nîşandan.

**Pêkhateyên sereke /** Mütemmim cüz / Essential component

Pêkhateya bi hev ve girêdayî. Ev pêkhate ji eslê xwe nayê veqetandin. Bi eslê xwe ve dijî. Bê veqetandin ji taybetiya xwe wenda dike. Xanî mutemînîn cüz a parselê ye, dar mutemînîn cüz a baxçeyê ye.

**Pêkhatin::Çêbûn /** Oluşmak / Occur

Bûyîna heyberê. Derketina holê.

**Pêkhêrandin /** Bileştirmek / Compose (to)

Li nav hev xistin.

**Pekîn /** Sekme / Rebound

Bi sedema lêketina heyberê bertek çêdibe û ew heyber vedigere.

**Pêl /** Dalga / Wave

Di fizîkê de lerza ku belav dibe û bi xwe re enerjîyê radigihîne.

**Pêlav::Sol /** Pabuç:Ayakbabi / Shoe

Amûra lixwekirin û parastina lîngan ku bi piranî li derveyî malê tê bikaranîn.

**Pêlbir::Pêlşikên /** Dalgakıran / Jetty

Dîwarê di nava deryayê de nêzî peravê ye, ji bo kêmkirina bandora (hêz) pêlên avê.

**Pelçimhewêz::Pelhewêz /** Sinir otu / Plantago sp

Giyayek e di hekîmiyê de tê bikaranîn.

**Pelçiqandin::Pelixandin /** Ezmek / Crush

Bi alîkariya hêzekê tişt şeweyê xwe diguherînin. Dema mirov pê li fêkiyekê bike fêkî şeweyê xwe diguherîne, diqelîşe û ava nava xwe derdixe, ev pelçiqandin e.

**Pelê mêtewê /** Asma yaprağı / Grape leaves

Pelên dara tirî.

**Pelê silkê /** Pazı yaprağı / Leaf beet

Pelên giyayê silkê ku ji familyeya ispanaxê ye.

**Pêlên erdhejê** / Deprem dalgaları / Earthquake waves  
*Di dema erdhejê de ji navenda erdhejê ber bi derve ve hêza heja zemînê.*

**Pêlên hertzî** /  $3 \times 10^4 - 1 : 5 \times 10^5$  hz aralığındaki dalgalar / Hertzian waves  
*Pêlên hertz bi navê zanyarê Alman Heinrich Hertz hatiye binavkirin. Pêlên hem elektrîk, hem manyetîk in ango elektromanyetîk in û bi leza ronahiyê li hewayê belav dibin. Frekansên wan di navbera  $3 \times 10^{10} - 1, 5 \times 10^5$  hz (dirêjîya pêlan di navbera 2 cm - 2.000 m) de ye.*

**Pelîn** / Yapraksî / Foliated  
*Tiştê ku wek pel xuya dike.*

**Peljenî** / Doğruluk / Accuracy  
*Di pîvanan de heta radeyekî xeletî, şaşî tê qebûlîkirin. Radeya rastiya pîvanê ye.*

**Pêlweş** / Dalga yayıcı / Radiator  
*1-Amûra ku hewa, av an jî hîlma germkirî yan jî sarkirî belav dike û bi vî awayî germahî yan jî hênîkahiyê çêdike. 2-Sarkera ku zêdebûna pîleya germa motora ku bi xwe ve girêdayî ye dixîne.*

**Pembû** / Pamuk / Cotton  
*Riwekeke ku berên wê spî ne, dişibin hiriyê, nerm e. Di tekstîlê de yek ji madeyên xam e, pê cil çêdibin.*

**Pênc** / Beş / Five  
*Hejmara piştî çaran. Navê hejmara 5'an, an jî di jimareya Romayî de v.*

**Pênc sed** / Beş yüz / Five hundred  
*Hejmara piştî çarsed nod û nehan. Pênc car sed. Navê hejmara 500'î, an jî di jimareya Romayî de d.*

**Pêncî** / Elli / Fifty  
*Hejmara piştî çil û nehan. Navê hejmara 50'yî, an jî di jimareya Romayî de l.*

**Pênûs::Qelem** / Kalem / Pen::Pencil  
*Amûra nivîsînê.*

**Pêpelûk::Pêlik::Pêngav** / Basamak / Step  
*1. Di derencê de rûyê ku ling pê lê dike. 2. Ji bo derketina çiyekî bilind çihê ku mirov piyên xwe datîninê, her yek ji wan bi bilindîya 17 cm'yan tê çêkirin.*

**Peqik** / Kabarcık / Bubble  
*Tiştên ku hundirê wî wê bi av an hewayê bine-pixe. Dema ku çermê mirov dişewite û çerm dine-*

*pixe re jî tê gotin.*

**Peqika asokerê** / Düzec kabarcığı / Bubble  
*Nîşaneke li ser asokerê.*

**Per::Bask::Çeng** / Kanat / Wing  
*1. Lebatê firindeyan ê ku pê perwaz digirin; per  
 2. Çepil, mil \* " Her teyr bi baskên xwe difire. "*

**Pêrar** / İki yıl önce:Evelki yıl  
*Two years ago / Du sal berê.*

**Peravxanî** / Yalı / Mansion  
*Koşkên li kêleka avan. Xaniyên taybet yên beravan.*

**Perde** / Ekran / Screen  
*Amûra rûxara wê rast û ne zebloq ku bi alîkariya (rêya) ronahiyê wêne yan jî vîdeoyan nîşan dide.*

**Pere::Dirav** / Para / Money  
*Amûra dayînê ku ji kaxiz an jî ji metal hatiye çêkirin.*

**Performans** / Performans / Performance  
*Rewşa xurtaniya di derbarê karekî de.*

**Pergal::Sîstem** / Sistem / System  
*Tevahiya rêbazên ku bi kêra bidestxistina encamê tên.*

**Pergala agahiyê ya zeviyê** / Arazi bilgi sistemi / Land information system  
*Sistema agahiyê ya ku agahiyên derheqê erd têde tên komîrin.*

**Pergala metreyî::Sîstema metrî** / Metrik sistem / Metric system  
*Di matematîkê de pîvanekên pergala metreyê.*

**Perkaz::perwaz** / Pervaz / Molding:Moulding  
*Perçeyek kêmbêr ku li dora şîbak an jî deriyên têxistin.*

**Perperok::îfîdok::Pinpinîk** / Kelebek / Butterfly  
*Kêzikeke ku temenê wê gelekî kin e.*

**Perwane** / Pervane / Propeller  
*Pirî çaran seba sarkirin û tevgerdayînê tê xebitandin.*

**Perwerde** / Eğitim / Education  
*Karê hînkirin û fêrîkirinê.*

**Pestan** / Basınç / Pressure  
*Mêjera hêza stûnî ya ku li yekeya qadê bandor dike.*

**Pestîn::Pestîner** / Pres: Baskı / Press

1. *Şîdanîna heyberekê di nava du hêz an jî metalan de.* 2. *Makîneya ku karê presê dike.*

**Pestoya Beşkî::Beşepestan** / Kısmi basınç / Partial pressure

*Li gazên di nava têkelek gaza mengî de her gazekê pestoyekê xwe a beşkî heye. her gazek jî bilîf têkelê li gorî vî pestoya beşkî dihele. Di derdan (aman) a ku gazên ji hev cuda dixewîne de pestoya ku gor qebareya gazan para wan e.*

**Pestoya bilind** /Yüksek basınç /High pressure :: Overpressure

*Pestana ku ji hududê dawîniya maşînan zedetir e.*

**Pestoya Dûkelê** / Buhar basıncı / Vapor pressure  
*Malekûlên avê yê di nava avê de bi rewşa gazê ve xwe nîşan didin. ev malekûl gava dikelin, bandorekê li ser rûbarê şilavê dikin, ji vê bandorê re pestoya hilmê te gotin.*

**Pêş** / İleri / Forward

*Di programên kompîturê de xebata piştî niha. Dijberî "paş". "Ew agahiyên ku em lê digerin di malpêrê de di rûpela pêş de ne."*

**Pêşgeh** / Giriş holü / Lobby::Entrance hall  
*Hola li dû deriyê daketinê.*

**Peşk** / Sıçrama:Sıçantı (sıvılar için) / Splash  
*Bi sedemeke (kevir li avê dikeve, ava ku dirije û bi erdê dibe..) belavbûna dilopên şilekiyan.*

**Pêşkêşker::Servir** / Sunucu / Server  
*Kompîtura bingehîn a ku di networkê de ji aliyê bikarhênerên din ve karin bigihîjin dane û çavkaniyên wê.*

**Pêşveçûna rojane** / Günlük ilerleme / Daily advance  
*Di rojekê de karê ku hatiye kirin.*

**Petkirin::Puxtekirin::Paqijkirina xamî::Zengînkirina cewher** / Atık (cevher zenginleştirme) / Refuse (ore dressing)  
*Bi rêbazên curbicur paqikirin bi nixkirin û zelalîkirina (safîkirin) cewherêkê.*

**Pêvajoy::Proses** / Süreç / Process  
*Di kompîturê de kirariyên ku berdewam dikin, ji bo gihîştina encamêkê rêzên pêpelokên kirariyan.*

**Pêvajoya plansaziyê** / Planlama süreçleri / Planning process  
*Hemû metod û pêngavên ji bo çekirîna pîlanê.*

**Pêvek** / Ek / Additional

*Ji bo kêmasiyên tiştan bîn temamkirin parçeyên ku pê ve tên danîn. Zêdekirin, mezinkirin.*

**Pêvekirin::Pêwenan::Pêveke::Pê ve bike** / Yapıştır / Paste

*Danîna daneya ku di bîra amûra elektronîk de ye bi cîhekî din ve. Danîna heman daneyê ya bi cîhekî din ve kirin.*

**Pêxistin::Vêxistin** / Yakmak / Burn  
*Agirdadan/hilkin.*

**Peya::Piyade** / Yaya / Pedestrian  
*Kesê ku bi meşê diçe.*

**Peyam** / Mesaj / Massage  
1. *Agahî, xeber, salix* 2. *Pêxem.*

**Peyam** / Mesaj / Oblique  
*Armanckirina têgihandina hest an jî fikrê (ramanê), xwe bi nivîs an jî bi gotinê nîşandan. "Ez dixwazim jê re bi telefonê peyamekê bişînim."*

**Peyama elektronîk::Posta Elektronîk::E-posta::E-name** / Elektronik posta / Electronic mail  
*Şandina peyam, agahî yan jî, daneyan bi rêya telefon, kompîtur an jî înternetê. "Piştî çend salan bi rêya peyameke elektronîk em li hev hatin."*

**Peyarê** / Kaldırım / Sidewalk  
*Devera ku li kêleka rê ji bo ku peya lê bimeşin hatiye veqetandin. Parçeyek ji rê ye.*

**Peyatî** / Yaya / Pedestrian  
*Rêçûna bi piyan.*

**Peyda** / Tedarik / Supply  
*Ji bo bikaranîne bidestxistina pêwîst.*

**Peyman** / Sözleşme / Contract  
*Belgeya di navbera dudu yan jî zedetir kesên ku her du aliyên girêdide, ji bo kirin an jî nekirina tiştêkî li ser lihevkerina tiştêkî.*

**Peymana lîsansê** / Lisans anlaşması / License agreement  
*Belgeya (dokumana) destûrê (rêdanê). Belgeya destûra mafê hilberîn, bikaranîne yan jî bikaranîna teknolojiya malê ku fîrmayekê çêkiriye û mafê hilberînê di destê wê fîrmayê de ye, dide fîrmayeke din.*

**Peyv::Bêje** / Kelime / Word  
*Dengên watedar, yekîtiya dangan, gotin. " Ew peyv tê çî wateyê? "*

**Peywend** / Bağıntı / Relation  
*Tiştê ku bi hev re têkildar in.*

**Peywir::Erk** / Görev (bir degerin başka degerlerle olan ilişkisi) / Task (which is a value in relation to another values)  
*Pêwendiya nirxekî bi nirxekî din re. 2- Karê ku kesek an jî tiştêk dike. 3- Fonksiyona tiştêkî. 4- Di kompîturê de her yek ji yekîneyên karê ku bê peyikandin. Yekîneya kar.*

**Pezkovî** / Yabani keçî / Wild goat  
*Ajalên kovî yên mîna xezal, mî, bizin û hwd.*

**pH Metre** / Ph metre / Ph meter  
*Amûrê pîvana PHê ye.*

**Pîfkirin** / Üfleme / Blow  
*Bi pestoyê defdana (tehdan) bayê.*

**Pîgment** / Pigment / Pigment  
*Madeya ku reng dide tiştan.*

**Pijandin** / Pişirmek::fırınlamak / Bake (to)  
*1- Tiştêkî li gorî bikêrhatina bikaranînê, bi bandora germiyê anîna rewşa lêhatî. 2- Ziwakirina li ber tavê.*

**Pijandin::Pehtin** / Pişirmek / Cook  
*Bi bandora germê ku xwarin an jî heyber pê têne asteka bi kêrhatî.*

**Pîk** / Pîk / Pig Iron  
*Amêjena hesinkarbon ku di nav xwe de ji %4'an heta %5'an karbonê dihewîne. Cureyekî hesînê rokîrî (rijandî) ye.*

**Pîksel** / Pîksel / Pixel  
*1- Di nihêrtina wênanan a ji nêzîk ve li ser wêneyê hejmarê xalên ku bi çavan tîn dîtin. 2- Li ser tiştêkî lekeya hûrik, xal.*

**Pîl** / Pil / Cell  
*1- Jêderka (çavkaniya) hêza ku bar diajo. Ew hêz bi ronî, germî û an jî hevbandoriya kîmyasal çêdibe. 2- Yekîneya herî biçûk ku bi serê xwe di-kare kar bike.*

**Pîl::baterî** / Pil / Battery  
*Amûra ku enerjiya kîmyayî vediguherîne enerjiya elektrîkê. "Radyo bê pîl naşixule."*

**Pile** / Derece (çemberin 360'ta birine eşit açî birimi) / Degree  
*Yekîneya goşeyê. "Berhevkirina her sê goşeyên hundirê sêgoşe 180 pîle ye."*

**Piling** / Kaplan / Tiger  
*Ajalekî dirinde.*

**Pilûr::Simore** / Sincap / Squirrel  
*Ajaleke kovî bi tovên daran xwedî dibe.*

**Pînekirin** / Yamalamak / Patch (to)  
*1- Temamkirina kêmasiyên programên kompîturê. 2- Bi pîneyan selihandin.*

**Pingar** / İrkinti::suyun bir engelden dolayı geriye doru şişmesi / Swelling of the water to back  
*Lî hemberî astengiyekê bi paş ve vegeîrîn û kombûna avê.*

**Pingar** / Kuluçka yeri / Hatchery  
*Ciyên ku ajal lê çup dikevin.*

**Pîpet::Mijok** / Pipet / Pipette  
*Ji pîpetê re kamîş (kamir, armîş) jî tê gotin, amaneke azmûnên kîmyewî ye.*

**Pir** / Köprü / Bridge  
*Rêya ku di navbera du ciyên ji hev qetiyane de pêwendiyê çêdike.*

**Pira hilawîstî** / Asma köprü / Suspension bridge  
*Pira ku bi alîkariya tenafên vekêşandî tîn avakirin.*

**Pira Xwê** / Tuz köprüsü / Salt bridge  
*Di zanistiya kîmyayê de, pêdiviya pêgiredana di navbera hicroka nîv-redûksiyon û hicroka galvanîk oksîdasyonê de ye.*

**Pirêze çînîn** / Anız biçmek / To plough up the stubble of  
*Karê çînîna giyayê pirêzeyê.*

**Pirêze rakirin** / Anız bozma / Stubble plow  
*Karên li ser zeviyan rakirina giya.*

**Pirjandin::Pijiqandin** / Çizgi kaynaklı yağmurlama / Line sprinkler irrigation  
*Rêbazê avdaniyê ku bi şeweyê baranê tê kirin.*

**Pirpar** / Semizotu / Purslane  
*Riwekeke ku ji avê hez dike.*

**Pirtika betayê** / Beta parçacığı / Beta particle  
*Elektron an jî pozîtronên ku di dema xerabûna radyoaktîf de ji dendika atomê bi awayê tîrêjan dertên.*

**Pirtika sosret** / Acayip parçacık / Strange particle  
*Di atomê de parçeyê ku nirxa sosretiyê sifir e.*

**Pirtûk** / Kitap / Book

*Komek kaxizên bi nivîs an jî wêneyan agahiyan didin ên ku bi hev ve hatine çapkirin. "Roman, çîrok, helbest, ferheng, ferhenga zaravên teknîkî û hwd."*

**Pirtûkxane** / Kütüphane / Library

*Kitêbxane. Ciyê ku pirtûk û materyalên wek pirtûkan tên komkirin, hilanîn û tîn pêşkêşkirin.*

**Pîsav::Arav** / Atık su / Waste water

*Ava ku ji ber bikarînê maye û qirêjî (qilêr) bûye. Ava kêzîne.*

**Pîspor::Karzan** / Bilirkîşi / Expert

*Kesê ku ji ser mijar an jî pîşeyekî zana.*

**Pîspor::Şareza** / Uzman / Expert

*Kesê/a ku di der heqê karekî de zanîna wî/wê zêde ye.*

**Pîsporê nirxandinê** / Değerleme uzmanı / Appraiser

*Kesê ku pîsporê hesabkirina buhayê zevizar, erd, mal û hwd. e.*

**Pîşe** / Meslek / Job

*Pîşeya ku tê kirin. Xebata ku tê kirin.*

**Pîşesaziya girêdayiyê çandiniyê** / Tarıma dayalı

*sanayi alanları / Agro-industrial areas*  
*Cihên ku palûkeyên berên ku ji çandiniyê ne lê ne. Mînak: Aş, Palûkeya (fabrîqe) rûn, Palûkeya Şarabê, Palûkeya savar.*

**Pîşkinîna bîrê** / Kuyu testi / Well test

*Pîşkinînê (test) ji bo bikêrhatina çavkaniyan ên ku bi riya vekolîna bîrê pêk tîn.*

**Pîşkinîna pestandin** / Basma deneyi / Compression test

*Elementa di tabloya peryodîkde a li stûna 2A elementeke kû kêmtê dîtin e. Bi kurteya "Be" tê nivîsandin.*

**Pîşkinîna xwecih** / Yerde deney / In-situ test

*Pîşkinîna ku li cihê bûyerê bi amûrên heyî û bê pîşkinîngeh (laboratuvar) tê kirin.*

**Pîşt** / Sirt / Back

*Ji bo heywanan û mirovan, ji sermil heta bin qorikê.*

**Pîstre** / Sonraki / Next

*Karê, xebata dûre ya di rêzê de, ya ku fermana wî dê nû bê dayîn. Fermana dûre.*

**Pîton** / Piton / Python

*Cureyekî maran ê bixeter, xurt û mezin.*

**Pîvan** / Ölçme / Measurement

*Nexşegeriyêde pivan du curene. Pivana dirêjahiyê ya û pivana hokeyan (goşeyan). Bi alikariya van koordinat (xyz) tîn hesapkirin.*

**Pîvaneka nexşê** / Harita ölçęği / Map scale

*Pivaneka, çend cara biçukkirina nexşê nişandide.*

**Pîvaneka rêjeyî** / Oransal (kesirli) ölçek / Rational (fractional) scale

*Pivaneka nexşê ya ku bi şêweya rêjeyî tê nişandan. minak:1/500*

**Pîvaneka xêzî** / Çizgisel ölçek / Linear scale

*Cureyek pivanekêye. Pivaneka xêzî, pivaneka nexşeyê nişandide û li ser xêzeke bipivanek hêjmarên dirêjahiyê hene.*

**Pîvanên gelemperî**/Kamu ölçmeleri/Public surveys

*Beşek ji karên nexşegeriyê ye. Mijara wê karên fermî (gelemperi) ye.*

**Pîvanên kontrolê** / Kontrol ölçmeleri / Control measurements

*Pîvanên ji bo zanina rastiya pivanane. Nexşegeriyêde tu pivan bê kontrol nayê pejirandin.*

**Pîvek** / Ölçek / Scale

*Rêjeya dema ku dirêjahiya rastî ya li ser rûyê erdê derbasî li ser plan an jî nexşeyê dibe çiqas piçûk dibe wê nişan dide.*

**Plan** / Plan / Plan

*1 - Xêza (çîzîm) ku beşên bajar, avahî yan jî makîneyan cure bi cure nişan dide. 2 - Xêz an jî nexşeya ku bi hûrgilî ciyekî biçûk li ser rûyê erdê nişan dide.*

**Plana avadaniyî (îmar) ê** / İmar planı / Zoning plan

*Plana ku parsel, avahî, rê û tiştên din bi awayekî berfireh tîde tê nişankirin.*

**Plana avadaniya kiryarî** / Uygulama imar planı / Tentative plan

*Plana îmarê ya ku ji bo pratîkê esas tê girtin û pîvanên wê 1/1000 û 1/500 e.*

**Plana avadaniyê ya ji bo parastinê** / Koruma

*amaçlı imar planı / Plan for protecting reconstruction*  
*Plana ku di îmarê de qadên dirokî û xwezayî yê ku di nava bajêr de ne diparêze.*

**Plana bajêr** / Şehir planı / City plan

*Plana ku bikaranîna erdê bajêr tê de tê nîşandan, wek qada avahiyên, dibistan, rê, qadên şînahî, qada sazîyên fermî û hwd.*

**Plana başkirina avadaniyê** / İmar islah planı / Redamation plan development

*Başkirina, qenckirina planên imarê. Planêde hinek guhartin tîn kirin.*

**Plana bicihanîne** / Uygulama planı / Implementation plan

*Pilana ku ji bo meriyetê hati amadekirin. Van pilanande hurgilî hene.*

**Plana bikaranîna erdê** / Arazi kullanım planı / Land use plan

*Nexşeya ku bikaranîna erdê nîşan dide. Beşên erdê de bi çi armancê bîn bikaranîn di nexşeyê de tê nîşandan. "bajarvanî, çandinî, qada şênahiyê..."*

**Plana binasaziyê** / Altyapı planı / Infrastructure plan

*Planên ku bi armanca çareserkirina pirsgirêken kanalîzasyon, av, elektrîk (ceyranê), telefon û gihaniyê, hatiye amade kirin.*

**Plana çûnûhatê** / Ulaşım planı / Intercommunication plan

*Plana ku pirsgirêken gihaniyê û trafîkê (çûnûhat) çareser dike*

**Plana dabeşkirinê** / İfraz planı / Plot plan

*Plana ku dabeşkirina parselan li ser girava îmarê nîşan dide*

**Plana giştî** / Ana plan / General plan

*Plana mezin, fireh û ya mader. Plana ku rê nîşana planên hurgilî dike.*

**Plana herêma lokal** / Mevzii imar planı / Local zoning plan

*Planeke ku li cihêkî bê plan û ji bo cihêkî biçûk û bi armanceke taybet tê çêkirin. Ev plan bi awayekî fîzîkî derveyî plana bajêr e.*

**Plana herêma pêvek** / İlave imar planı / Addendum zoning plan

*Plana ku bi planên heyî ve tê zêdekirin.*

**Plana herêmî** / Bölgesel plan / Regional plan

*Plana ku tê de çend bajêr cih digirin. Mînak; plana herêma bajarên GAP'ê.*

**Plana hûrgilî** / Ayrıntılı plan / Layout plan:Site plan

*Planên avadaniyê yên hûrgilî. Di van planan de*

*her mafê avadanî xuya dike. Pîvaneka wan 1/1000, 1/500 in.*

**Plana îmarê ya pesendkirî** / Onaylı imar planı / Approved development plan

*Plan, Proje an jî belgeyên ku ji hêla sazîyên têkil-dar ve hatiye pesend kirin û ji bo xebatên îmarê dibin bingehe*

**Plana navenda bajêr** / Kent merkezi planlaması / City center planning

*Plana navenda bajêr ya ku cihên bazirganiyê û derdora wan nîşan dide*

**Plana peşketina navnetewî** / Uluslar arası kalkınma planı / International development plan

*Planên pîvana jor ên ku di warên civak, aborî û polîtîkayê de hatine amadekirin.*

**Plana peşketinê** / Kalkınma planı / Development plan

*Plana ku di warên civak û aboriyê de potansiyelên heyî dinirxîne û ji bo pênc salan tê amade kirin*

**Plana pêvek a avadaniya** / İlave imar planı / Addendum zoning plan

*Plana ku li plana heyî tê zêde kirin.*

**Plana revîze ya avadaniyê** / Revize imar planı / Revision zoning plan

*Ger ku plana heyî kêm bimîne li gorî pêwîstiyê ev plan tê amade kirin.*

**Plana sereke** / Nazimplan / Master plan

*Pilana sereke. Pîvaneka wan 1/5000 ê destpê dike heya 1/100 000 ê diçe. Van pilanande zêde hurgilî nîne, tenê qaideyên giştî hene. Pîlanên hurgilî li gor van qaidan tê çêkirin.*

**Plansazê çûnhatina (veguhastine) master** / Ulaşım master planı / Transportation master plan

*Planeke stratejîk e ya ji bo çûnhatina bajêr a îro û ya dahatuyê.*

**Plansazê kiryarê (peyikan::sepan::pratîk) avadanî**

*/ Uygulama imar planı / Appliance zoning plan  
Plana îmarê ya ku ji bo pratîkê esas tê girtin û pîvanên wê 1/1000 û 1/500*

**Plansazê nîzama jîngehê** / Çevre düzeni planı / Environmental plan

*Planeke bi pîvana biçûk û herêmî ye. Pîvanên wê planê di navbera 1/50000 û 1/100000ê de ne. Di vê planê de ji bo herêmê biryarên aborî, polîtîk û stratejîk tîn girtin.*

**Plansazê parêzkaran (parastinê) a avadanî** / Korumaya imar planı / Protection plan  
*Plana ku di îmarê de qadên dîrokî û xwezayî yên ku di nava bajêr de ne diparêze.*

**Plansazê şewane (tertipkera) avadanî** / Nazım imar planı / Master plan: general plan  
*Ev plan plansaziya navenda bajêr, derdora bajêr û bikaranîna erdê bajêr bi gelemperî nîşan dide. Pîvanên wê 1/2000, 1/5000 û 1/25000 in. Planên cîbicîkirinê li gor vê planê tê çekirin.*

**Plansazê tadîlatê avadanî** / Tadilat imar planı / Amendment plan  
*Guhertina plana îmarê li ser parsêlê an jî herêmeke teng.*

**Plansazê/a bajar û herêmê** / Şehir ve bölge plançısı / City and regional planner  
*Kesê/a ku di derbarê plansaziya bajêr de perwerdehî dîtiye û di wê beşê de pispor e.*

**Plansazên Bajêr** / Şehir plançısı / City planer  
*Kesên pispor ku ji çekirin û avakirina cihê jiyandê (bi taybetî jî bajar) baş fêm dikin û perwerdehiya vî karî girtine. Kesên ku di warê plansaziyê de pispor in û planên bajar û herêman li gor zagonan çêdikin.*

**Plansazî** / Planlama / Planning  
*Ji bo çekirina ebatekî ku tê plankirin.*

**Plansaziya aborî** / Ekonomik planlama / Economical planning  
*Plana ku ji bo armanca sererastkirina têkiliyên aborî yên welat an jî herêmê ji aliyê kes an jî saziyên berpirsiyar ve tê birêvebirin.*

**Plansaziya çûnûhatê** / Ulaşım planlaması / Transportation planning  
*Planeke stratejîk ya ji bo çûnûhatina bajêr a îro û ya dahatuyê.*

**Plansaziya projeyê** / Proje planlama / Project planning  
*Xebatên ji bo çekirina projê. Plana çekirina projeyê.*

**Plansazkirina cîhwarî** / Mekansal planlama / Spatial planning  
*Planên ku li gorî taybetmendiyên fîzîkî û strukturî (avahiyî) tên amade kirin.*

**Plansazkirina civakî** / Sosyal planlama / Social planning  
*Planên stratejîk ên ku ji bo çareseriya pirsgirê-kên civakî û aboriyê, tên amade kirin.*

**Plansazkirina ekolojîk** / Ekolojik planlama / Ecological planning  
*Plansaziya ku ji bo parastin û bikaranîna dewlemendî û nixên xwezayî tê kirin.*

**Plansazkirina herêm û bajêr** / Şehir ve bölge planlama / City and regional planing  
*Plansaziya herêmê û bajarî ya ku li gorî hemû pîvanan hatiye amade kirin.*

**Plansazkirina herêmê** / Bölge planlama / Region planning  
*Karê plansaziya herêmê.*

**Plansazkirina parastinê** / Savunucu planlama / Defensive planning  
*Feraseta ku di warê aborî û siyasetê de plansaziyeke stratejîk nîşan dide*

**Plansazkirina pêşketinê û rêvebirin** / Gelişme planlaması ve yönetimi / Development and management planning  
*Plansazî û rêvebirina pêşveçûnî ya cihên ku tên bikaranîn an jî jîngeha xwezayî ye.*

**Plansazkirina tendurîstiya bajêr** / Kent sağlığı planlaması / Urban health planning  
*Plana ku rewşa jiyana bajêr xweştir û rihetir dike*

**Plansazkirina xanî** / Konut planlaması / Dwelling planning  
*Plana xaniyan ên ku ji bo pêwîstiya starebûnê, tê amade kirin*

**Plastîk** / Plastik / Plastic  
*Madeya sentetîk an jî organîk ku bi bandora germahî yan jî fişarê tê şekildayîn.*

**Platform::Sekû** / Platform / Platform  
*Cihê kar lê tê kirin û cihê wê ji derdora xwe bilindtir e.*

**Platîn** / Platin / Platinum  
*Elementeke ku hejmara wê ya atomê 78 e. Metaleke giran, girîng û dikare bê lêdan e.*

**Plazma** / Plazma / Plasma  
*Şileka di nav xwînê de ku tê de sorgilorik û spî-gilorik hene.*

**Plûton** / Pluton / Pluto  
*Gerstêrka herî dûr a ji Rojê bû, lê niha Plûton ji nav rêza gerstêrkan hatiye derxistin, ew ne gerstêrk e, ew laşekî qeşayî ye li derdora Rojê dizivire.*



**Pola** / Çelik / Steel

*Amêjena ku hinek karbon û hesin tê de ye. Bi avê tê hişkkirin.*

**Polarîskop** / Polariskop / Polariscope

*Amûra ku ji bo ronahî polarî bûye an jî xwezayî ye were fêmkirin.*

**Polîgon** / Poligon / Plygon

*Ciyê guleberdanê.*

**Polîgona girtî** / Kapali poligon / Closed polygon

*Zincira poligonan ya ku destpêk û dawî heman xal. Zincir ji xaleke koordinat diyar detpêdike û dawiyê disa li wê xalê tê girêdan*

**Polîgona paldayî** / Dayali poligon / Based on the polygon

*Rista poligonê ya paldayi. Destpêk û dawiyêde poligonek xwedi koordinat heye.*

**Polîmer** / Polimer / Polymer

*peyvekê yewnanî ye, polî (gellek), meros (parçe, lîç) an ku gellek parçe ye. ji monomeran (yek-parçe) pêk tê.*

**Polîtîkaya bajarsaziyê** / Kentsel politika / Policy planning

*Polîtîkaya debarê bajarvaniyê de, ramanên der heqê bajêr de.*

**Polîtîkaya zewiyê (erd)** / Arazi politikasi / Land policy

*Program û nêrînen bikaranîna zewiyan, di rajên pêşde.*

**Polonyûm** / Polonyum / Polonium

*Elementeke ku hejmarê wê ya atomê 84 e.*

**Pompe** / Pompa / Pump

*Amûreke ku madeyan (bi taybetî jî madeyên gaz û şilek) ji cihêkî dişîne cihêkî din.*

**Pompeya Vakûmê** / Vakum pompasi / Vacuum pump

*Pompeyek di her du serên pompeya xwe de pestoyek negatîf dide, kêşandinek bi zexmî dike,*

*şîr doşînê jî kar tînin, amaneke ezmûnên kîmyewî ye jî*

**Pompeya xîzê** / Çakıl pompası / Sand pump

*Pompeya ku xîz pê kaş dibe.*

**Porteqal** / Portakal / Orange

*Fekiyeke ji malbata narincan*

**Potansiyel** / Potansiyel / Potentiality: Potential

*Enerjiya ku ne xwedî tevger e.*

**Potasyûm** / Potasyum / Potassium

*Elementeke ku hejmarê wê ya atomê 19 e.*

**Pozîtron** / Pozitron / Positron

*Pariya bingehîn a xwedî bara pozîtîf e ku di hemû atoman de heye,*

**Pres::Pestan** / Pres / Press

*Amûra bi awayekî mekanîk şidandina objeyekê.*

**Profil** / Profil / Profile

*Rewşa guhertinê bilindahiyên di navbera du xalên ruerdê*

**Proje** / Proje / Project

*Pêşnumeya ku kirina an jî çêkirina wê tê xwestin.*

**Projektor** / Projektör / Projector

*Amûreke ronîkirinê.*

**Protein** / Protein / Protein

*Pêkhatiyek organîk e. amînoasîd mîna zîncîkekê ji hevûdu (êkûdu) re bîr girêdan proteîn pêk tînin.*

**Proton** / Proton / Proton

*Her hebika di nava dendîka atomê de ya ku barekî (+1) pozîtîf ê elektrîkê hildigire.*

**Pûjan (Nane) a bejî::Pûjana zewiyan** / Kir

*nanesi::tarla nanesi / Mentha arvensis*

*Ji hişkirina pelên wê giyayê baharat tê destxistin. Çiyayek Çiyayî ye.*

**Pût::Alif** / Hayvan yemi / Animal feed

*Xwarina ajalên kedî.*

# { Q }

**Qad::Meydan** / Meydan / Square

*Qada herî fireh a ku di navenda bajêr de ye.*

**Qada perwerdehiyê** / Eđitim alani / Education zone

*Di planên avadaniyê (îmar) de cihê ku tenê ji bo avahiyên perwerdehiyê hatiye veqetandin.*

**Qada xaniyan** / Konut alani / Housing zone

*Di planên avadaniyê (îmar) de cihê ku tenê ji bo xaniyan hatiye veqetandin.*

**Qada avahiyân** / Tesis alani / Plant area

*Ew cihê ku bo xizmetdayîna gel hatiye cihêkirin. Ku li van deran avahî bo vê mebestê çêdibe.*

**Qada Avahiyên Tenduristiyê** / Sađlık tesis alani / Healthcare field

*Di planê de qada ji bo avahiyên tenduristiyê hatiye veqetandin.*

**Qada avahiyên turîzmê** / Turizm tesis alani / Tourism facility

*Cihê ku avahiyên turîzmê lê tene çêkirin.*

**Qada avakirinê** /Yapı inşaat alani /Construction area

*Qada ku avahî tê de tê lêkirin.*

**Qada avanî** / Meskun alan / Residential area

*Qada xani lê hatin çêkirin. Qada avahi liser heyi.*

**Qada avdaniyê** / Sulama alani / Irrigation area

*Cihên çandinî yên ku bi pergala avdaniyê, tene avdan.*

**Qada avzêm** / Sulak alan / Wetland

*Nexşeyêde ji bo qadên av jê dertê, hertim şil û ji sewalanre maluvaniyê dike tê gotin.*

**Qada Bajarî ya Niştecihûnê** / Kentsel yerleşik alan / Urban built-in

*Cihên ku avahî lê tene çêkirin an jî hatine çêkirin.*

**Qada bazirganiyê** / Ticari alan / Commercial area

*Di planên avadaniyê de cihê ku avahiyên bazirganî lê tene çêkirin.*

**Qada benderê (lengergeh)** / Liman alani / Harbor area

*Qada li kêleka deryayê (an jî gol) ku tê de xebatên benderê tene kirin.*

**Qada berên taybet ya heremî** / Bölgeye özel ürün alani / Site-specific product area

*Ew herêma ku bi taybetî bo berek şîngeh e.*

**Qada bi çîl::Makiyî** / Makilik / Maquis groves

*Cihên ku dar û deviyên li herêma deryaya spî lê digîjin.*

**Qada bifikare ya jeolojîk** / Jeolojik sakıncalı alan / Geological reserved area

*Cihên ku di warê erdnasiyê de ji bo lêkirina avahiyân xetere ye.*

**Qada bikaranîne ya li gor daxwazê** / Tercihli kullanım alani / Preferred area of usage

*Cihên ku li gorî xwestekê wekî cihêkî turîstîk an jî cihê avahî tê plan kirin.*

**Qada çandiniyê** / Tarım alani / Agricultural land

*Di planê de qada ku çandinî li ser tê kirin. Ji bo çandiniyê hatiye veqetandin.*

**Qada daristanê** / Orman alani / Forest area

*Di planê de qada ku ji bo daristanê hatiye veqetandin.*

**Qada depokirina sûtemeniyê** / Akaryakit depolama alani / Fuel storage area

*Qadên ku petrol an jî sotemenî tene depo kirin.*

**Qada depokirinê** / Depolama alanı / Storage area  
*Cihê ku ji bo berhemên pîşesaziyê (anjî her tişt) tîn lê danîn.*

**Qada destûrnameyê** / Ruhsat alanı / License area  
*Qada ku destura çêkirina avahiyê hati dayin.*

**Qada elektrîkî (Karebayî) ::Biyavî karebayî (elektrîkî) ::Biwara karebayî** / Elektrik alanı / Electric field  
*Tekên ku bi sedema barên elektrîkî çêdibin. Qada li dora barên elektrîkê ya ku hêzên elektrîkî bandor li ser dike. Nîşana wê "E", Yekeya wê Volt/metre*

**Qada gelêşa hişk** / Katı atık depolama alanı / Solid waste landfill site  
*Ew cihê ku ji aliyê rêveberiyên herêmî ve ji bo jêmayên hişk hatiye veqetandin.*

**Qada golfê** / Golf alanı / Golf course  
*Qada ji bo lîstika golfê hatiye veqetandin.*

**Qada Grîngiyên Jîngehî** / Ekolojik öneme sahip alan / Ecological importance area  
*Di planê de qada ku ji aliyê ekolojîyê ve girîngiya wê heye.*

**Qada hawirdorê** / Mücavir alan / Municipal adjacent area  
*Qadên ku ne di nav sînorên şaredariyê de ne lê şaredarî kontrol dike.*

**Qada hebûnên çandî** / Kültürel varlık alanı / Area of cultural property  
*Herêma ku ji aliyê çand û hunerê ve dewlemend e.*

**Qada înerî** / Gazsız bölge / Inert area  
*Di nava kanê de cihê ku gazên xeternak nahe-wîne.*

**Qada karesatê** / Afet alanı / Disaster area  
*Herêma ku bi bandora lehî, erdhêj (bûmelerze) hwd hatiye herifandin.*

**Qada karsaziyê** / İşletme alanı / Business area  
*Di vê heremê de karsaziyên cûr bi cûr bihevve niş-tecîh dibin. Bazirganî lê van herêman tê kirin.*

**Qada karxebatên bajarî ya ji bîfî xaniyan** / Konut dışı kentsel çalışma alanı / Residential non-urban study area  
*Cihên ku bazirganî lê tê kirin. Li vê herêmê xanî nîn in, hemû avahî ji bo bazirganiyê ne.*

**Qada kesk a aktîf**/Aktif yeşil alan/Active green space  
*Qada kesk a lebat. Qadên ku ji aliyê gel ve raste-rast tîn bikaranin. Park û baxçeyên zarokan û rek-reasyon qadên kesk ên lebat in.*

**Qada lehiyê** / Taşkın alanı / Flood plain  
*Ew derên ku bi xetera avrabûnê gef dixwe.*

**Qada leşkerî** / Askeri alan / Military sites  
*Di planê de qada ku tenê ji bo xebatên leşkerî hatiye veqetandin.*

**Qada lîstikê** / Oyun alanı / Playground  
*Pilana imarêde qadên ji bo lîstikan hati veqetan-din.*

**Qada lîstikê ya zarokan** / Çocuk oyun alanı / Child-  
ren's playground  
*Pilana imarêde qadên ji bo lîstikên zarokan hati veqetandin.*

**Qada Mêrgê::Mêrg** / Mera alanı / Pasture land  
*Qadên bi çêre yên ku havîn û zivistanê tîn bika-ranîn.*

**Qada mîrata çandî** / Kültürel miras alanı / Cultural heritage site  
*Herêma ku nîrxên maddî û manevî di hindurê xwe de dihevwîne.*

**Qada Mugnatîzî::Biyavî Mugnatîzî::Biwarî Mug-natîzî** / Magnetik alanı / Magnetic field  
*Tekên ku bi sedema barên elektrîkî çêdibin. Qada li dora barên elektrîkê ya ku hêzên mugna-tîzî bandorê lê dikin. Nîşana wê "B", Yekeya wê T (Tesla) an jî G (Gauss)*

**Qada nivîsê** / Yazı bölgesi / Text area  
*Cihê nivîsê tê nivîsandin.*

**Qada parastî** / Koruma alanı / Sanctuary  
*Qadên ku xwedî taybet û ji bo vê taybetiya xwe tê parastin.*

**Qada Parastin û Pêşvexistina Jiyana Kovî** / Yaban hayatı koruma ve geliştirme alanı / Wildlife protection and development area  
*Herêma ku tixubkirî bi hinceta yekîtiya ekosîs-tema ajal u nebatan bê parastin û pêşvexistin*

**Qada parastina xwezayê** / Tabiat koruma alanı / Nature conservation area  
*Qada ku ji bo xwezaya wê were parastin û bi destê mirovan neyê xerakirin hatibe veqetandin.*

**Qada Parastinê ya Leşkerî** / Askeri güvenlik bölgesi koruma alanları / Military security zone conservation areas  
*Di pilana îmarê de ji bo parastina devletê tesî-sen pir girîng e.*

**Qada Pêşketina Bajarî** / Kentsel gelişme alanı / Urban development area

*Heremên ku di mezinbûna hejmara bajêr de dê bên avakirin.*

**Qada pîşesaziyê** / Sanayi alanı / Industrial area  
*Di planê de qada ku ji bo palûke û kargehan hatiye veqetandin.*

**Qada rekreasyonê** / Rekreasyon alanı / Recreation area  
*Ji bo bajarîyan qadên seyranê.*

**Qada rûniştgeha gund** / Köy yerleşim alanı / Residential area of the village  
*qada ku gund lê cihbuyi, gund li ser rûnişti. Rûniştgeha gund.*

**Qada sererastkirinê** / Düzenleme alanı / Land arrangement area  
*Mulkiyeta kadastryoî li gor plana îmarê an jî parselasyonê ji nû ve tê sererastkirin. Şêwe û sînorê parsêlê ji nû ve tê diyarkirin.*

**Qada sergoyê:** **Qada depokirina gilêşan** / Çöp depolama alanı / Landfill site  
*Qada ku gelfîşeyên bajêr lê tên berhevkerin. Li van deran bermayiyên kirêt dikarin bîn paqijkirin û bêzîrakerin.*

**Qada seyranê** / Kamp alanı / Camping area  
*Cihên ku mirov lê bigerin û şeva xwe lê derbasbikin.*

**Qada şênahî** / Yeşil alan / Green space  
*Pilana imarêde ji qadên park, baxçê zarokan, refuja nava rîyan, baxçê saziyên fermi, qadên leşkeri, binê xetên kehrebayê yê mezin û reqreasyonêre qada kesk tê gotin.*

**Qada şênahî ya pasîf** / Pasif yeşil alan / Passive green space  
*Qada kesk ya tebat. Qadên ku rasterast ji aliyê gelve nayên bikaranin. Ji bili park, baxçê zarokan û reqreasyonan qadên din yê tebatin.*

**Qada şil** / Islak alan / Wet area  
*Qada şil buyi, qada şil dimine. Qada şil dibe.*

**Qada Teht / Kayalık taşlık alan** / Rocky area  
*Cihê ku zemîna wê ji kevir an jî zinarê pêk tê.*

**Qada turizmê:** **Qada geştiyariyê** / Turizm alanı / Tourism area  
*Ew cihên ku bi mebesta geryanê tê bikaranîn.*

**Qada werzîşê ya herêmî** / Bölgesel spor alanı / Regional sports ground

*Cihên ku bi mebesta werzîşê tên karanîn ku ji hêla pîvana wan mezinin.*

**Qada xeternak** / Riskli alan / Risk area  
*Cihên ku ji bo avakirana bajêr ne rast e. Mînak: Herêma erdhêjî.*

**Qada xîzî:** **Qada Sîlikî** / Kumul alan / Dune field  
*Herêma ku bi xîz (qûm) hatiye dorpêçkirin.*

**Qada zanîngehê** / Üniversite alanı / University area  
*Di planê de qada ji bo zanîngehê hatiye veqetandin. Kampûsa zanîngehê.*

**Qadên karê navendî** / Merkezi iş alanları / Central business district  
*Di planê de ji cihên kargeh û cihên bazirganiyê re tê gotin.*

**Qadên palûkeyên girêdayî çandiniyê** / Organize tarım alanı / Organized agricultural area  
*Di planê de ji cihên tesîsên mezin yê ji bo çandiniyê.*

**Qadên Parastî** / Sit alanları / Protected areas  
*Qadên ku ji bo sedemên avahiyên kevnare tê de ne, guhertin tenê bi destûr tên çêkirin.*

**Qadên Parastî yê Xwezayî** / Doğal sit alanı / Natural protected area  
*Qadên ku di xwezaya xwe de parastî ne.*

**Qadên sît ên dîrokî** / Tarihi sit alanı / Historical sites  
*Qadên kevnare ku berê mirov tê de jiyan kirine.*

**Qaderêza kesk** / Yeşil kuşak / Green belt  
*Qadên kesk û yê li peyhev tên. Zincireya qadên kesk.*

**Qam** / Boy / Height  
*Dirêjahiya ji binî heta serî.*

**Qanûna biosavart** / Biosavart kanunu / Law of biosavart  
*Vegotina matematîkî ya qada manyetîkî bi awayê tezûya ku wê çêkirîye nîşan dide.*

**Qapan** / Kantar / Weighbridge  
*Alava ku giraniya tiştêkî diwezinîne*

**Qazan:** **Boylar** / Kazan / Boiler  
*Derdana mezin û kûr a ku ji bona germahiyê an jî bo tiştên din av an şiv tê de tê kelandin.*

**Qedexe** / Yasak / Ban  
*1. Fermana nekirinê, astengiya fermî 2. Heram.*

**Qedexekirin** / Yasaklamak / Ban  
*Karê astengkirinê.*

**Qefîl** / Asma kilit / Padlock  
*Miftêya ku bi çengel e û çengelê wê di qulpên derî re derbas dibe û tê girtin.*

**Qelîstek::Xane::Kel::Kert** / Yiv / Groove  
*Xetên li ser rûxarê yên ku ji çal û niçikan pêk tên*

**Qerisî** / Donmuş / Frozen  
*Rewşa madeyê ku ji şilekî derbasî req (hişk) bûye.*

**Qerisîn::Cemidîn** / Donma / Freezing  
*Guherîna rewşa made ya fizîkî ji şilek ber bi req (hişk) î.*

**Qerisîn::Cemidîn** / Donmak / Freeze  
*Hişkbûyîna madeyên şilek bi sedema kêmbûna germahiyê.*

**Qernefil** / Karanfil / Carnation  
*Kulîlkeke bi bîna e. Bi gelek rengan vedibe lê bi taybetî qernefilên sor û spî navdar in. Ji bo xemilandinê jî tên bikaranîn.*

**Qerta vedorê** / Devre kartı / Circuit board  
*Ji bo çêkirina vedora elektronîkî lewhêya ku tê bikaranîn. Hêmanên elektronîk li ser têne danîn.*

**Qesp::Xurme** / Hurma / Date  
*Fêkiyeke tropîk e. Tehma wê şîrîn e. Piştî ku tê hişkkirin tê asta xwarin an jî firotinê.*

**Qesr::Koşk** / Saray / Palace  
*Avahiyên mezin û bişemir ên ku hukumdar an jî rêberên olî lê dijîn.*

**Qeta dirêjî** / Boykesit:uzunlamasına / Longitudinal  
*Birîna dirêjahiyê. Profîl derxistina dirêjahiyê.*

**Qetên zingarî** / Oksit tabakası / Oxide film  
*Kevîren ku ji tebeqeya aven binerdf jortirin, li ber bandora avê oksîde dibin. Ew qada ku oksîdî buye jê ra QADA OKSÎDÎ tê gotin.*

**Qetîn** / Kopma / Breaking  
*Tiştên bi kaşandinê, bi rizînê û bi hêzên hwd ji hev be re tê gotin.*

**Qetîneka berî** / Enkesit / Cross-section  
*Di projeyan de bilindahiya xalên berkî nîşan dide.*

**Qewar** / Oyuk / Hollow  
*Cihê qewartî, hundurê wê vala û çalik.*

**Qeware::Qebare** / Hacim / Volume  
*Valahiya ku heyberek dadigire. Hemû made xwedî qebare ne. Qebare bi bariste û cih re eleqedar e. Qebare bi m3, lî tre, cm3 û hwd. tê pîvan.*

**Qewartin** / Oymak / Carve  
*Bi kolanîne derxistina nava heyberekî.*

**Qiloç** / Boynuz / Horn  
*Hestiyên tûj û dirêj ên ku di serê hin ajalên de derdikevin.*

**Qinc::Şakûl** / Çekül / Plumb  
*Di hiş û mêjiyê mirov de cihê heyber an jî ramanekî.*

**Teka (karîgeriya) hallê** / Hall elkisi / Hall effect  
*Gihênerekî ku tê de tezû (herk) derbas dibe û di nava qada elektromagnetîk de ye vekêşan çê-dibe.*

**Teka (karîgeriya) zeeman** / Zeeman etkisi / Zeeman effect  
*Rewşa guherîna xêzên tîrêjên ronehiyek ku di nava qada elektromagnetîk de ye.*

**Têkberên guhêzbar** / Menkul (taşınır) eşya / Chattel good  
*Têkberên ku cihê wan dikare bên guherandin.*

**Têketin** / Ana giriş / Main entrance  
*Beşa ku mirov jê dikeve hundirê avahiyên.*

**Têketin** / Giriş / Login  
*Piştî endambûn û qeydbûna malper an jî sîstemekê bi navê bikarhêner û şifreyê ketina hundir. Destûr stendin ji bo vekirina rûniştineke di înternetê de.*

**Têketin** / Giriş / Sign in  
*Cara yekem ku mirov xwe li malperê yan jî sîstemekê zêde dike. Di vir de mirov miftteyeye taybet digire.*

**Teknîk** / Teknik / Technical  
*Di huner, zanist û pîşeyan de bikaranîna azîne û rêbazan.*

**Teknolojiyên agahiyê** / Bilgi teknolojileri / Information technology  
*Amûrên ku ji bo jêkirin, şandin, bikaranîn û ragihandina agahiyê.*

**Teleferîk** / Teleferik / Telfer  
*Di navbera du ciyên ji hev dûr de, di hewa re, di ser tîlan re çûn û hatin.*

**Teleskop** / Teleskop / Telescope  
*Ji awênayan çêbûye û ev amûr tiştên dûr nêz dike û wek rastiya wan nîşan dide.*

**Televizyon** / Televizyon / Television  
*Amûreke teknolojîk e ku dikare tiştan qeyd bike, bişîne û bi wêne û deng dîsa nîşan bide.*

**Telgraf** / Telgraf / Telegraph  
*Pergala telekomînkasyonî ya di navbera du navedan de agahdarkirina bi rêya nîşanên diyarkirî, peyaman vediguhezîne, êdî nayê bikaranîn.*

**Têlik** / İnce tel / Thin wire  
*Têla zirav a ku mirov tiştan pê bi hev ve girêdide.*

**Telp** / Çökelti / Precipitate  
*Di têkelekî şilavî de kumişîna madeyên hişk e.*

**Teमाषevan** / Seyirci / Audience  
*Kesê ku tiştêkî, bûyerekê dibîne, an jî li devereke dinêre.*

**Tembûr** / Tambur / Drum  
*Tembûr an jî saz, amûreke muzîkê ye.*

**Temîr** / Onarım / Repair  
*Çêkirina avahî, makîne an jî amûrekî xerabûyî.*

**Temlîk** / Temlik / Assigned  
*Deyndariyêde dewirkirina mafekî. Buyera deyndanê an jî yê xwedî mafê sitandinê bixwaze bi dax-nameyêke nivîskî dikare mafê xwe dewri yekî din bike. Ji vê kariyeriyêre temlik tê gotin.*

**Tengayî** / Darlık / Shortage  
*Di alî aboriyê de ketina rewşeke xirab.*

**Tengbûn** / Daralma / Contraction  
*tiştêkî ji aliye germe an jî sermaye de vere biçukbun.*

**Tenghoke::Goşeya teng** / Dar aç / Acute angle  
*Goşeya nîrxê wê 90 pileyê biçuktir.*

**Teodolît** / Teodolit / Theodolite  
*alava nexşegeriyê ya goşe dipive. Peljena pivanê bi rêjeya saniyeyê.*

**Teorî** / Teori / Theory  
*Zanyariya razber ku ji pêkanîne cuda û serbixwe tê nîrxandin.*

**Teoriya plansaziye** / Planlama kuramı / Planning theory  
*Agahî û bîrdoza di derbarê plansaziye de.*

**Teqandî** / Patlak / Outbreak  
*Tiştê ku bi bandora fişara hûndirîn an jî bi sedemeke cuda parçe bibe û ji hev belav bibe. "Pence-reya erebeyê teqiya."*

**Teqandin** / Patlatma / Blasting; Firing; Ignition  
*Rêbaza ku ji bo felîşandina madenan tê bikaranîn.*

**Teqemenî::Teqok** / Patlayıcı / Explosive  
*Madeyên kimyayî yên ku bi bandorekê diteqin.*

**Teqemeniya nuklerî** / Nükleer patlayıcı / Nuclear explosive  
*Teqemenên ku bi madeyên nûkleerî çêdibe û bi barkirina notronê teqandin.*

**Teqîn** / Patlamak / Explode: Fulminate

1. Bandora teqemeniyê xuya bûn, bi bandora fişara hûndirîn parçe bibe, ji hev belavbûna objeyan. 2. Dengê teqemeniyê hatin, gurmîn.

**Têr** / Doymuş / Saturated

1. Giyanewerê ku pêdiviya wî bi xwarinê tune ye; ne birçî, ziktîjî, têr û tesel, mîşt tijî 2. Tişt-tekî/yekî bi qasî ku pêwîst dibe.

**Teraştin** / Yontma / Ashlar

Ji bo teşedanê, bi amûrek tûj jêkirin an jî birîna dervayê tiştêkî.

**Terazûya boriyê** / Hortum terazi / Water level

Amûrek ji bo pîvana bilindahiya di navbera du qotan e. Mirov avê berî nav boriyê dide û pê dipîve.

**Terikîn::Derizîn** / Çatlama: Yarik (kurumaya bağlı olarak çatlama) / Crack (cracking due to desiccation)

Jihevqetîna tiştêkî ku pêşiyê mîna xêzekê çêdibe û ev xêz çal û fireh dibe.

**Têrkirin** / Doyurmak / Satiate

1. Tijîkirin (zik) 2. Dagirtin \* "Biharê xwe têr neke, payîzê xwe bi derengî nexe."

**Termîk::Germî** / Termik / Thermic

Beşa fizîkê ya ku bi hilberîn û veguheştina germahiyê re eleqedar e.

**Termodînamîk** / Termodinamik / Thermodynamics

Beşa fizîkê ya ku peywendiyên di navbera enerjîya germahiyê û enerjîya kînetîkê de dinirxîne.

**Termoelektrîk** / Termoelektrik / Thermoelectric

Beşa fizîkê ya ku peywendiyên di navbera enerjîya germahiyê û enerjîya elektrîkê dinirxîne.

**Termograf** / Termograf / Thermograph

Belavkera germahiyê.

**Termokîmya** / Termokimya / Thermochemistry

Beşa kîmyayê ya ku li bûyerên termîk ên ku di rekosiyonên kîmyayî de pêk tên dinêre.

**Termometre::Germometre::Germpîv** / Sıcaklık ölçer / Thermometer

Amûra ku germahiyê dipîve.

**Termos** / Termos / Thermos

Firaqa (amûra) ku germahiya şilemeniyê di nav xwe de diparêze.

**Termosîfon** / Termosifon / Thermosiphon

Amûra ku jê ava germ tê bidestxistin.

**Termostat** / Termostat / Thermostat

Amrazek karê mîhengê germahiyê ye, germahiyê li gorî xwestinê digire.

**Tescîla yekser** / Doğrudan tescil / Directly to the registered

Bi riya kurt tomarkirina erdê ya li ser navê xwedî.

**Teşe** / Biçim / Style

Xuyakirina tiştêkî ya ji derve ye.

**Teşenasî::Şewenasî::Morfolojî** / Biçim bilimi / Morphology

Beşa zanistiyê ya ku li ser teşeyan (form) lêkolînê dibe.

**Teşeron** / Taşeron / Subcontractor

Kesê ku ji lixwegirê esasî hinek karan digire ser xwe. Lixwegira 2. emîn.

**Teşeya erdî** / Arazi şekli / Landform

di encama liv û tevgerê têkilzemînê û bandora xwezayî de teşe girtina serzemînê

**Tevger::Liv::Çule** / Hareket / Movement

1. Bizav, hereket 2. Temtêl \*\*Ava golan bê tevger e."

**Tevgera cîguherê::Liva cîguherê** / Ötelenme hareketi / Translational motion

Bizawtina (livîna) zelînê ya heyberekê ye, guherîna cihêkê ber bi cihêkê ve berek û alî pendî ne.

**Tevgera gerîngeha sererast** / Düzgün dairesel hareket / Uniform circular motion

Maddeki derdoraxwe da lezeka (tews) pedandi bigere.

**Tevgera Lerzî::Liva Lerzî** / Titreşim hareketi / Vibrational motion

Bizawtina libikan (hebikan) ber bi jor û jêrî û ber bi rast û çepê ve ye

**Tevgera zivirandinê** / Dönme hareketi / Rotational motion

livîna hebikan ya zivirînê

**Tevlihev** / Karmaşık / Complicated

mînak: Ev dawa ha pir tevliheve.

**Tew** / Kıvrım / Fold

Cihê tewandî yê heyber an jî rûyêkî.

**Tewandin::Çemandin** / Bükmek / Bend (to)

Xwarkirin.

**Tewang** / Büküm / Twisting  
*Tiştêkî ji nava xwe xwarbûyî.*

**Tewera asoyî::Tewera berwar** / Yatay eksen  
*Horizontal axis / Eksena dirêjkî ya ne meyîldar.*

**Tewera optîk** / Optik eksen / Optical axis  
*Xêza xeyalî ya ku di navenda objektîfê re derbas dibe. Ev xêz wek tîrêjekê bê şikestin, rasterast di navenda objektîfê de diçe.*

**Têwerdan** / Çalkalamak / Shake  
*Bi hejandinê lihevixistina av an jî madeyekî şilekî di hundirê fîraq an jî makîneyekî de.*

**Tewereya (eksen) lînêrînê** / Yönelme ekseni / Axis orientation  
*Xeta eksena ku lê tê nêrîn. Xêza dirêjî hedefê dibe.*

**Tewl::Tewilxane** / At ahır / Stable  
*Ciyê xwedîkirina hespan.*

**Tewle** / Manej / Manege  
*Cihê xwedîkirin û perwerdehiya hespan.*

**Têzan::Zanraw::Nasdar** / Bilinen / Known  
*Di matematîkê de çendahiya aşkere (kîfş), çendahiya diyar. Ji aliyê her kesî ve tê zanîn.*

**Tezû::Lozew::Tewjim::Herk** / Akım / Current  
*Tevgera parçeyên ku barê elektrîkê hildigirin. Di yekeya demê de barê elektrîkê yê ku di rûqetekê de dibore.*

**Tezuya alternatîf::Tezûya pêldar::Herka alternatîf** / Alternatif akım / Alternating current  
*Herikîna barên elektrîkê bi awayekî guherbar (ne sekan) ji potensiyela zêde ber bi potensiyela kêr. Tezû carina bi aliyekî ve cara din jî bi aliyê din ve diçe.*

**Tezuyê rast::Herka rast** / Doğru akım / Direct current (dc)  
*Herikîna barên elektrîkê bi awayekî neguher (sekan) ji potensiyela zêde ber bi potensiyela kêr. Tezû herdem bi aliyekî ve diçe.*

**Tije::Tijî** / Dolu / Full  
*Tiştê ku nava wî ne vala ye, dijberî vala.*

**Tijîkirin::Tijekirin** / Doldurma / Packing  
*Dagirtin (heta dev)*

**Tik** / Tik / Click  
*Bi awayekî nerm pêlêkirina bişkokên kompîterê, bi taybetî jî yê mouse.*

**Tikandin** / Tıklamak / Clicking  
*Karê tikandinê.*

**Tîma erdî (Zeviyê)** / Arazi ekibi / Land team  
*Tîma ku pîvanên zeviyan pêktînin. Tîma karê pîvanê.*

**Tîna dûkelînê** / Buharlaşma ısı / Heat of vaporization  
*Enerjiya ku bi qasî yekeyekî şile diguherîne gazê.*

**Tîna taybet** / Öz ısı:Özgül ısı / Specific heat  
*Enerjiya pêwîst ku ji bo germahiya 1 gram made 1 C° zêde bike ye.*

**Tîner** / Tiner / Thinner  
*Ronker, teniker.*

**Tîngir::Endotermîk** / Endotermik:İsı alan / Endothermic  
*Germiyê digre (amur an jî reaksiyona kîmyevî)*

**Tînpîver::Kalorîmetre** / İslölçer / Calorimeter  
*Amûra ku tîna cihekî dipîve.*

**Tîp** / Harf / Letter  
*Tîp, sembolên ku di pergala nivîsîna yê alfabetîk de ji bo dengên di zimên de tên bikaranîn*

**Tîpên derbasdar** / Geçerli harfler / Valid chars  
*Ew tîpên ku tên pejrandin.*

**Tîr** / Ok / Arrow  
*Darikê zirav û dirêj ê ku di serê wî de hesinekî tûj heye û bi kevane tê avêtin.*

**Tîr::Çir::Xest** / Yoğun / Intensive  
*Di qebareyekê de mêjera zêdetir. Ji bo şilekan dijberî "ron"ê ye.*

**Tîr::Tîrik** / Oklava / Rolling pin  
*Darikê ku pê nan tê vekirin.*

**Tîrêj** / Işın / Beam  
*Qevda (baq) ronahiyê.*

**Tîrêja ronahiyê** / Işık ışını / Light beam  
*Qevda (baq) ronahiyê.*

**Tîrêja x** / X ışını / X-ray  
*Bi navê tîrêjên rontgenê jî tê zanîn. Tîrêjên ku xwediyê enerjîya di navbera 0. 125 kev û 125 kev de ne.*

**Tîrêjên Alfayê (α)** / Alfa (α) ışınları / Alpha (α) rays  
*Tîrêjên Alfayê (α)*

**Tîrêjên Betayê (β)** / Beta (β) ışınları / Beta (β) rays  
*Şewla hebika atomê ya Betayê ye, gava atom ji hev dibe ev şewlê dertê holê, ji tîrêjka Alfayê de zêdetir bi bandor e.*

**Tîrêjên Gamayê (γ)** / Gama (γ) ışınları / Gamma (γ) rays  
*Şewla hebika atomê ya Gamayê ye, gava atom ji hev dibe ev şewlê dertê holê, ji tîrêjka Alfayê û Betayê de zêdetir bi bandor e.*

**Tirş** / Ekşi / Sour  
*Ji bo tehma simaqê tê gotin.*

**Tirûş** / Dayanım / Endurance  
*Hêza sekanê (statîk) ya avahiyên, li hemberî erdhej, bar û hwd. bertekên derve. "Tirûşa xaniyên axîna ji tirûşa xaniyên betonî kêmîr e.*

**Tîtanyûm** / Titanyum / Titanium  
*Elementa kû hejmarê wê ya atomê 22 ye û remza Ti ê tê pêname kirin. metaleke beriqok, sivik, bi hêz û zingarnegire (korozyon)*

**Tîtrasyon** / Titrasyon / Titration  
*Reaksiyona bi indîkatorê zelalkirina madeyên heft*

**Tomar** / Kayıt / Record  
*Wêne, deng an jî agahiyeke ku li ser bandên manyetîk tê hiştin.*

**Tomar bike** / Kaydet / Save  
*Ji bo ku agahî di dest de bimîne karê ku tê kirin.*

**Tomarkirina berdest** / Yedek depolama / Backup storage  
*Li dijî wendakirina daneyan tomar kirineke berdest.*

**Ton** / Ton / Tone  
*Nasandina giraniya 1000 kiloyî.*

**Topograf** / Topograf / Topographer  
*Pîsporê/a topografayê.*

**Tor** / Network::Şebeke / Network  
*Sîstema ku ji bo ragihandina navbera cî yan jî tiştan hatiye çêkirin.*

**Tora grîd** / Karelaj ağı / Grid network  
*Tora ku xetên (xêzên) koordinatan nişandide. Goşeya hevbira wan 90 dereceye. X"za berjor diçe koordinata x ê, ya berwar diçe (asoyi) koordinata y yê nişandide.*

**Toryûm** / Toryum / Thorium  
*Elementeke radyoaktîf ku di hilberîna enerjiya atomê de tê bikaranîn. Hejmarê wê ya atomê 90 e.*

**Tov** / Tohum / Seed /  
*Bizirê hêşînahiyê.*

**Transîstor** / Transistör / Transistor  
*Amûreke elektronîk e ku sê lingên wê hene. Du cure transîstor hene npn û pnp.*

**Tranway** / Tranvay / Tramways  
*Amyareke ragihandinê ye, bi piranî bi elektrîkê dixebite. Li ser rêhesinê diçe lê hin cureyên nû hene ku li ser çerxeyan pêçkeyan diçin.*

**Trapez** / Trapez / Trapeze  
*Amûreke jîmnastîkê ku dişibe hêlanokê.*

**Trên::Şemendefêr** / Tren / Train  
*Trên yek ji amûrên veguhastinê ye. Trêna li ser rêyên hesinî diçe.*

**Trîgonometrî** / Trigonometri / Trigonometry  
*Beşekî matematîkê ye ku ji astronomiyê derketiye. Li ser pêwendiya la (kêlek) û goşeyên sêgoşeyê disekine.*

**Trilyon** / Trilyon / Trillion  
*Mîlyar car hezar, 1.000.000.000*

**Trîportor** / Triportör / Three porter  
*Wesayîta bar kişandinê ya sê tekerî.*

**Trolleybus** / Trolleybüs / Trolley bus  
*Otobusa bitêl ku bi elektrîkê dixebite û elektrîka xwe ji xetê hewayî digire.*

**Tropîk** / Tropik / Tropical  
*Rewşa keşa (climate) herêma kêleka ekvatorê ye.*

**Troposfer** / Troposfer / Troposphere  
*Tebeqaya yekem a atmosferê ye. Di vê tebeqeyê de hemû bûyerên hewayî û zindewarî tê de diqewimin. Stûriya wê li cemsaran nêzî 6 km û li ekvatorê jî nêzî 16 km'yan e.*

**Tûj** / Keskin / Sharp  
*Heyberê ku baş jê dike yan jî qul dike. "Kêr, dûzan, bivir, das, sîtrî, bizmar, mîx"*

**Tulyûm** / Tulyum / Thulium  
*Elementeke kîmyayî ye, jimareya atoma wê 69 e. Nîşaneya wê Tm ye.*



**Tûnc::Bronz** / Tunç::Bronz / Bronze  
*Amêjeneke kîmyayî ye, amêjeneke pîl, çînko û ji sifir pêk tê.*

**Tune bike** / Yok et / Destroy  
*Ji bo ku ji halê were rakirin tê tikandin.*

**Tûnel** / Tünel / Tunnel  
*Ji bo rêya avê û rêya bejahiyê, di bin çiya û der-yayê de qulên ku tên vekirin.*

**Tungsten** / Tungsten / Tungsten  
*Elementeke kîmyayî ye, nîşaneyê wê W ye, jima-reya atoma wê 74 e.*

**Tûpê (lûlik) pişkinînê** / Deney tûpü / Test tube  
*Lûleye cam (şûşe) ku seriyekî wê girtî ye û ji bo ezmûnên kîmyayî tê bikaranîn.*

**Turbîn** / Türbin / Turbine  
*Motoreke ku tê de çerx heye û ev çerx bi tesîra herkoya avê, hilm an jî gazê digere.*

**Turnîke** / Turnike / Tourniquet  
*Di derî yan jî derbasgehan de amûra ji bo ku mirov yek bi yek derbas bibin e.*

**Twanewe** / Çözünürlük / Solubility  
*Kapasîteya madeyekî ku gîrawe dikare çêbike.*



**Ûltra::Mezintirîn** / Ultra / Ultra  
*Ji hedê xwe zêdetir, di ser pîvanan re.*

**Ûltrason::Pêlên Serodeng** / Ultrason / Ultrasound  
*Frekansa wê di navbera 20 herz û 10 megaherzan de ye. Frekanseke ku deng nayê mirovan.*

**Ûltrasonîk::Serodeng** / Ultrasonik / Ultrasonic  
*Frekanseke pir zêde ye. Ew qas bilind e ku ev dengê zêde nayê mirovan.*

**Ûranyûm** / Uranyum / Uranium  
*Madeyeke radyoaktîf e. Numreya atoma ûranyûmê 92 ye.*



**Vagon** / Vagon / Carriage

*Beşeke trêne ciyê rêwî yan jî ciyê bar.*

**Vagon** / Vagon / Railway

*Bar û rêbiwar pê tîn kişandin.*

**Valahî** / Boşluk / Clearance:Margin:Pocket

*Qada ku tişteke li ser tune ye.*

**Valahî::Vakûm** / Boşluk / Vacuum

*Ciyê ku tê de qet tişteke tune ye.*

**Valf** / Valf / Valve

*Devik, wane, derxûn.*

**Vantîlator::Bajen::Bagork** / Vantilatör / Ventilator

*Amûra ku bi alîkariya perwaneya xwe bayê tev-digerîne. Makîneya ku bawêşînê dike.*

**Vegeerîne** / Geri al / Back

*Ji bo ku rûpela derbasbûyê dîsa vebe tê tikandin.*

**Veguhastin** / Transport / Transport

*Cih guhertin. Neqilkirin.*

**Veguhastina asoyî** / Yatay nakliyat / Horizontal haulage

*Barkêşiya ku ji kanê bi alîkariya pergaleke rêhesinî yan jî bandê bi awayekî asoyî tê kirin.*

**Veguhastina rêhesinî** / Raylı nakliyat / Track haulage

*Barkêşiya ku bi rêhesinê tê kirin.*

**Veguhêr** / Dönüştürgen:konvertir / Converter

*1. Amûra ku sînyala elektrîkê diguherîne (Ji AC dike DC an jî ji DC dike AC) 2. Bernameya ku formatê agahiyê diguherîne.*

**Veguhêrîn** / Dönüştürmek / Convert

*Bidestxistina sînyaleke analog ji sînyaleke dijî-tal an jî dijberê vî karî.*

**Veguhêrîn::Metamorfizm::Veguhezîn** / Başkalaşım

*Metamorphism / bi bandora navxweyî û derveyî an jî bi bandora fizîkî û kimyayî ji drûvekî veguherîna drûvekî din*

**Vehelîn** / Çözünme / Dissolution

*Di nav maddeyêke helîner de belavbûn an jî helîna maddeyêk din*

**Vehelîn::Buhujîn** / Erime / Melting

*Guhêrîna rewşa maddeyêkî hişk (req) ku bi alîkariya tîn û pestoyê ber bi şilekiyê ve.*

**Vehonan::Honan** / Örne / Knitting

*Lêkirina dîwar.*

**Vejena xwezayî::Vîzena xwezayî** / Doğal enerji /

Natural energy

*vejena kû ji rê û rêbazên xwezayî û ji çavkaniyên xwezayî tê hilberîn*

**Vekêşandî::Pît** / Gergin / Tight

*Rewşa alavên di bin bandora kişandinê de ye.*

**Vekêşayî** / Gergin / Tense

*Rewşa metroya hati vekêşandi.*

**Vekirin** / Açmak / Open /

*Dijberî peyva "girtin"ê ye.*

**Vektor::Araste** / Vektör / Vector

*Direjîya wî eyan e û tîr e nîşan dide xîza rast e.*

**Vemirandin::Temirandin::Tefandin** / Söndürme / Extinguish  
*Dawî lê anîna agir.*

**Veqetînera heriyê** /Çamur ayırıcı /Sludge separator  
*Maşîneya ku di zengînkirina gewherê de mîneralên girîng ji heriyê paqij dike.*

**Verastkirina ersa**/Arsa düzenlemesi/Land regulation  
*Dirîstkirina eraseyên heyî li gorî plana îmarê bi saya destserdan -ku bo fêda gel e- û bi berdêl kirîne.*

**Verastkirina peyzajê** / Peyzaj düzenlemesi / Landscaping  
*Li gor planeki, projeyeki verastkirina derdor (jîngeh). Ev plan li gor kêmasiyên derdor, daxwaz û xwestekên nişteciha tê çêkirin.*

**Vernîk** / Vernik / Varnish  
*Mobilyaların daha parlak ve kullanışlı olması için kullanılan şeffaf , sert koruyucu katman.*

**Veşarî::Nepenî** / Gizli / Secret  
*Ew tiştê ku xuya nake.*

**Vetezekirin** / Yenilemek / Refresh  
*Dubarekirina heman karî. Di programên kompîturê de nûkirina heman fermanê. "fermana girtina kompîturê veteze bike."*

**Vêxistin::Pêxistin** / Tutuşturma / Ignition  
*Gelemerî ji bo dest pê kirina şewatekê. Destpêkirina agirekî, destpêkirina şixulandina motorekî.*

**Video** / Video / Video  
*Wêneyên bi tevger ên li ser bandên manyetîk tîn bicîkin.*

**Vîlla::Xanî** / Villa / Villa  
*Avahiyên ku 2 qat an jî 3 qat bi awayekî taybet tîn çêkin.*

**Vîskozîte** / Viskozite / Viscosity  
*Berxwedana avê ya li ber herikîne ye.*

**Volkanît** / Volkanit / Vulcanite  
*Madeya ku ji êtûnê dertê.*

**Volt** / Volt / Volt  
*Elektrikte kullanılan potansiyel farkı (gerilim) birimi.  $V=I \cdot R$  (I:tezû, R: direnç V: gerilim)*

**Volt metre** / Voltmetre / Voltmeter  
*Amûra ku voltaja di navbera du xalan de ye dipîve.*

**Voltaj** / Voltaj:Gerilim / Voltage  
*Yekeya cudahiya piraniya elektronan a li ser her du aliyên elektrîkê.*

**Voltaja termînalê** / Vaziyet planı / Terminal voltage  
*termînala yekeya cudahiya piraniya elektronan a li ser her du aliyên elektrîkê.*

**Voltaja Zener** / Zener gerilimi / Zener voltage  
*Devrelerde zener diyodunun iletme geçmesi için gerekli olan gerilim. Devrelerde, ters yönde çalışacak şekilde kullanılır.*

# { W }

**Wane** / Vana / Valve

*Amûra ku ji bo kontrola sekinandin an jî derbas-kirina madeyê boriyê.*

**War** / Yerleşim yeri / Settlement

*Cihê ku mirov lê dijîn. Mînak: Gund, Bajar, Navçe*

**Wargeh** / Yerleşim yeri / Legal domicile

*Cihê ku xanî lê hatine çêkirin, an jî bên çêkirin.*

**Waşer::Orîng::Derzbend::Dirzbend::Sîl::Conta** /

*Conta: Tûm aqkları kapatmak için / Seal  
Di navbera du rûxarên şidandî de ji bo valahî werin girtin parçeyê plastîk ku tê bikaranîn.*

**Wat** / Watt / Watt

*Enerji dônüşümü oranını ölçen birimdir. Joule bölü saniye olarak tanımlanır. Kısaça W harfiyle gösterilir.*

**Watpîv** / Wattmetre / Wattmeter

*Amûra ku şiyana (tiwane) elektrîkê dipîve.*

**Wekhev::jhev::Hevşêwe** / Benzer / Similar

*Di cûreyên ku dişibin hev.*

**Wekhevî::Mînahî::Şibînî** / Benzerlik / Similarity

*Di matematîkê de di nav du sêgoşeyan de, wekhevîya goşeyê beranberî hev û hev girtîbûna keviyên beranberî hev.*

**Weqf** / Vakıf / Foundation

*saziya ji bo xêrxaziyê hati avakirin. Armanca vê saziyê ya ticarî nîne. Xêrxazî yekane armanca.*

**Wergêr** / Çevirmen / Translator

*Kesên ku nivîsan an jî axaftinan vediguherînin*

*zimanekî din.*

**Wergir::Pêlgir** / Alıcı / Receiver

*Amûra ku sînyala radyoyê digire û vediguherîne deng, wêne yan jî tiştekî din ê ku tê fêmkirin.*

**Werimîn** / Şişme / Swelling

*ji ber sedemên têkilzemînê bi awayekî werma qaqila zemînê*

**Werimîn** / Şişmek / Swelling

*Bi kişîna av an jî xazê re, di hişkiyan de pêkhatina gewrebûna qebareyî.*

**Werzîş::Spor** / Spor / Sports

*Tevgerên laşê mirovan ên ku ji bo tendurîstî yan jî hobiyan tên kirin. Ew îstikên bi awayekî kesane yan jî civakî bi rêbazekê tên kirin.*

**Weşandin** / Yayınlamak / Publish

*Ji tiştên ku bi amrazên ragihanê ve belav dibe re tê gotin.*

**Weşêner** / Emitör:Yayıcı / Emitter

*Yê/a ku dişîne. Cihê ku pêlên elektromagnetîk jê dertên û diweşîne.*

**Wezinandin::Pîvandin::Kîşandin**/Tartmak/Weigh

(to)

*Li gora yekeyekê dî tîna giraniya tiştekî.*

**Wijewij::Dengedeng::Noyîz::Berden**/Gürültü/Noise

*Dengê ku bê nîzam an bê aheng e.*

**Wize::Enerjî** / Enerji / Energy

*Hêza di nava madayan de wek tîn an jî ronahî ku dibe sedema tevgera made.*

**Wizeya Gibbs::Enerjiya Gibbs** / Gibbs enerjisi / Gibbs energy  
*Destkevtina karekê bi pesto û germahiyekê pendî.*

**Wizeya Hundiîrîn::Enerjiya Hundiîrîn** / İç enerji / Internal energy  
*Tevdeka hemû wizeyan e.*

**Wizeya Iyonbûyîn::Enerjiya Iyonbûyîn** / İyonlaşma enerjisi / Ionization energy

*Mêjera wizeyê ku xwastina jêve kirina elektrona atomê ya asta herî dawî*

**Wizeya nuklerî::Enerjiya Nuklerî** / Nükleer enerji / Nuclear energy  
*Cûreya vêjenekê ji dendinkê atomê destkevin*

**Wizeya Potansiyelê::Enerjiya Potansiyelê** / Potansiyel enerji / Potential energy  
*Cîsmên li garî sedema rewşa xwe xwedîkirina wizeyan e*



**Xaçîn** / Haç biçimli / Cruciform  
*Avahî an jî heyberên wek xaç. Çeprast.*

**Xal** / Nokta / Point  
*Nîşana herî biçûk.*

**Xala cemserê** / Kutup noktasi / Pole point  
*xala cemserê ya ciyografi an ya ciyografiye an ya manyetike.*

**Xala cemserê ya erdnîgariyê** / Coğrafi kutup noktasi / Geographic pole point  
*xala cemserê ya ciyografi (erdnîgari). Ev xal li gor koordinatên ciyografi tê tesbitkirin û navkirin.*

**Xala Hefînê** / Erime noktasi / Melting point  
*Pîka vehefîna madeyên hişk ber bi şilaviyê.*

**Xala Hevsengiyê::Xalî Hevsengî** / Denge konumu::Denge pozisyonu / Equilibrium position  
*Rewşa heyber an jî sîstemekî ku hêza net a li ser sifir e. Cih an jî asta ku hêza net (safî) dibe sifir.*

**Xala kelfînê** / Kaynama noktasi / Boiling point  
*Pileya germahiyê ku made tê de dikele.*

**Xala kontrolê** / Kontrol noktasi / Checkpoint  
*Nexşegeriyêde xalên ku koordinatên (xyz) wan diyar û ji bo kontrola nexşê pivan li ser tîrê çêkirin, wek xalên kontrolê tîrê navkirin.*

**Xala kontrolê ya erdê** / Yer kontrol noktasi / Ground control point  
*Nexşegeriyêde xalên ku koordinatên (xyz) wan diyar û ji bo kontrola nexşê pivan li ser tîrê çêkirin, wek xalên kontrolê yê erdê tîrê navkirin.*

**Xala Krîtîk** / Kritik nokta / Critical point  
*xala tenê bi pestoyekê ve şilavkirina gazên zêde germ*

**Xala nêtar** / Nötr nokta / Neutral poin  
*Cihê ku ji aliyê elektrîkê ve ne pozîtîf an jî ne negatîf e. Barê elektrîkê sifir e.*

**Xala Qerisînê** / Donma noktasi / Freezing point  
*pîka qerisîna madeyên şilavî ber bi hişkê*

**Xala roperê** / Röper noktasi / Benchmark  
*xalên ku pivana dirêjahiyê ji wan tê kirin. Di encama van pivanande kirokiya roperê derdikeve holê.*

**Xalên şikestî yên parselê** / Parsel kirik noktasi / Parcel broken point  
*Quncên ku li ser kenarê parselê heyî. Ji koordinatên van quncan aqara parselê tê hesapkirin.*

**Xam::Xav** / Ham / Raw  
*Gewhera hîna li ser xebat nehatiye kirin. Gewhera ku ji bo bi kêr bê hîna li ser kar nehatiye kirin.*

**Xaniyê tenê (musteqîl)** / Müstakil ev / Independent house  
*Xaniyê ku yek, du an jî sê ta ye. Xaniyê ku derdora xwe ve bi tu awayî girêdayî nîn e.*

**Xanûbera pardar** / Hisseli taşınmaz / Shareholding real estate  
*Milkên neguhêzbar ku ji yekî zêdetir xwediyên wî hene. Mînak:Erd, zêvî, xanî û hwd.*

**Xar** / Bilye:misket / Globe:Ball  
*Pêlîstokeke gilover û biçûk e.*

**Xebat** / İşleme:Çalışma / Working  
*Kirina karekî.*

**Xebatên plansaziyê** / Planlama çalışmaları / Planning works  
*Xebatên ku ji aliyê plansazan ve di derbarê plansaziyê de tîn meşandin.*

**Xebitîn::Şixulîn** / Çalışmak / Work  
*Ji bo çêkirina tiştêkî karê ku tê kirin.*

Xeletiya gewre (mezî) / Kaba hata / Overall error  
*Xeletiya, şaşitiya mezî ya ku pivanên nexşegeriyê de tê kirin. Ditina van xeletiyên pir hêsane ji ber ku xef nabin, wînda nabin.*

**Xeletiya pîvanê** / Ölçme hatasi / Measurement error  
*Di karê pivanên nexşegeriyê de, tu pivan bê şaşî (xeletî) nabe. Ev xeletî dibe ku ji kêmasiyên mirovî, ji alavên pîvanê an ji ji bandora jingehêbe. Ji tevare xeletiyên pîvanê tê gotin.*

**Xerabûn** / Bozulma / Decay  
*Bûna rewşa tiştêkî ku ji bo taybetiya xwe wenda kiribe û qiymeta wî nemabe.*

**Xerabûyî::Şikestî** / Bozuk / Broken  
*Tiştêkî ku ji bo taybetiya xwe wenda kiribe û qiymeta wî nemabe.*

**Xerakirin** / Bozmak / Spoil  
*Rewşa ne sazkerî ya heyberêkî.*

**Xerc** / Harç / Expense  
*Li saziya taou û qedestroyê de ji bo daxazên gel pêbinin xerçek (bac-vergi) tê sitandin.*

**Xericandî** / Fırında ısı işlem görmüş / Heated in furnace  
*Alavên ku ji axê hatine çêkirin û piştî ku zuha bûne di hêtûnan de hatine şewitandin.*

**Xericandin** / Fırında tuğla veya seramik pişirmek / Brick or ceramic baking heated in furnace  
*Pijandina (di hêtûnê de) piştî ziwabûna alavên ku ji axê (herî) çêdibin. "Cêr, şerbik, kûp, seramîk..."*

**Xest::Tîrbûyî::Koyu (sulu karşıtı)** :Yoğun (sıvılar için) / Derişik / Concentrated  
*1. Ne ron. 2. Di gîraweyê de zêdebûna madeyê tiwawe.*

**Xeta avberhevê** / Su toplama hattı / Water collection line  
*Li ser ruyê erdê cihên av lê berhevdişin û diherikin. Xeta berhevkerina avên berf û baranê.*

**Xeta boriya gaza xwezayî** / Doğalgaz boru hattı / Natural gas pipeline  
*Xeta ku di navbera rafîne û avahiyên de ragihandina gaza xwezayî pêk tîne. Xeta ku gaza xwezayî ji cihêkî radigihîne cihêkî din.*

**Xeta boriyê** / Boru hattı / Pipeline  
*Xeta lûleyî ya ji bo kişandina madeyên şil hatiye çêkirin. Madeyê şil di boriyê de diherike.*

**Xeta ragihîna enerjîyê** / Enerji iletim hattı / Energy transmission line  
*Xeta ku enerjîya elektrîkê ji santralê heta navenda trafoyê tîne. Volta vê enerjîyê bi gelemperî 33000 V e an jî zêdetirê.*

**Xeta rê** / Yol hattı / Line  
*Xeta rê. Xêza rê nişandide.*

**Xeta talvegê** / Talveg hattı / Thalweg line  
*Xeta ku li hevgrêdana xalên talveg derketi holê.*

**Xetere** / Tehlike / Danger  
*Rewşa ku ji xisar û zîyanê re rê vedike.*

**Xêz::Çixêz** / Çizgi (bir noktanın yürütülmesiyle oluşan şekil) / Line  
*1. Bi meşandina xalê şopa ku li pey dimîne. 2. Xeta ku di komîrnîkasyonê da agahî, deng an jî dane pê tê şandin.*

**Xêzkêşan** / Çizim / Drawing  
*Karê xêzkerinê.*

**Xîç::çew::xurde** / Çakıl / Gravel  
*Kevirên hûr ên ku li devê çem û newalan bi awayekî xwezayî kom dibin. Gîrbûna wan ji 7 mm heta 70 mm ye. Berhûr.*

**Xîç::xurde::zîveber::xirkeberd** / Çakıl taşı / Coarse grave  
*Kevirên hûr ên ku li devê çem û newalan bi awayekî xwezayî kom dibin. Gîrbûna wan ji 7 mm heta 70 mm ye. Berhûr.*

**Xîç::Zixûr::Buxişk** / Çakıl / Pebble  
*Kevirên biçûk.*

**Xîrdewat::Hişkalav** / Hirdavat / Hardware  
*Tiştên metalîk ên ku bi kêrî tiştêkî nayên.*

**Xişandin::Lêkxişandin** / Sürtünme / Friction  
*Rewşa du heyberên ku rûyê wan li ser hevîn û li diherê hev tevdigerin.*

**Xitimandin** / Tikama / Plugging  
*Çawik û devê tiştêkî bê girtin.*

**Xitimîn** / Tikanmak / Choke  
*Wek qenala avê ku pêşiya wê bi heriyê bê girtin û av tê de neherike.*

**Xîz::Qûm** / Kum / Sand  
*Hewrikên keviran ên bi qasî 0, 02-2 mm.*

**Xîza silîsê** / Silis kumu / Silica sand  
*Xîzên ku ji silîqat (silîs) ê hatîne mehandin.*

**Xîzar** / Hizar / Whipsaw  
*Amureke jêkirênê ya elektrîkî ye.*

**Xîzek** / Kumluk / Sandy  
*Ew zemînê ku rêjeya xîza wî zêde ye.*

**Xîzî** / Kumul / Sand dune  
*Axa bixîz. Ax û hişkiyên ku xîz di nav de hene.*

**Xorak::Xurek** / Gıda / Food  
*Bi giştî tiştên xwarin û vexwarinê. Madeyên ku ji bo jiyînê pêdiviya bedena mirov pê heye.*

**Xortim::Marpêç** / Hortum / Hose  
*Lûleyên plastîk ên dirêj û ku çîr e.*

**Xubara gerdûnê** / Evren tozu / Cosmic dust  
*Xubara ku di vahaliya fezayê de ye.*

**Xul::Çerx::Zivîrîn** / Çevrim::Döngü / Cycle  
*Riya ku tezûya (herikîn) elektrîkê li ser raguhêz-barekê digire.*

**Xulek** / Dakika / Minute  
*Ji şêstî yeka dema saetekê.*

**Xurde::Tûrdiraw** / Hurda / Junk  
*Alavên ku êdî bi kêr nayên û têne avêtin.*

**Xurdik::Gîfk** / Moloz::Balast taş kırıkları / Rubble  
*Parçeyê kevirên ku bi qasî kulma destî ne.*

**Xuya::Diyar::Aşkera** / Görünür / Apparent::Visible  
*Tiştê ku ber bi çav e û tê dîtin.*

**Xuyane::Monîtor** / Monitör / Monitor  
*Perdeya ku agahî tê de xuya dikin. Rûyê kompî-turê.*

**Xware::Ladan** / Eğim / Declination  
*Goşeyiya rûxarekî bi lêkeftina lêlata asoyî.  
 Xwarbûna rûxarekî an xêzekî ber bi lêlataka asoyî ve.*

**Xwaringeh** / Yemekhane / Dining hall  
*Ciyê mezin ku mirov tê de xwarinê dixwe, ciyê xwarinê.*

**Xwê** / Tuz / Salt  
*Wek kirîstalekê ye, tiştêkî ku tehma wê şor e.*

**Xwedî** / Malik / Tenant  
*xwedî. xwediyê maf. Mulk, malê ku xwediyê wê heyi. Malik xwediyê wî maliye.*

**Xwedîtî** / Mülkiyet / Ownership  
*Rewşa mafê bikaranînê.*

**Xwedîtîya katê** / Kat irtifaki / Easement  
*Di avahiyê de mafê beşek ji ta (kat) yê. Mafê bilindahî û firehiyê. Mafê xwedîbûna beşek ji avahiyê. Mafê beşek ji bilindahiyê.*

**Xwedîtîya pardar** / Müşterek mülkiyet / Shareholding ownership  
*Xwedîtîya hevpar, hevbeş. Di wê xwedîtîyê de ji yekî zêde xwedî heye û rêjeya xwedîtîya wan diyare. Para wan dibeku ne weke hevbe.*

**Xwediyê Erseyê** / Arsa sahibi / Land ownership  
*Xwedîbûna mafên bikaranîna erdê avadaniyê.*

**Xwefî** / Kül / Ash  
*Bermahiya piştî şewata madeyê.*

**Xwendina navîn** / Orta okuma / Medium reading  
*Nexşegeriyêde bi alava nivoyê, ji bo hesapkirina bilindahî anji ferqa bilindahiyê, li istasyoneki xwendina navin (piştî xwendina yekem, lê beriya xwendina dawî) ya li ser mirayê.*

**Xwendina paş** / Geri okuma / Readback  
*Nexşegeriyêde bi alava nivoyê, ji bo hesapkirina bilindahî anji ferqa bilindahiyê, li istasyoneki xwendina yekem ya li ser mirayê.*

**Xwendina pêş** / İleri okuma / Further reading  
*Nexşegeriyêde bi alava nivoyê, ji bo hesapkirina bilindahî anji ferqa bilindahiyê, li istasyoneki xwendina dawî ya li ser mirayê.*

**Xwerûkirin::Dazelandin** / Artırmak / Clarity::decant  
*Paqijkirin û jê durxistina madeyê biyanî ya avê.*

**Xwerûkirin::Zelalkirin** / Netleştirme / Netting  
*Durbûna alava pivanêde li gor çavê herkesekî karê baş xuyakirina hedefî.*

**Xwezayî::Sirûştî** / Doğal / Natural  
*Tiştê ji ber xwe ve çêbibe.*

**Xwîn** / Kan / Blood  
*Di damarên zindiyan de diherike, şilaviyeke bi rengê sor e.*





**Yasaya ohm::Zagona ohm** / Ohm yasası / Ohm's law  
*Di vedoreke elektronîkî de tezûya ku di navbera du xalan de li ser gihênerê derbas dibe bi vekê-  
 şanê re bi awayekî rast lê bi bergira di navbera du xalan re bi awayekî vajî rêjeyî ye. Ev kanûna ohm e.*

**Yasmîn** / Yasemin çiçeği / Jasmin  
*Giyayekî ji famîlyeya zeytûnê ye.*

**Yazdeh** / Onbir / Eleven  
*Hejmarek e. Tamjimara ji dehan mezintir, ji doz-  
 dehan biçûktir.*

**Yek** / Bir / One  
*Hejmarek e. Hejmara biçûktirîn a tamjimarên po-  
 zîtif.*

**Yekav::Serav** / Can suyu / Lifeline  
*Di çandiniyê de avdaniya yekem. Avdaniya ku  
 dema şax tê dayîn tê kirin.*

**Yeke** / Birim / Unit  
*Di komekê de hêmanek. Ew dabeşa neguher ku ji  
 bo pîvanê tê bikaranîn.*

**Yekeya arîtmetik::Yekeya jimêreyî** / Aritmetik  
 birim / Arithmetic unit  
*Di CPU de cihê ku kirariyên arîtmetik û mantiqî  
 têne kirin. Kompîter kirariyên mîna carîna, dabe-  
 şîna, danhevî (tevîn) û derîna di vir de tê kirin.*

**Yekeya kevanê** / Yay birimi (radyan) / Spring unit  
 (radians)  
*Yekeya kevanêye. 2 pi li hemberi 360 dereceyê  
 tê.*

**Yekeya kirariya serekî (cpu)** / Ana işlem birimi:mik-  
 roişlemci / Central processing unit (cpu)  
*Parçeyê ku hemû kirariyên kompîterê tê de çêdi-  
 bin.*

**Yekeya pîvanê ya dirêjahiyê** / Uzunluk ölçü birimi /  
 Measuring unit of length  
*yekeya pîvana dirêjahiyê. metre wek yekeya pi-  
 vana dirêjahiyê tê pejirandin.*

**Yekeya pîvanê ya qadê** / Alan ölçüleri birimi / Unit  
 of measurement  
*Yekeya pîvana aqarê ye. Metre qare wek yekeya  
 pîvana qadê tê pejirandin.*

**Yekeya pîvanê ya qebareyê** / Hacim ölçüleri birimi  
 / Unit of volume measurements  
*Yekeya pîvana qewarêye. metre kup wek yekeya  
 pîvana qewarê tê pejirandin.*

**Yekeyî** / Birimsel / Unitary  
*Yê ku bi yekeyê tê nîşandan an jî bi yekeyê re di  
 têkiliyê de ye.*

**Yekkirina parê** / Pay birleşirme / Share consolidation  
*Di parên xweditiya parselande yekkirina paran.*

**Yeksan** / Eşit / Equal  
*Du an jî zêdetir tiştên ku li gora avahî, nîrx, çen-  
 danî û çawaniya xwe ne zêde ne jî kêm in.*

**Yeksanî** / Eşitlik / Equality  
*Rewşa yeksan a du tiştan an jî zêdetir tiştan.*

**Yekşem** / Pazar / Sunday  
*Roja dawîna hefteyê di navbera şemî û duşemê  
 de ye. Li hinek welatan roja yekem a hefteyê ye.*

# { Z }

**Zagona avadaniyê** / İmar kanunu / Zoning law  
*Zagona ku çarçoveya avadaniyê diyar dike.*

**Zagona Avogadroyî** / Avogadro yasası / Avogadro's law

*Li gorî zagonê qebara gazê wekhev be, di germahiya wekhev û pestoya wekhev de hejmarê molekûlê an jî parçikan yek dibe.*

**Zagona Boyle** / Boyle yasası / Boyle's law  
*Zagonek li ser şilav kirina gazên firebarî ye.*

**Zagona Charles** / Charles yasası / Charles's law  
*Di nava nagûhêzbariyekê de, kêmbûn û zêdebûna germahiyê bi girêdayê zêde bûn û kêmbûna qebara gazê mengî ye.*

**Zagona dalton** / Dalton kanunu / Dalton's law  
*Pestana gazên ku di nava hev de ne û bi hev re nakevin reaksiyonê yeksan e bi danheviya (komkirina) pestana kismî ya gazên ku di têkeê de ne.*

**Zagona Darcy** / Darcy kanunu / Darcy's law  
*Zagona kû herikîna ava di nava akîferêde pê-nase dike.*

**Zagona destê rastê::Yasaya destê rastê** / Sağ el kuralı / Right hand rule  
*Rêbazê matematîkî û fizîkî ye ku ji bo vektoreên 3 rehendî bi hêsanî werin fêmkirin.*

**Zagona Gay-Lussac** / Gay-Lussac yasası / Gay-Lussac's law

*Li gorî zagonê qebareya gazekê mengî di mejê-reke pendî de nîşandana germahiyê bi yekeya kelvînê ve di hevgeriyê rast de ye.*

**Zagona Henry** / Henry yasası / Henry's law  
*Li gorî zagonê Di germahiyê neguher de, giraniya gazekê yê di nava aveke a qebareyê pendî de be bi pestoyê ve hevgeriyekê rast de ye.*

**Zagona Hess** / Hess yasası / Hess's law  
*Zagona vêdana germahiyên pêdandî ye, di reaksiyonê de ew germahiya derdikeve holê wekhevê hemû merhaleyên yê reaksiyonê ye.*

**Zagona hookê** / Hooke yasası / Hooke's law  
*Zagona bi rêjeyê rastî nîşan dide ku xerabûna madeyekê û hêza ku made xera dike. Mînak: Vezebûyîna jiyê û vegera awayê xwe yê berê.*

**Zagona Parastina Bariste** / Kütlenin korunumu yasası / Law of conservation of mass  
*Li gorî zagonê di pergalekê girtî de kirariyên reaksiyonê her çî be jî teqez gumlat pêdandî dimîne.*

**Zagona Parastina Wizeyê (Enerjî)** / Enerjinin korunumu yasası / Law of conservation of energy  
*Li gorî zagonê çî caran vejen ji tine bûyinê heyî nabe û çî caran jî ji heyî nê ber bi xilas bûyî nê ve naçe.*

**Zagona Raoult** / Raoult yasası / Raoult's law  
*Li gorî zagonê heke di giraweyê de pestoya hilmê û dema qerisîna avê kêmbê ev guherîn an ku kêmbûn li gel mēja madeyê tiwawe hevgerî ye.*

**Zagona Rêjeyên neguhor** / Sabit oranlar yasası / Law of definite proportions  
*Li gorî zagonê gava element pêkhatiyekê çê*

*dikin element di navbera xwe de bi hevgeriyekê aşkere yek dibin.*

**Zagona Rêjeyên Takî** / Katlı oranlar yasası / Law of multiple proportions  
*Li gorî zagonê elementên ku di navbera xwe de zêde pêkhatiyar çê bikin, di nav pêkhatiyê de hevgeriya ji mêtjera elementekê pêdandî û elementên din, bi hejmarên tam ve nîşan didin*

**Zagonên Faraday** / Faraday yasaları / Faraday's laws  
*Zagonên fîzîkzanê îngîlîs Michael Faraday in, zagonên wî zagona elektrolîz û zagona metoda dabêşkirinê ne.*

**Zanîna pîvanê** / Ölçme bilgisi / Knowledge of measurements  
*Zanîna pîvanê. Her cureyên pîvanan, rêbazên curbecur, pîvanande xeletî...hwd. Dibin mijara zanîna pîvanê. Zanîna pîvanê weke dersekê li dibistana tê hinkirin.*

**Zanîngeh::Zanko** / Üniversite / University  
*Dibistana ku perwerdeya pîşeyekê bi awayekî zanistî dide.*

**Zanist** / Bilim / Science  
*Agahiya ku bi gelemperî derbasdar û teqez e, li gorî rêbazekê tê bidestxistin.*

**Zanistî** / Bilimsel / Scientific  
*Tiştê li gorî zanistê.*

**Zanyar** / Biliminsan / Scientist  
*Ew kesê/a ku di pîşeya xwe de karên zanistî dike.*

**Zêde** / Fazla / Over  
*Ji pêwîstiyê zehftir.*

**Zêdek** / Artı (toplama işleminde + işaretinin adı) / Plus (the process of gathering marking the name)  
*Navê nîşaneyê +*

**Zêdek::Ko** / Artı / Plus  
*1. Di kirariya danheviyê da navê nîşana " + " 2. Nîşana li pêşiya hejmarê ji sifirê mezintir. Dijberî kêmek (-).*

**Zêdetirîn::Maksîmûm** / Azami / Maximum  
*Di tişteki de rêje, ast, bilindahî û mezinahiya herî bilind.*

**Zêdetirîn::Pirtirîn** / Maksimum / Maximum  
*Tişteki herî zêde*

**Zelafî::Ronîder** / Saydamlık / Transparency  
*Yê ku pişt xwe jî nîşan dide. Mînak; cam*

**Zeliqandin** / Yapıştırmak / Paste  
*1. Pêvebestî 2. Pêvekirina du yan jî zêdetir parçeyan 3. Zemaqirin*

**Zeliqîn** / Yapışmak / Adhere:Stick on  
*Bihevgeritina du heyberên ji hev veqetandî.*

**Zeng** / Oksit / Oxide  
*Maddeyekî ku ji têteliya oksîjen û elementekî an ji bîngehekî organîk ve çê dibe.*

**Zeng::Zingar** / Pas / Rust  
*Hesin dema ku bi oksîjenê re dikeve têteliyê rengê qehweyî digire ji vêya re zeng tê gotin.*

**Zeolît** / Zeolit / Zeolite  
*xwelî û helîna kû bi teqîna kurayan re der têtî ava goman an jî deryayan re dikevê reaksiyonê kîmyevî û di encam de mîneraleke bi sud dirus dibê.*

**Zer** / Sarı / Yellow  
*Rengekî di navbera kesk û mîşmişî de ye. Dirêjahiya pêla zer 565-590 nanometre ye.*

**Zêr** / Altın / Gold  
*Gewhereke biha.*

**Zêrevan** / Kontrolör / Controller  
*Berpîrsiyarê ku ji bo xebatên li gor armanca tê xwestin xebat dimeşîne.*

**Zevî** / Tarla / Field  
*Ciyê ku çandinî li ser tê kirin.*

**Zeytûn** / Zeytin / Olive  
*Fêkiyeke bi rûn e. Tema wê tehl e, piştî fermanstasyonê tê asta xwarinê. Dara wê di keşa subtropîc (sabtropîk) de digihîje. Bi rûnê wê sabûn jî çêdibe.*

**Zibil** / Gübre / Fertilizer  
*Pîsiya ajalan.*

**Zikê pêlê::Qullif** / Dalgâ karnı / Antinode  
*Di pêlê de xala ku li cihê bel e. Jêr an jî jor a pêlê.*

**Zilyed** / Zilyet / Possession  
*Xwedî an ne xwedî desttegeritin dibe zilyedi. Tişteki (eşya) destê kêdebe zilyed ewe.*

**Zilyedî** / Zilyetlik / Possession  
*Xwedî an ne xwedî desttegeritin dibe zilyedi. Tişteki (eşya) destê kêdebe zilyed ewe.*

**Zimane** / Klape / Clack

*Amûreke makîneyê ku ji bo derbaskirin an jî as-tengkirina şilekan tê bikaranîn.*

**Zinar** / Kaya / Rock

*Kevirên mezin.*

**Zincîr** / Zincir / Chain

*Xelekên metal ên ku li dû hev yek bi yek di hev re hatine derbaskirin.*

**Zîrkonyûm** / Zirkonyum / Zirconium

*Elementeke kîmyayî ye, jimareya atoma wê 40 e. Nîşaneyê wê Zr ye.*

**Zîv** / Gümüş / Silver (ag)

*Madeyeke ku nîşana wê di tabloya peryodîk de "ag" ye, numareya wê ya atomê 47 e. Rengê wê madeyê gewr e.*

**Ziving** / Kışlak / Winter quarters

*Ji bo keriyên pezi, cihê zivistanê lê tê derbaskirin. Ev cih pirani ne berfîne û zivistanê ji serma kême.*

**Zivir** / Dönme / Rotation

*Fetilandin.*

**Zivirandin::Badan** / Çevirmek / Rotating:Turn

*Guhertina berê tiştêkî.*

**Zivirîn** / Firdolanım:dönüş / Gyration

*Tevgera ku wek vedorek li dora xwe didome.*

**Zivistan** / Kış / Winter

*Dî salê de rojên di navbera 22'yê berfenbar û 21'ê adarê de, rojên herî sar.*

**Ziwa** / Kuru / Dry

*Rewşa madeyên ku şilekiya xwe wenda kiribin.*

**Ziwakirin** / Kurutmak / Dry (to)

*Dûrxistina şilekiyê ji madeyê hişk. Dêrxistina ava nav heriyê. Daleqandina cilên şil. Pijandina kevirê cîlsê di hetûnê de.*

**Ziyan** / Hasar / Damage

*minak:"îsal baran ne barî loma ganim xesar dî"*

**Zo::Cot** / Çift / Even

*Jimarên ku bi diduyan dabeş dibin. Mînak, 2, 4, 6, 8...*

**Zû** / Acele / Rush

*Hewldana ku ji bo kar di demeke kurtir de bê kirin.*

**Zûl** / Dilim / Slice:Piece

*Di dabeşkirina tiştêkî de ew parçeyên ji sihî bi-çûktir in.*

**Zûres** / Erkenci / Early riser

*Rehekên ku zû fêkiyan didin.*

“

Ev xebata ku em li serê sê sal û nîv xebitîn ji ber ku bi tevahî negihîş dema xwe me pirtûkê kir du beş. Peyvên ku me pênaseya wan çêkiribû li aliyekî yên din jî li aliyekî din me kir beş. Em hêvî dikin ku dê pênaseya van peyvan jî were tamam kirin û pirtûk bibe yek beş.

”

